Arşîva Bîra Kurdan: Ji Kendal Nezan gotara bi serenavê, 'Dema ku «hevalê me» Sedam Husên kurdên xwe kîmyabaran dikir' ('98) û ji Eric Rouleau, 'Kurd, gelê bêparhiştî' (98)

ÇAPA ÎNTERNETÊ

LE MONDE diplomatique kurdî

Tebax 2012 - Hejmar 33 · www.diplo-kurdi.com · info@diplo-kurdi.com · 20 Rûpel

Nicolas Dot-Pouillard
Berevajî Misir û Tûnisê, serhildana Sûrîyê ya adara 2011ê di nav çepgirên ereb de bi yekdengî nehate pêşwazî kirin. Çepgirên ereb li hemberî krîza Sûrîyê parçebûyîna xwe diparêzin...
R. 6

Michael Hartmann
Ji bo gelek lêkolînerên zanistên civakî û nivîskarên ceribandinan hebûna "çîneke global" ku geh pesnê wê didin geh wê şermezar dikin weke rastîyeke aşkere tê qebûl kirin...
R. 7

Alexander Zevin
Serketina demdirêj a *The Economist*ê nexasim jî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê cihê ku piranîya xwendevanên wê niha lê dimînin, bixwe veguherî serhatîyeke çapemenîyê ya domdar.
R. 8

Elizabeth Rush
Piştî hewldanên çaryek sedsalê, Hindistan difikire ku dîware sînorê xwe yê bi Bangladeşê re ku 3286 kîlometro ye, êdî hebûna wê bêkêrhatîye û qaçaxçîtîyeke zêde lê tê kirin xilas bike...
R. 13

A. Popelard û P. Vannier
Li Las Vegasa metropola eyaleta Nevadayê û paytextê qumarê, her tiştî ji adetê zêdetir e. Bajarvanîya wê jî yek ji wan e ku mirov dixe nav tenêtîyê û têkîlîyên civakî jî hêdî hêdî dikuje.
R. 16

Pêşveçûnên li Kurdistana Rojava çawa li Tirkiyê deng vedan?

Li Sûrîyê Kurdistan

İsmail Beşikçi

Bihara erebî li Sûrîyê bi awayekî cuda tê jîyan. Li Sûrîyê, ev bû salek û nîv e, ango ji adara 2011ê ve li hember rêveberîya Beşar Esad rezîstansek heye. Konseya Neteweyî ya Sûrîyê (KNS) têkoşîna xwe didomîne. Tirkiye, ji dil û can piştgirîya KNSyê dike.

Tirkiye, li bakurê Sûrîyê, li hember rûdanên ku li wargehên kurdî ên li seranserî sînor diqewimin, pir hesas e. Grupên kurd, li van deveran rewşên fiîlî derdixînin meydanê û hewl didin ku dezgehan çêbikin. Grupên kurd, herweha him li dijî rêveberîyê û him jî li dijî KNSyê hinek mesafe datînin û wusa tevdigerin. Tirkiye, dixwaze kurdên ku qala federasyon, xweserî û otonomîyê dikin, di KNSyê de neyên temsîl kirin. Ev grup, ji bo civînên "Dostên Sûrîyê" ku li Antalya, Qahîre û li Stenbolê pêk hatin, nehatin vexwendin. Tirkiye, li dij e ku piştî hilweşandina rêveberîya Esad, kurd qezenceke cidî bi dest bixin. Di vî warî de polîtîkayeke taybet dimeşîne. KNS jî tam li gor daxwazên Tirkiyê nebûna herêmeke bi navê Kurdistanê diparêze.

Welatên weke Tirkiye, Katar û Erebistana Suûdîyê, ji bo biçekkirina KNSyê di nav hewldaneke întensîv de ne. Artêşa Sûrîyê ya Azad, bi vî awayî derdikeve meydanê. KNS, ji jandeyên komên muxalîf ku ew bi xwe jî zêde li hev nakin, pêk tê. Di KNSyê de zêdetir gotinên efser û generalên ku ji artêşê veqetîyayî derbas dibin. Meriv dikare bibêje ku, ew îdeolojîya Beas a rêveberîyê di hundirê KNSyê de jî serdest e. Lewra, ew kesên ku bi îdeolojîya Beas ji rêveberîyê veqetîyayî û tevlî KNSyê bûyî, di enîya muxalefeta li hember Beşar Esad de kom dibin. Ev yek jî nîşan dike ku, heger ev kes Esad daxînin û bên desthilatdarîyê jî, dê îdeolojîya Beas qet neyê guhertin; wek mînak, dê di înkara kurdan û Kurdistanê de berdewam bin.

Ev pêvajo vê yekê nîşanî me dide. Derdê wan kesên ku li Sûrîyê li dij dîktator Beşar Esad têkoşînê didin ne ew e ku demokrasîyê pêşve bibin. Dixwazin şûna Beşar Esad serdestîya xwe bidin rûniştandin û wê rejîma dîktayî wek berê bidomînin. Ev yek, ne tenê li Sûrîyê wusa ye, herweha bi awayekî gelemperî li Rojhilatê Navîn jî bi vî rengî ye. Ew rûdanên ku di pêvajoya 'Bihara Erebî' de li Tûnis, Misir, Lîbya, Yemen û Katarê derketin meydanê, vê yekê bi awayekî aşkere xwe nîşan da.

Rêveberîya Tirkiyê jî yek ji wan e ku pêşveçûnên di derbarê Sûrîyê de ji nêzîk ve dişopîne. Derdê Tirkiyê ne ew derd e ku li Sûrîyê dîktatorî bê hilweşandin, demokrasî pêşve biçe û herwekî din e. Ew derd e ku, piştî Beşar Esad, kurd, qezencên cidî bi dest nexin. Tirkiye, di vî warî de pir hesas tevdigere. Rûdanên ku diqewimin ji nêzîk ve dişopîne. Hewl dide ku ji kurdan re astengîyan derbixîne.

Di dawîya tîrmehê de, rêveberîya Beşar Esad, xwe ji qad û bajarên wek Koban, Dêrik, Amûdê, Serê Kanîyê û ji Qamîşlo paşve kişand. Desthilatdarî derbasî kurdan bû. Kurdan, jixwe li van deveran rewşên fiîlî derxistibûn meydanê, hewl didan ku dezgehên xwe çêbikin. Mînak; li gelek deveran dibistanên ku bi zimanê kurdî perwerdehîyê dikin, hatibûn vekirin. Piştî ku rêveberîya Sûrîyê xwe ji van qadan paşve kişand, ev xebat hîn bi lezûbez berbelav bûn. Li van qadan, bicihkirina xwerêveberîyê an jî rêveberîyên xweser bi lez pêşve çûn.

Li gor bawerîya min, li bakurê Sûrîyê, li Kurdistanê, hewldana damezirandina rêveberîyên bi vî rengî pêşveçûneke pir erênî ye. Herweha li gor min, mesafedanîna kurdan a li hember rêveberîya Beşar Esad û KNSyê û lêkûrbûna li ser karê xwe baş bûye.

R. 3

Di xwepêşandanên Sûrîyê de rewşa kurd û hindikayîyan

Kurd û "Raperîna Sûrîyê"

Dr. Kemal Sido*

Van demên dawîyê bang li kurdan (misilman û êzdî), xirîstîyan, durzî, elewî, îsmaîlî, ermenî, asûrî-aramî û hindikahîyên din tê kirin da ku tevlî serhildana Sûrîyê ya li dijî dîktatorîya Beşar el-Esad bibin. Ev bang dikin ku mirov bifikire ev hindikayî tevlî serhildanê nabin. Lê belê ev îmaj dixapîne. Hindikayî bi awayekî çalak di protestoyên dij-rejîmê de cihê xwe digirin, belê heta niha bi tenê bi awayê aştîyane. Armanca muxalefeta Sûrîyê berîya hertiştî ew e ku hindikayîyan bikişîne nav refên xwe û tirsa wan a der barê siberoja di bin serwerîya deshilatdarên nû ya nedîyar de nehêle. Lê belê ji bo çi hindikayîyên etnîk û dînî yên li Sûrîyê, nexasim jî kurd bi tirs û fikar li siberojê dinêrin? Ma ne wan ji berê ve hema hema timî guhertinên demokratîk ên li welatê xwe erê dikir. Xirîstîyan, cihû, ermenî, asûrî-aramî, durzî, elewî û kurd jî ma ne yên pêşî bûn ku li dijî "nîrê serwerîya tirk-osmanî" û ji bo rizgarîya Sûrîyê ketin nav liv û tevgerê. Ew bûn yên ku çapxane û rojnameyên pêşî, rêxistinên demokratîk ên pêşî û partî damezrandin, lewra wan nedixwest di pergaleke osmanî (1516-1918) de bijîn ku doktrîna wê ya fermî panîslamîzm bû. Yekemîn çapxaneya ibrî sala 1605ê ji alîyê cihûyên Sûrîyê ve hat damezrandin û Muhemed Kurdalî yê kurd sala 1919ê yekemîn akademîya erebî damezirand. Ji berê ve hindikayî doza dewleteke laîk dikin, ya ku tê de mirov hemû li ber qanûnê wekhev in. (1)

Dudilîya hindikayîyan ya ji bo tevlîbûna nav refên raperînê ew e ku piştî rûxîyana dîktatorîya el-Esad bi îhtîmaleke mezin wê ne hêzên demokratîk-laîk, yan jî lîberal bibin desthilatdar, lê belê Birayên Misilman an jî rêxistinên din ên siyasî yên tundrawtir. Bi palpiştîya Erebistana Suûdîyê, dewletên din ên kendavê, Tirkiyeya berê wê îslamî û herweha hin hukûmetên rojava, îslamîst dikarin li Sûrîyê bi hêsanî bi ser bikevin. Bi ser de jî koma herî mezin a şênîyên Sûrîyê ango sûnî li pişta muxalefeta îslamîstan e. Lewra di dema desthilatdarîya bêhtirî 40 salan a bavikê el-Esad ê hov de piranîya sunî ya welêt li tevahîya qadên jîyanê rastî cudakarîyê hat. Nexasim di sal û nîvê dawîyê de li herêmên sunîyan gelek komkujî pêk hatin.

Mexdûrbûna qiptîyan li Misrê û komkujîyên li dijî amazîn û tûbûyên afrîkî ji alîyê milîsên ereb-misilman ve li Lîbyayê nîşan didin ku hindikayîyên nemisilman û herweha yên nesunî û neereb jî têra xwe mafdar in ku ji hukûmeteke îslamîst û neteweperestên ereb têde serdest in, gumanan bikin û bawerîya xwe pê neynin.

R. 5



Zouber Yousef: **Hêştir.** Metal, 70 x 65 x 50 cm

www.arsivakurd.org

EDITO

Qanûna sextekaran

SERGE HALIMI

Ev yek ji sahneyên kult ên filmê Michael Curtiz *Casablanca* (1942) ye. Birêvebirê polîsê herêmî Kaptan Renault yê ku çend zilamên wî li dora wî ne, hê nû kafêya ku Rick (Humphrey Bogart) xwedîyê wê ye girt, ji hemû mirovên li dora xwe re dipeyive: *"ez matmayî me, bi rastî jî ecêbmayî me ku min dît li vir bi qumarê tê lîstin!"* Piştî bi kêlîyekê, wezîfedarekî qumarxaneyê destek pere dan polîs: *"birêz, pereyê te bi dest xistin."* Kaptan bi pistepist malavahîya wî dike, pereyan diavêje berîka xwe û fermanê dide: *"bila herkes derkeve, bi lez!"*

Di hetîketîya malî ya elaqedarî bi sextekarî dîyarkirina rêjeyeke navbankeyan a brîtanî - London Interbank Offered Rate (Libor) – de di tesbîtkirina polêsê bertîlxwur de dudilî hene, lewra yên ku bi îhtîmaleke mezin bi vî rolî rabin, gelek in. Her roj, qederê bîst sazîyên mezin ên malî (Barclays, Deutsche Bank, HSBC, Bank of America, û yên din) asta Liborê dîyar dikin. Ev jî bi rola hespekî fahl radibe ji bo muameleyên mîqdara wan a giştî bi qasî 800 000 milyar dolaran (na, şaşîya çapê nîne) e, nexasim jî ji bo bazarên berhemên muştaq. (1) Ev mîqdarên behsa wan tê kirin ewqasî zêde weke yên Qarûn in, dikin ku çapemenîya ne malî bala xwe bide ser gunehên piçûk, belê di sînorê insanî de: dê û bavên ku alîkarîya malbatê distînin, lê belê pêre jî çûna dibistanê ya zarokên xwe misoger nakin, mûçegirên yewnan ên ku xizanîya xwe ya rojane bi xebata qaçax bi ser ve temam dikin. Hey hela ye li ser wan; brûskên birêvebiran û Bankeya Navendî ya Ewropî ji wan re veqetandî ne.

Tevî ku mumkin e manîpulasyona Liborê tevlîhev xuya bike, ew bi qasî sahneya *Casablanca* rohnîker e. Bankeyên mezin xema wan xemilandin û başkirina siheta wan e da ku fonan bi buhayê herî erzan bi dest bixin, ev bankeyên ku mirov ji her soza wan bawer dike, bi salan rêjeya faîzê ya pereyên deyn dikirin, kêm kirin. Vê rêjeya ragihandî paşê rêjeya Liborê dîyar kir, û pê re jî ya deynkirinên siberojê... Patronê Barclaysê yê ku "*bi awayekî fizîkî nexweşketî*" ji ber ku "derket holê" bankeya wî sextekarî kiriye, 3yê tîrmehê îstîfa kir. Birêveberê Bankeya Ingilîstanê jî xwe lê datîne ku wî jî hê nû ev çend hefte ne ev sextekarîya behsa wê tê kirin fêm kiriye. (2)

"*Matmayî ye, bi rastî jî ecêbmayî ye ji ber ku* sira bi zanîn hatî veşartin *dît*"? Xuya ye Barclays û Bankeya Ingilîstanê çapemenîya malî naxwînin. Lewra 16ê nîsana 2008ê, *The Wall Street Journal*ê gotareke bi sernavê "bankevan li ser rêjeyeke bi rola kilîtê radibe dudil in" weşand. Paragrafa pêşî: "*yek jî pîvanên herî girîng ên siheta cihana malî dibe ku nîşanên şaş dabin*"...

Cîhana me bi vî rengî dagîrkirî ye bi daneyên demî û bi hîle (Libor, "qaîdeya zêrîn", asta deyndarîyê yan jî lihevderneketina budceya dewletê ya ku divê nebihure ji ...) yên ku li ser navên wan êşkence li tevahîya gelan tê kirin, weke li Spanyayê serokê bankeyeke navendî jî be yê ajanseke notdayînê jî be rêz ji wan kesan re tê girtin ku bi awayekî herî xedar cezayan ferz dikin. Çar salan piştî destpêkirina yek ji krîzên herî mezin ên malî yên dîrokê, pirsa bikêrhatîbûna wan a civakî dîsa jî mutleq e.

(1) Ibrahim Warde, "La dérive des nouveaux produits financiers / Muştaqa berhemên nû yên malî", *Le Monde diplomatique,* tîrmeha 1994ê. Heye li ser DVD-ROMa arşîva *Le Monde diplomatique*ê, 1954-2011, www.monde-diplomatique.fr/t/dvdrom

(2) *Bigire li ber* "Missteps on Libor Doomed Top Executives at Barclays / Gavên Şaş li ser Liborê li Barclaysê Birêveberên Herî Payebilind Mahkûm kirin", *The Wall Street Journal,* New York, 15ê tîrmeha 2012ê.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Stranên afrîkîyên serbixwe

JACQUES DENIS

«Mîrza ez jiyaneke xweş jiyam
Dema pîroz a kolonîyan
Ji min re digot Serokê Mezin ê şervanan
Dema serketinên AOFê.» (1)

Bi guhdarîkirina Michel «Bwana» Sardou, (2) rojên xweş û geş ên berê yên dema Komara IVemîn, ku çi bigire weke bihuştê bûn, tên bîra min. Li wî alîyê din ê Deryaya Spî, dengê zengila dêrê bi awayekî din dihat. Di pey tecrûbeya Konferansa Brazzavilleyê re ku di 1944ê de pêk hat, tevgera rizgarîxwaz a welatên afrîkî, piştî ku şanzdeh welatên afrîkî azadîya xwe bi dest xistin, di 1960ê de gihîşte zîrveya xwe. Piştî pêncî salan jî, Fransaya ku tu caran îtiraf bi merasîmên bîranînê nedikir, her derê li ser parzemîna heqaretlêkirî û bi pey re, rizgarkirî, dîsk çêkirin.

Bîst salên piştî serxwebûnan, nîşan da, cûreyeke muzîkê ya ku hîn jî pê têkoşîna derxistina hemî gencîneyên veşartî dihate dayîn, beşek di bin xerabeyên malên dîskan de ma ku ew jî wê demê bê pêjn winda bûn çûn. Sembola wê demê, klasîka klasîkên panafrîkayî «Indépendance Cha Cha» [«Serxwebûn Cha Cha Cha»] ya Grand Kalle yê kongoyî, bi awayekî mantiqî kilîta sindoqa «Afrîkayên serbixwe» (3) vekir. Piştî dîskeke bi babet (Afrique engagée / Afrîka girêdayî), ev antolojî çar albuman li çar welatan pêşkêş dike: Malî, Senegal, Gîne û Kongo. Hilbijartina wê, her carê dibe beşê baş ê orkestrayên mezin, ên salên 1960 û 1970yê, ku pirî caran ji alîyê dewletê ve dihatin fînanse kirin û li hemberî vê wan jî polîtîkayên netewî yên nû li gor modela ji alî Ahmed Sekou Toure yê gîneyî ve hatiye pêş xistin, bi berhemên xwe yên herî nû dest pê dikirin û pîroz dikirin.

Ev yek her weha ji bo pênc cildên bi navê «Free Africa / Afrîkaya azad», (4) ku ji alîyê hosteyê heman berhemê ve pêk hatibû jî derbas dibe… Ev jî bê gûman hin wekhevîyan nîşan dide û ji bo hîn bêhtir li ser rastîya paradoksî ya parzemînê bê girtin, kêm zêde bi serketina wan deman û welatan re, bi «Pata Pata» ya şên ku Miriam Makeba di 1962ê de afirandibû û «Saudade» ya xemgîn ya Bongayê angolayî piştî wê bi deh salan re tevlihev dibe. Herçend ku mirov bi awayekî nedîtî gelek şopên «swingin' Addis-Abeba» tê de bibîne jî, piranîya xwe li ser derhênana Afrîkaya fransîaxêv konsantre dikir. Bi awayekî seyr, tu sernavê ku şadetîya potaya erjeng a Cezayirê, sembola şiddeta serkutkirina koloniyî bike, tuneye!

Li hemberî vê, «50 stranên herî xweş ên afrikî» (5), bi sernavekî pir xweser, bi xebateke ji dil û can li kataloga Universalê dikole, ku ne tenê Fela û Manu Dibango, lê her weha tayên Khaled «Didi» jî tê de bêne pêşkêş kirin…

Xebateke herî rêkûpêk dimîne –him ji alîyê naveroka tekstê ve him jî ji alîyê jêderên dengî yên cihê ve– ew jî bê şik «Africa, 50 Years Of Music/ Afrîka, 50 salên muzîkê» (6) ye. Ew jî ji bo bêhtirî du sed sernavan ji hijdeh dîskan ne kêmtir e! Komek, li şeş herêmên erdnîgarîyê (Afrîka başûr, navîn, portekîzîaxêv, Rojhilat, Rojava û Bakûr) parvekirî ye, ku cihêtîyên parzemînê û repertuaran hemêz dike. Bi vî awayî dê fersenda amatoran jî hebe ku, ji xeynî hunermendên bi navûdeng ên di antolojîyên berê de hatibûn danasîn, muzîsyenên welatên serdana wan kêm tê kirin jî nas bikin: yên wek «Sweet Mother», Kenyans Slim Ali û Hodi Boys ên wî, «Wind Of Change» a Jackson Kaujeua yê Namîbyayî, «L'Algérie mon beau pays» a Slimane Azem, û «Ghana Freedom» a Et Mensah ê pêşeng, ku serxwebûna 6ê adara 1957ê pîroz dike.

«Ev serborîyeke hêjayî dîtinê ye û muzîka afrîkî ewinde bi bandor dike ku bi yekdengî û pirdengî jî bê guhdarî kirin: serborîyeke direj û dewlemend ku bazar, guhastin, jêgirtin, haveynê wê yê her ku diçû ji alîyê mîrat û afirandinê ve mezin dibû, kêm dibe, li şopa xwe vedigere û xwe diavêje deryayeke nenas». Dîroknasê kongoyî Elikia M'Bokolo di teksta xwe ya pêşkêşîyê de weha şirove dike, «Muzîkên afrîkî, zimanê rêkûpêkbûnê». *«Pirwateyî, lihevanîn, hevdemî» û «kevneşopî»: mirov ji kîjan alîyî de lê binihêre, muzîka hevdem a afrîkî her weke cûre laboratuarekê ye».*

(1) Afrîkaya rojava a fransî.

(2) *Le Temps des colonies / Serdema mêhtingehan,* muzîka Jacques Revaux, gotinên Michel Sardou (1976).

(3) "Afriques indépendantes. 1960-2010 : 50 ans d'indépendancemusicale / Afrîkayên serbixwe. 1960-2010: 50 salên serxwebûna muzîkî ", Cantos - Pias, 2010, 5 CD, 18,70 euros.

(4) "Free Africa", Le Son du maquis - Harmonia Mundi / "Afrîkaya Azad", dengê makiyan – Harmonia Mundi, 2010, 4 CD, 34,50 euros.

(5) "Les 50 plus belles chansons africaines / 50 stranên herî xweş ên afrîkî", Universal, 2010, 3 CD, 28 euros.

(6) "Africa, 50 years of music. 50 ans d'indépendances / Afrîka, 50 salên muzîkê. 50 salên serxwebûnan", Discograph - Wagram, 18 CD, 72,60 euros.

Wergera ji fransî: Yaqûb Karademir



ZOUBER YOUSEF: **Mirov û Sî**. Text û Metal, 110 x 30 x 15 cm

Le Monde diplomatique kurdî (Çapa elektronîk)
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

Lijneya Weşanê
Murad Satik
Riza Dînç

Le Monde diplomatique kurdî

Redaksiyona Zimanî
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

Koordînasyon
Yado Ciwan

Alîkarên vê hejmarê
Nedîm Baran
Semra Polat
Ergün Yetkiner

Revîzyona Wergeran
Feryal Guladawîya

Berpirsê Hunerî
Hasan Huseyîn Devecî

Designer
Fabio Biasio

Web Developer
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@diplo-kurdi.com
www.diplo-kurdi.com

ABONETÎ
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

Abonetîya dîjîtal ya salane: 30 €

Le Monde diplomatique

Damezrîner
Hubert Beuve-Méry

Birêveberê giştî
Serge Halimi

Sernivîskar
Maurice Lemoine

Cîgirên Sernivîskarî
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

Redaksiyon
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

Birêveberê hunerî
Alice Barzilay

Dokumantasyon
Olivier Pironet

Sekreter
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.diplo-kurdi.org

Li Sûrîyê Kurdistan (Dewama rûpela 1)

Li Kurdistanê rêxistinbûyîna kurdan

Li herêmê, PYD a (Partîya Yekîtîya Demokratîk) nêzîkî PKKê bi bandor e. PYDê bi navê Meclisa Gel a Kurdistana Rojava meclisek jî ava kiriye. Ji bilî PYDê, hin rêxistinên kurd ên din jî hene. Tê gotin ku hejmara wan 16 ye. Ji wan, çendek bi bandor in. Partîya Demokrat a Kurdistana Sûrîyê jî di nav wan de ye.

Grupên ku PYDê jî di nav wan de cîh digirt, di hundirê meha tîrmehê de li Hewlêrê bi înîsîyatîfa Serokê Rêveberîya Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî civînek li dar xist û yekîtîyek ava kirin. Di vê yekîtîya ku navê wê Konseya Kurd a Bilind e, hem ji Meclisa Neteweyî ya Kurd û hem jî, ji Meclisa Gel a Kurdistana Rojava pênc encam cîh digirin.

Ev yek rastîyek e ku dê bi saya tevgerandineke bi yekîtî qezenc mezin bibin û pêşve biçin. Feydeyên wê yekê gelek zêde ne ku kurd, li hember rêveberîya Beşar Esad û KNSyê bi hev re tevbigerin.

Li Sûrîyê tê dîtin ku rêxistinbûyîna kurdan ji ya erebên sunî, ermenî, suryanî, file û durzîyan hîn xurttir e. Tê zanîn ku, rêveberîya Beşar Esad û Partîya Beas a Sûrîyê, li vî welatî pişta xwe dide hindikahîya elewî.

Helwêsta dewlet û çapemenîya tirkî

Li Sûrîyê, destpêkirina serdema serdestî û xwerêvebirina kurdan a li herêmên xwe, di rêveberî û çapemenîya tirkî de tesîreke şokê çêkir. Manşetên wek, "Kurdistana Duwem", "Sûrîyeya Bakur" hema hema di hemû rojnameyan de derketin. Herweha, manşetên wek, ''Dê ya sêyemîn kengê bê?'' û ''Kurdên ku li çar welatan belavbûyî'' jî hebûn. Tevahîya van manşetan di hundirê xwe de metirsîdarîyek dihewand.

Di qunciknivîsên rojnameyan, radyoyan, di panelên televizyonan û di şiroveyan de, ev îbare her cîh girtin: "Kurdên ku li Iraq, Îran, Tirkiye û Sûrîyê dijîn", "Kurdên ku li Iraq, Îran, Sûrîye û Tirkiyê ji hev belawela dijîn…"

Pêwîst e ku meriv li ser van her du telafûzan, ango, "Kurdistana Duwem" û "Kurdên ku li Iraq, Îran, Sûrîye û Tirkiyê ji hev belawela dijîn…" bisekine. Peyva "Kurdistana Duwem" bersiva pirsên wek, çend Kurdistan hene, çima Kurdistan ji yekê zêdetir e û ev pêvajo çawa hatiye jîyan tîne rojevê. Herweha "Kurdên ku li Iraq, Îran, Sûrîye û Tirkiyê ji hev belawela dijîn…" jî heman pirsan tîne rojevê.

Gelo kurd çima wusa belawela dijîn? Çima li çar welatan hatine belav kirin? Ev pêvajo çawa derketiye meydanê, ev yek çawa hatiye fikrandin? Ev pêvajo çawa tê jîyan? Helbet, divê li ser van pirsan bi kûrahî bê sekinandin.

Divê meriv vê yekê bibêje ku ev îfade, di medyayê de gelek tên bi kar anîn, lê qet ev pirs nayên kirin.

Li gor bawerîya min, parvekirin û jihevveqetandina kurdan di çarîka yekem a sedsala bîstan de, ango piştî Şerê Cîhanê yê Yekem, rûdana herî girîng e.

Kurd û Kurdistan di vê serdemê de, ango di dema Cemîyeta Netewan (Cemiyet-i Akvam) de ji hev hatine veqetandin û parve kirin.

Di dawîya Şerê Cîhanê yê Yekem, di çileya 1919ê de, li Kongreya Parîsê yek ji biryarên herî girîng ê hatî girtin damezirandina Cemîyeta Netewan e. Cemîyeta Netewan, ji çileya 1920ê ve dest bi xebata xwe kiriye.

Serdem, serdema tayînkirina mafê çarenûsî ya neteweyan bû. Sedemê damezirandina Cemîyeta Netewan ew bû ku, netewe bikaribin dahatûya xwe bi awayekî azad dest nîşan bikin. Cemîyeta Netewan jî dê ev nêveng amade bikirana. Cemîyeta Netewan, ji bo wê yekê hatibû damezirandin ku netewe pirsgirêkên di nav xwe de bêyî ku şer bikin û bi awayekî aştîyane çareser bikin Di Konferansa Parîsê ya piştî Şerê Cîhanê yê Yekem de herî zêde li ser hewcedarîya rêxistinek wusa a navnetewî hatibû sekinandin.

Di vê serdemê de, rêvebirên Yekîtîya Sovyetan hin ji wan kesan bûn ku li ser mafê çarenûsî yê gelan diaxifîn. Serokê Amerîkayê yê wê demê, Wilson, piştî şer di daxuyanîya xwe ya navdar de "14 xal" deklare kiribûn. Ji van "14 xalan" 12ê wan, qala pêwîstîya mafê çarenûsî ya neteweyên ku di bin desthilatdarîya osmanî de bûn dikir. Li Asya, Rojhilatê Navîn û li Afrîkaya Bakur, gel ji bo ku siberoja xwe tayîn bikin, di nav hewleke şidyayî de bûn. Ew ramana ku heq dida gelên bindest ku mafê çarenûsîya xwe îlan bikin û têkoşînên ji bo vê sedemê dihatin dayîn, coş û kelecaneke mezin dida neteweyên di bin zordarîyê de bûn.

Şêx Mehmûd Berzencî, li Başûrê Kurdistanê digot, "Ez qiralê Kurdistanê me, min wek qiralê Kurdistanê binasin!" û ji bo mafên kurdan bi Brîtanyaya Mezin re di nav pevçûneke siftî de bû.

Kurd û Kurdistan, di rewşeke weha de ji hev hatin veqetandin û parve kirin. Piştî ku kurdan li Sûrîyê, li Kurdistanê, li warên xwe dest pê kirin ku xwe bi rê ve bibin, di çapemenîya tirk de qet li ser van sedemên van xalan nehate sekinandin û ev yek jî têra xwe balkêş e. Digotin, "Kurd,li Iraqê, Îranê, Tirkiyê, li Sûrîyê bi awayekî belawela dijîn" an jî peyva "Kurdistana Duwem" bi kar dianîn, lê qet li ser sedemên dîrokî yên vê yekê nasekinin û ev jî balkêş e.

Ev qezencên kurdan ên li Sûrîyê rêveberîya tirk him metirsîdar kir û him jî aciz kir. Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan digot, "Em ê, ji min kir û xilasan re nebêjin erê." Digot, "Kurdistanê ji bîr bikin."

Ew îfadeya serokwezîr a "Kurdistanê ji bîr bikin" di 27ê Tîrmeha 2012ê de di manşeta Hürriyetê de û bi tîpên mezin hat weşandin. Ev îfadeya serokwezîr ev fikir anîn bîra min: "Pirranîya kurdan, Kurdistan ji bîr kiribû, serokwezîr bi vê îfadeya xwe Kurdistan anî bîra wan."

Cemîyeta Neteweyan, nikarî wê daxwaza aştîyê ya li bendê bû ku di nav gelan de çêbike têxe jîyanê. Nikarî rê li ber derketina Şerê Cîhanê yê Duwem bigre. Şerê Cîhanê yê Duwem, li gor yê Yekem hîn zêdetir bi kuştinan derbas bû. Kurd, di serdema Şerê Cîhanê yê Duwem de jî li ser pîyan bûn. Komara Kurdî a Mahabadê di vê demê de derket meydanê. Di sala 1941ê de Îngiltereyê rojavayê Îranê û Yekîtîya Sovyetan jî bakurê wê dagîr kiribû. Komara Kurd a Mahabadê, li herêma di bin dagîrîya Sovyetan de bû hatibû damezirandin.

Piştî vî şerî jî yek ji mijarên herî girîng ew bû ku, li ser rêxistinbûyîneke navnetewî bê sekinandin. Aştîya di nava gelan de, bi dengekî hîn zêdetir dihate guftûgo kirin. Serketîyên Şerê Cîhanê yê Duwem; Amerîka, Îngiltere, Fransa, Yekîtîya Sovyetan û hwd, him di pêvajoya şer de û him jî piştî şer li ser vê mijarê gelek sekinîn. Neteweyên Yekbûyî (YN) di sala 1945ê de bi vî awayî hate damezirandin.

Lê mixabin kurd bi ser neketin ku dengê xwe bigihînin Neteweyên Yekbûyî jî. Ew dewletên ku Neteweyên Yekbûyî ava kiribûn jî hewcedarî pê nedîtin ku kurdan bêxin rojeva xwe û guh bidin daxwazên wan. Parçekirin û parvekirina Kurdistanê ya di salên 1920ê de rê li ber vê yekê girtibû.

Cemîyeta Neteweyan, qet dêhn û bala xwe nedabû ser kurd û daxwazên kurdan. Herdem berjewendîyên Brîtanyaya Mezin û Fransayê li ber çavan hatibûn girtin. Di salên 1920ê de Iraq, Urdun û Filîstin kolonîyên girêdayî Brîtanyaya Mezin; Sûrîye û Lubnan jî wek kolonîyên Fransayê hatibûn damezirandin. Di vê serdemê de, çima Kurdistan wek kolonîyek nehatibû damezirandin, pirseke watedar e. Ew kesên ku Cemîyeta Neteweyan ava kiribûn, dev ji Kurdistaneke serbixwe berdin, Kurdistaneke kolonî jî nefikirîn. Divê ev yek pirseke girîng be.

Di salên 1920ê di dema Neteweyên Yekbûyî de, du hêzên emperyal ên ku li cîhanê gotina wan pere dikir Brîtanyaya Mezin û Fransa bûn. Li Rojhilatê Navîn jî du dewletên xwedî kok, Împaratorîya Osmanî Komara Tirkiyê û Împaratorîya Îranê jî Şahîtîya Îranê afirandin. Ev her du hêz li ser Kurdistanê hêzên bandorker bûn. Van her çar hêzan bi awayekî organîze û bi hev re berê xwe dan kurd û Kurdistanê.

Van her çar hêzan, di nîvê sala 1929ê de bi hevre peyman çêkirin û xwestin kurdan di nav sînoran de bixeniqînin. Mebesta Pakta Sadabadê ku di sala 1937ê de hate damezirandin tam jî ev e. Afganistan jî xistin nav vê paktê, ku sedemê wê yê bingehîn hinek veşêrin.

Brîtanyaya Mezin, beriya Şerê Cîhanê yê Duwem xwe ji Iraqê paşve kişand û mafên xwe yên li ser Kurdistanê spart kolonîya xwe, Iraqê. Fransayê jî piştî Şerê Cîhanê yê Duwem, ji Sûrîyeya kolonîya xwe vekişîya û mafên xwe yên li ser Kurdistanê spart Sûrîyê. Ev dewirkirin wek dewra mafê mîrasê yê hiqûqa taybet pêk hat.

Piştî Şerê Cîhanê yê Duwem, ji hêla siyasî ve li dinyayê gelek guhertin pêk hatin. Wek mînak; berîya şer li Afrîkayê tenê du dewletên serbixwe hebûn; Habeşîstan û Lîberya. Îro ev hejmar gihîştiye 57ê. Piştî dawîya salên 1950 welatên kolonî/bindest azadîyên xwe bi dest xistin. Ev pêvajo, di salên 60 û 70yê de hîn bi lezûbez berdewam kir.

Miqabilî van hemû pêşveçûnan, li Kurdistanê ti tişt neguherî. Ew statukoya ku di serdema Cemîyeta Neteweyan de hatibû bi cih kirin ku statuyekê nedin kurdan bi heman şêwazî hate berdewam kirin. Herweha, di serdema Neteweyên Yekbûyî de jî ew statukoya li Rojhilatê Navîn ku li ser bêstatubûna kurdan hatibû ava kirin bi heman awayî domîya.

Pêwîst e ku meriv li ser bisekine û lê hûr bibe, ka gelo welatên rojavayî çima li dij kurdan bûn. Divê meriv ji welatên rojavayî ên wek Brîtanyaya Mezin, Fransa û Almanyayê van pirsan bike û li bersiva wan bigere, lewra ev yek girîng e.

Terora dewletê

Kurd, ev bû nêzîkî 30 salan e têkoşîna rizgarîyê didomînin. Tirkiye, vê tekoşînê wek "teror" bi nav dike. Vê meselê ji welatên ewropî re jî wusa dide nasîn. Ew dewletên ku girêdayî Konseya Ewropa û Yekîtîya Ewropayê ne jî, vê têkoşînê li gor daxwaza Tirkiyê wek "teror" dest nîşan dikin.

Li gor min, li cîhanê, ti têkoşîneke ku ji bo rizgarîya neteweyî tê meşandin, ne "terorîst" e. Têkoşîn ji bo rizgarîya neteweyî tên meşandin, nikarin bi têgîna "teror" ê bêne nirxandin. Gelek baş tê zanîn ku têkoşînên rizgarîya neteweyî, nirxên wek azadî û wekhevîyê diparêzin, li dij zordarî û bindestîyê ne. Lê welatên emperyal û mêtînger, ji bo ku bikaribin van têkoşînan têk bibin, metodên ''teror'ê bi kar anîne. Terora dewletê hîn zêdetir hilkişandine jor.

Tirkiye jî, ji bo ku bikaribe têkoşîna rizgarîya kurd têk bibe, metodên "terorê" bi awayekî zêde bi kar tîne. Terora dewletê her zêdetir û berbelav kirine. Bi rêya rêxistinên taybet ên wek Tîmên Taybet, JÎTEM (Têkoşîna li dij Terorê ya Îstixbarata Jenderme) TUSHAD (Daîreya Hereketê û Stratejîyên Neteweyî yên Tirkiyê) terora dewletê her rapelandine jor û berbelav kirine.

Di şerê 30 salên dawî de bi hezaran gund hatine şewitandin û vala kirin, bi mîlyonan kurd ji cîh û warên xwe hatine veqetandin. Çavkanîyên bingehîn ên ku pê debara xwe dikirin; ên wek daristan, bax û baxçe hatine şewitandin. Ew kes û malbatên ku bi darê zorê ji wargehên xwe hatin veqetandin, mecbûr man ku li perên bajarên mezin di nav xizanîyê de jîyana xwe bidomînin. Li gundê te ax heye, av heye, bax û bostanên te hene û tu nikarî wan bi kar bînî, jê sûd wergirî. Lewra tu ji warê xwe hatî qewitandin. Di waroşên bajaran de jîyanek di nav xizanîyê de didomînî. Bêguman, ev yek pirsgirêkeke pir girîng a civakî ye.

Bi hezaran cînayetên ku wek "kiryar-nedîyar" tên bi lêv kirin hene. Îro bi awayekî vekirî derketiye meydanê ku kiryarê van kuştinan dewlet bi xwe ye.

Nêzîkî 2 hezar kurd, ji malên xwe, ji kargehên xwe, ji kolanan hatine revandin, bi işkenceyan hatine tune kirin û bi îhtîmaleke mezin hatine kuştin hene, lê ti agahî di derbarê wan de nîne. Malbatên kurd, xwe negihandine termên wan û gorên van kesan jî nînin.

Hejmara ew kesên ku hatine revandin, bi îşkencê hatine kuştin; piştî demekê termên wan di binê piran, li kêleka rêyan, li qûntarên çîyayan û li neqebên gelîyan de hatine dîtin ji sê hezaran zêdetir e ku malbatên wan term û hestîyên wan dîtine.

Tê gotin ku hejmara cînayetên "kiryar-nedîyar" ên ku ji salên 1990ê ve dest pê kirine li derdora 17 hezarî ye.

Gelo dewleta ku ji bo kurdan dibêje, "hemwelatîyên min", "Birayên min" çawa karîye ewqas cînayetan li dar bixe? Dîsa tê zanîn ku ji van bûyeran yek ji wan jî nebûye mijara darizandinê, li ser ew dozên ku di bin zextan de hatine vekirin jî nehatiye sekinandin û bi demê re ev dosya hatine girtin.

Em roja 9ê mijdara 2005ê bînin bîra xwe. Di vê rojê de, 2 endamên JÎTEMê li Şemzînanê bombe avêtibûn 'Umut Kitabevi'. Bombe teqîyabû, di pirtûkxaneyê de xesareke mezin a diravî çêbûbû û rê li ber şewatekê vekiribû. Ew kesên ku bombe avêtibûn dikanê, li wê derê ji alîyê gel ve tavil hatibûn derdest kirin. Tîmên Taybet û endameke sêyemîn yê JÎTEMê, ji ber ku van kesan ji destê girseya gel bifilitînin gule reşandibûn ser xelkê û di encama vê guleReşandinê de jî kesekî jîyana xwe ji dest dabû.

Qereqolê ew kesên ku hatibûn derdest kirin ji gel girtin û dûre birin di derîyê paşî yê qereqolê de serbest berdan. Bi saya helwêsteke bibiryar a kurdan, ev bûyer çû dadgehê û ev kes hatin girtin. Fermandarê Hêzên Bejayî yê wê demê, Orgeneral Yaşar Büyükanıt, ji bo van endamên JÎTEMê ku bombe avêtibûn 'Umut Kitabevi', got, "Ez wan nas dikim, zarokên baş in. Hewcedarî bi girtina wan nîne." Di wê serdemê de, di çapemenîyê de li ser peyvên "zarokên baş" pir şirove hatin kirin.

Hate dîtin ku, ne Yekîtîya Ewropayê, ne Konseya Ewropayê û ne jî Amerîkayê qet reaksîyonek nîşan nedan. Ew dewleta ku terorê her zêdetir dike û li ser sûc hatî girtin, qet nebe, nebû gunehkara şermezarîyekê jî.

Ew Ewropaya ku Srebrenica anîbû Dadgeha Ceza ya Navnetewî, li hember terora dewletê ya Tirkiyê piştgirîyeke mezin û bêsînor dide Tirkiyê. Li hemberî vê yekê, welatên ewropî ji Tirkiyê îhaleyan werdigirin. Tirkiye, îhaleyên xwe yên mezin, bi vî awayî bi kar tîne û ev yek ji xwe re kiriye polîtîkayek.

Di tîrmeha 1995ê de, li Srebrenicaya ku li rojhilatê Bosna-Hersekê cîh digre, derdora 8 hezar mêrên boşnak ên misilman, ji alîyê sirban ve hatibûn qetil kirin. Ew qatilên sirbî, niha li Dadgeha Ceza ya Navnetewî tên darizandin. Lê li hember kurdan, ji wan cînayetên ku li Srebrenicayê hatibûne kirin, gelek girantir cînayet hatibûne li dar xistin. Hejmara kurdên ku bi cînayetên 'kiryar-nedîyar' hatibûne qetil kirin, du qat ji hejmara wan kesên ku li Srebrenicayê hatibûne kuştin zêdetir e.

Di navbera salên 1985-1988ê de, li Bulgaristanê navên tirkan dikirin navên bulgarî û operasyonên bi vî rengî hebûn. Tirkiyê, him wek dewlet û him jî bi rêya dezgehên sîvîl ên civakî reaksîyoneke mezin nîşan dabû. Herweha xwest ku dewletên cîhanê û yên ewropî jî bi şermezarîyan tevlî vê pêvajoyê bike.

Hin dewletên ewropî û dezgehên wek Konseya Ewropayê, Yekîtîya Ewropayê û Rêxistina Hevkarîya Ewlekarîya Ewropayê jî Bulgaristan misêwa rexne û şermezar kirin.

Bulgaristanê, hîn di sala 1988ê de dev ji vê polîtîkayê berdabû. Mafên tirkan hîn wê demê nas kirin.

www.zaravaxirin.org

Zouber Yousef: **Bihara Erebî**. Text û Metal, 40 x 110 x 25 cm

Bulgaristan, niha endama Yekîtîya Ewropayê ye.

Lê li Tirkiyê, polîtîkayên nijadperest û veqetînêr, li hember çand û zimanê kurdî bi awayekî sîstematîk didomin. Dema kurd dixwazin navên kurdî li hin park û dezgehên çandî bikin, wê demê tîpên alfabeya kurdî ên wek; x, q, w dikin bahane û ji ber ku ev tîp di alfabeya tirkî de nînin, bi destê walîyan ev biryar têne îptal kirin. Halbokî, ji bo van navan biryarên meclisên şaredarîyê hene. Hebûna walî û qeymeqama, tê wateya qedexekirina kurdan û kurdî.

Helwêstnîşannedana Ewropayê û dezgehên wê ya li hember van peyikandinên nijadperest; şûna ku wan rexne bikin, piştgirîdayîna bêsînor a terora dewletê, ne tenê antî-demokratîk e, herweha ne exlaqî ye jî.

Rihê dezgehên navnetewî

Mebesta hebûna dezgehên wek Neteweyên Yekbûyî, Konsya Ewropayê, Yekîtîya Ewropayê û Rêxistina Hevkarîya Ewlekarîyê ya Ewropayê ew e ku, demokrasîyê, azadîyan û aştîyê pêşve bibin û bidin bi cih kirin. Lê ew polîtîkayên ku li hember kurdan tên peyikandin, li dij rihê dezgehên navnetewî ne. Divê ev dezgehên navnetewî vê yekê bizanibin.

Tirkiye, divê kurdên Sûrîyê nas bike!

Ew nêrîn û helwêsta ku gelê tirk li hember pirsgirêka kurd û Kurdistanê nîşan dide ji alîyê dewletê ve tê tayîn kirin. Dewlet, hikûmet û serokwezîr şekil dide nêrîn û helwêsta gelê tirk.

Devlet, hikûmet, serokkomar, serokwezîr û rayedarên din, dibêjin ku 'kurd û tirk hezar sal in bira ne, PKK û BDP dixwaze vê biratîya hezar salan xirab bike'. Dibêjin ku, 'PKK û BDP esil zerarê didin kurdan.' Piranîya kurdên ku rayên xwe didin AKPê jî, bawerî bi van gotinên dewlet, hikûmet û rayedaran tînin, piştgirîyê didin wan.

Halbukî rastîyeke ku tê zanîn, kurd, li hember polîtîkayên înkar û îmhayê ve rûbirû ne. Lê ji ber ku vê peyikandin û polîtîkayê bikaribin veşêrin û kurdan bixapînin, hewl didin ku, bi uslûbeke însanî derkevin pêş gel. Wek mînak; serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan, misêwa gotinên Yunus Emre yên, “Ez hez ji afirandîyan dikim, ji ber afirînêr” bi lêv dike.

Ji ber ku bawerîya gelê kurd a îslamî xurt e, wan bi vî awayî bixe bin bandora xwe û wan bi dilsozîya xwe qanî bike, van gotinan dibêje. Herweha yek ji gotinên rayedarên dewletê ku herî zêde bi kar tînin jî ev e: “Kurd û tirk bira ne, ev welat bi şer û bi hev re ava kirine.” Bi van gotinan mebest ew e ku, di kurdan de ramaneke weha çêbibe: Em kurd û tirk bira ne û em dikarin di van mercan de bi tirkan re wek bira bijîn.

Lê belê ev propogandaya dewletê ji bo wê yekê tê kirin da ku kurd nikaribin bi awayekî tendûrist bifikirin. Êdî herkes dizane ku li Tirkiyê, Îranê, Iraqê û li Sûrîyê kurd xwedî nifûseke mezin in. Kurdên Iraqê, herçiqas Tirkiye, Îran, Iraq û Sûrîye astengî jî derxistibûn, ev bû nêzîkî 10 salan e, ne tam be jî azadîyên xwe bi dest xistine.

Tirkiyê, li hember vê yekê gelek li ber xwe daye. Niha jî PKK an jî PYDê bahane dike û bi awayekî tund li hember têkoşîna rizgarîya kurdan a li Sûrîyê derdikeve û ji bo ku kurd bi sernekevin, serî li her rêyê dide. Mesela, wusa dike ku KNS kurdan tehdît bike. Xuya ye ku KNS ji şerê navxweyî yê li Sûrîyê serketî derkeve, dê bi manîpulasyon û piştgirîya Tirkiyê berê xwe bide kurdan.

Baş e, sedemê vê neyartîya li hember gelê kurd çi ye? Gelo sedem PKK an jî PYD ye? Di van demên dawî de serokwezîr gelek caran anî ziman ku, ew ê çavê xwe ji wê yekê re negrin, ku PKK an jî PYD li Sûrîyê qadên azad bi dest bixin. Heger sedem PKK an jî PYD be, wê demê gelo çima Komara Tirkiyê mafê gelê kurd ku xwedêgiravî wek bira dibîne, li her derê naparêze?

Wezîrê Derve yê Tirk Ahmet Davutoğlu, di 1ê tebaxa 2012ê de çû Hewlêrê. Çima? Ji bo ku bikaribe tevgera azadîyê ya gelê kurd a li Sûrîyê bixeniqîne û ji Barzanî piştgirîyê bigre. Ev çavtirsandinek bû. Di 2yê tebaxa 2012ê de jî serdana Kerkûkê kir. Tevî sloganên “Kerkûk tirk e û dê tirk bimîne” nîşan da ku, ji bo tirkayetîya Kerkûkê çiqas hesas e û vê yekê bi gotinên nijadperest anî ziman. Baş e, gelo çima carek be jî van hestan li hember gelê kurd ku wek bira bi nav dikin nîşan nadin? Çima ji bo mafê kurdan ên li Sûrîyê qet daxuyanîyeke biçûk jî nadin? Çima gelo şûna PKK û PYDê, Komara Tirkiyê mafê gelê kurd yê li Sûrîyê naparêze? Ji sala 1962yê ve li Sûrîyê nêzîkî sê sed hezar kurd bê nasname û ji hemû mafên xwe mehrûm dijîn. Dewleta tirk, çima mafê gelê kurd ê bira qet bi lêv nekir?

Wek encam, divê kurdên AKPyî wê polîtîkaya dewletê ya him zirav û him jî vekirî, him veşartî û him jî li ser neyartîya gelê kurd tê peyikandin bibînin. Heger ev kes vê yekê nebînin, dê bibe sedem ku kurd hîn derengtir mafên xwe bi dest bixin. Divê dewleta tirk di demeke zûtirîn de dev ji neyartîya kurdan berde. Lewra, heger ev neyartîya vekirî-veşartî çiqas bidome, ji bilî ku li rûpelên şermê yên dîroka xwe hin rûpelên din zêdetir bikin, dê ti qezenceke din a vê yekê tunebe. Divê dewlet di demeke zûtirîn de dawî li vê neyartîya vekirî-veşartî ya li dij gelê kurd bi dawî bîne, di nav welatên demokratîk, pêşketî û bi xîret ên cîhanê de cihê xwe bigre

Tirkiye, weke ku Rêveberîya Herêmî ya Kurdistanê nas kir, divê vesazî û dezgehîbûna kurdên li Sûrîyê jî binase. Ji ber vê yekê jî, pêwîstî pê heye ku bi kurdên xwe re jî têkilîyên germ girêbide û pêşve bibe. Tirkiye, divê dev ji qaretî û pozbilindîyê berde; rê û rêbazan bibîne da ku bi kurdan re danûstandinan pêk bîne û bi wan re biaxife.

Wergera ji tirkî: Yado Ciwan

www.nefelvakurd.org

Kurd û “Raperîna Sûrîyê” (Dewama rûpela 1)

Rewşa kurdan li Sûrîyê çi ye?

Li herêmên kurdan ên li Sûrîyê tevî protestoyên heftane yên li dijî rejîmê rewş bi piranî aram e. Piştî ku bi awayekî hovane protestoyên sala 2004ê kurd di protestoyên xwe û daxwazên xwe de pir bi dîqet in. Dîyar e ew li bendê bûn ka wê rewş çawa bi pêş bikeve. Wekî din kurd ditirsîyan ku rejîm protestoyên nû yên kurdan weke alozîyeke ereb-kurd nîşan bide. Piştî kuştina întelektuelê navdar û serokê Şepêla Pêşerojê Mişel Temo di 7ê çirîya pêşîn a 2011ê de mirov li benda zêdebûna protestoyên kurdan bû. Ev yek neqewimî. Kurdan nehişt ku aktorên din ên li nav welêt û li derveyî welêt berê wan bidin alîyê şaş. Protesto bi piranî gelekî aştîyane man, lê belê dengê daxwaza rûxîyana rejîmê her çû bilindtir û dîyartir bû. (2)

Piranîya partîyên parçebûyî yên kurdên Sûrîyê weke mînaka muxalefeta Syrian National Council (SNC) Kurdish National Council of Syria (KNCS) damezirandin. Lê belê KNCS nebû parçeyek ji hevgirtina muxalefetê ya ereb û sunî tê de serwer. Bi tenê partîya piçûk a bi navê “Şepêla Pêşerojê” bû endamê SNCyê. KNCS bi xwe rejîmê protesto dike, lê belê li hemberî SNCyê jî bi guman e. Ji ber serdestîya Birayên Misilman (BM) di muxalefeta erebî de kurd gelekî ditirsin ku ji baranê birevin û xwe bidin ber çirikê. SNCyê bixwe red kir ku tawîzên darîçav bide partîyên kurd û bi tenê garantî kir ku kurdên Sûrîyê wê siberojê bibin welatîyên xwedîyê mafên wekhev ên Sûrîyê. SNCyê red kir ku li ser xweserîyeke siyasî ya Kurdistana Sûrîyê guftûgoyan bike.

Zouber Yousef: **Siyamend u Xecê II.** Herî, 37 x 30 x 17 cm

Neyekbûna di navbera partîyên kurdî bi rêya îstîsnaî ya Partîya Yekîtîya Demokratîk (PYD) xurttir dibe. Ev partîya xizmê PKKyê ya li Sûrîyê, ji ber desteka Trkîyeyê ya li pişt SNCyê, bû dijbera SNCyê. Dibe ku alîkarîya dîrokî ya Hafiz el-Esad ê berîya Beşar el-Esad xwedîyê rolekê be. Lê belê qet guman tê de nîne ku têkilîya rejîma baasê bi PKKyê re ne ji meyildarîya daîmî pêk tê. Sala berîya mirina xwe bavê serokdewletê îro serokê PKKyê Ocalan li ser zexta Tirkiyê ji welêt kire der. Û di van salên dawîyê de çalakvanên PYDyê para bêhtir li gor endamên partîyên din ên kurdî rastî zext û zordarîya tundtir û dijwartir tên.

Ji destpêka serhildana çekdarî ya li dijî rejîma Esad û vir ve PYD li herêma Kurd Dax û Kobanîyê navendên çanda kurd û dibistanên zimên vedike û *de facto* erkên birêveberîyê pêk tîne, rejîm xwe li vê yekê radigire, da ku pêşîyê lê bigire ku muxalefet, nexasim jî îslamîstên dostên Tirkiyê li vê herêmê desthilatdarîyê nexin destê xwe. Bêguman maneya vê ne ew e ku PYD, çawa ku hin kurd îdîa dikin weke milê dirêj ê rejîmê tevdigere. Bêhtir rewş ew e ku berjewendîyên taktîk ên demkurt di navbera rejîmê û PYDyê de didin der: Rejîm dikare hêza xwe ya eskerî ji bo şerkirina serhildanê li bajarên ereb ên li navenda Sûrîyê bi kar bîne. PYD jî hewl dide weke ku PKKyê di salên 1980yê de li Tirkiyê kir hêza di nav tevgera kurdî de di yekdestî de bicivîne û pirsgirêka parçebûna qada siyaseta kurdî bi awayekî otorîter “çareser” bike. (3)

PYD ne tê de, partîyên cihê yên kurd ên ku hema hema hemû ji Partîya Demokrat a Kurdistanê ya Sûrîyê (PDKS) cihê bûne, heta bi salên 1990ê bi tenê li Qamişloyê hebûn. Vê yekê destûr da PYDya ku hê nû sala 2003yê hat damezrandin, valatîya siyasî ya li Kobanî û Efrînê dagire. Halê hazir wisa dîyar e ku vê partîyê paşê bi hevkarîya bi partîyên din re li van herdu keleyên xwe yên siyasî *de facto* erka dewletê bi dest xistiye. Tevî ku partîyên din ên kurdî îdîa dikin ku PYD bi rejîma Sûrîyê re hevkarîyê dike, PYD bi xwe van îdîayan bi hişkî red dike. Çalakvanên PYDyê yên ku di van salên dawîyê de her tim awirên zordarîya rejîmê dihatin ser wan, hê jî di girtîgehan de ne. 12ê adara 2012ê duwanzdeh girtîyên PYDyê yên li girtîgeha lêpirsînê ya el-Fayha ya li Şamê girtî dest bi greva birçîbûnê kirin. Di daxuyanîya xwe de PYD rejîmê bi ajotina Sûrîyê ber bi şerekî navxweyî ve gunehbar dike. Di kanûna 2011ê de partîyê da zanîn ku tu rewabûna rejîmê êdî nemaye. Li şûna wê partîyê “Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê” weke “nûnereke vîna kurd” îlan kir. PYDyê bi rêya “Meclîsa Gel” li Kobanî û Efrînê desthilat bi dest xist, ev yek wê bi rolekê rabe vê demê ku li alîyê Tirkiyê êdî bi dengekî bilind behsa desttêwerdaneke eskerî ji bo avakirina herêmeke tampon li Sûrîyê hizir û fikr tên bi lêv kirin.

Di heman demê de nîvê adara 2012ê, piştî hevdîtinên dûrûdirêj yekîtîyek di navbera KNCS û SNCyê hat xwestin. Ev lihevkirin di demeke wisa de pêk hat ku di nav SNCyê de alozîyên zêde derketin û tevî Catherine al-Telli, Kamal al-Labwani û Haitham al-Maleh sê endamên birêvberîya SNCyê îstîfa kirin, wan serokê SNCyê Burhan Ghaliun bi otorîterbûn û “dijdemokratîkbûnê” gunehbar kir. Hefteyekê piştre rengê hertiştî dîsa guherî: SNC dîsa bi yên îstîfakirî re li hev hat, KNCS jî şeva 27ê bi 28ê adarê ve girê dida dîsa ji SNCyê veqetîya, lewra SNCyê di nav xwe de li ser xweserîyeke kurdan di nav Sûrîyê de nikarîbû li hev bike.

Şerê ji bo dilsozî û girêdana kurdan

10ê hezîranê herî dawî muxalifekî kurd Abdulbasit Seyda weke xelefê Burhan Ghalioun weke serokê SNCyê hat hilbijartin. Ji Seydayê ku ne endamê komeke muxalif a kurd e, nehat ku ne partîyeke di KNCSyê de û nejî PYDyê bikişîne nav refên SNCyê. Dîyar e serê pêşî weke namzedê lihevkirinê yê lawaz ê hêzên cihê yên muxalefetê yên ereb ên di nav SNCyê de li ser lihevkirî, Seyda hatiye hilbijartin. Hilbijartina wî qismî bû sedema rexneyên pir tund ên partî û tevgerên kurdî. Berdevka Partîya Demokrat a Kurdistanê ya Sûrîyê li Londonê Heyam Aqil da zanîn ku komîteyên xwecihî Seyda weke maşika Tirkiyê dibînin û BM wî bi kar tînin da ku weha nîşan bidin weke ku rûyekî wan ê kurd jî heye. (4) Tevgera Ciwanên Kurd (TCK) a ku tevgera çalakgeran a di nava KNCSyê de ye jî rexneyên tund li Seyda girtin, (5) jixwe bi awayekî xwezayî derdora PYDyê ya ku SNCyê bi xwe weke maşika Enqereyê dibîne jî rexne li Seyda girtin.

Adarê protestoyên kurdan zêde bûn. 12ê adarê bi sedhezaran kurdên Sûrîyê di salvegera bûyerên li Qamişloyê yên sala 2004ê de beşdarî çalakîya deqîqeyeke bêdengî û rêzgirtinê bûn. Hingê bi dehhezaran kes jî daketin kolanan da ku li Qamişlo, Amûdê, el-Heseke, Kobanî, Efrîn, Heleb û rêzek bajarên piçûk ên kurd li dijî rejîmê xwepêşandanan li dar bixin.

1ê tîrmeha 2012ê nûnerên KNCSyê û Meclîsa Gel a Rojavayê Kurdistanê (MGRK) li herêma federe Başûrê Kurdistanê li bajarê Selahedînê peymanek mohr kirin, ev peyman diviya lihevkirina 11ê hezîrana 2012ê li Hewlêrê mohrkirî temam bike. (6)

Piştre KNCS û MGRKê şeva 24ê tîrmehê bi 25ê wê ve girê dide li Qamişloyê sazîyeke ji deh kesan pêk tê [Desteya Bilind a Kurd] ava kir. 29ê tîrmehê roja yekşemê bi sedhezaran mirov li Efrîn, Kobanî, Qamişlo û deverên din ên şên ên kurdan daketin qad û kolanan. Xwepêşandanên girseyî di dîroka kurdan de ev yekem car bû bi vî rengî pêk hatin: Hê qet neqewimîbû ku evqas kurd li Sûrîyê dakevin qad û kolanan û hem jî bi tevlîbûna rêxistinên cihêreng. Hê qet neqewimîbû ku kurd bi wêneyên Mesûd Barzanî, Abdullah Ocalan û Celal Talabanî li kêleka hev bimeşin. Li ser gelek pankartan wêneyê herşê siyasetvanên kurd li kêleka hev hatibûn çap kirin.

Tirkiyê weke caran bi awayekî gelekî êrişkar bersiv da derketina meydanê ya yekgirtî ya kurdên Sûrîyê, Enqere timî aciz dibe dema kurd tên cem hev û bi hev re kar dikin. Serokwezîrê Tirkiyê Recep Tayyip Erdogan di hevpeyvîneke di kanaleke televizyonê de gef xwarin û got, Enqere dibe ku dest werde Sûrîyê da ku pêşîyê lê bigire ku li ser sînorê di navbera Tirkiye û Sûrîyê de dewleteke *de facto* di kontrola “rêxistina terorê” ya kurd PKKyê de were damezirandin. (7)

Erdogan piştre 1ê tebaxê wezîrê xwe yê karê derve şand [paytextê] dewleta federe ya Kurdistanê Hewlêrê. (8) Serketina kurdan li Sûrîyê ya damezirandina avahîyên xweser girêdayî wê yekê ye ka gelo her du rêxistinên mezin KNCS û MGRK ji nêz ve bi hev re wê kar bikin yan na. Helwêsta Mesûd Barzanî jî gelekî girîng e: Gelo ew ê hertiştî bike da ku kurdên Sûrîyê yek bimînin, yan jî ew ê li hember zexta ji Enqere û Washingtonê ya her diçe zêde dibe paşde gav biavêje û bi vî rengî kurdên Sûrîyê di halê xwe de bihêle? Bi heman rengî helwêsta PKKyê jî gelekî girîng e: Gelo ew ê bi awayekî avaker bi Mesûd Barzanî re kar bike û bike ku PYD bêhtir hevkarîyê bi rêxistinên din ên kurd re bike? Divê mirov bêhtir cesaretê bide PYDya ku partîya herî çalak û herî baş birêxistinkirî ye bi partîyên piçûktir ên kurd re hevkarîyê bike, tevî ku pirî caran zehmet e mirov li hev bike. (9) Qaîdeyên lîstikê yên demokratîk wisa ne. PYD rêzê ji van qaîdeyan re bigire di dema dirêj de ji wê re bi qîmetê wê zanibin û rêzê jêre bigirin. Tiştek bi xwe zelal û dîyar e: Rêxistinên kurd ên li Sûrîyê wê nikaribin bikin ku gelê kurd ê li Sûrîyê bi dengekî bipeyive, PYDya hêzdar jî wê nikaribe vê bike. Ew li hemberî hevgirtineke têra xwe ji wan xuirttir a îslamîstên ereb-sûrî ne, bi ser de jî Tirkiye, Erebistana Suûdî û dewletên din ên Kendavê desteke didin vê hevgirtinê. Bi herhalî ti tehlûkeya ku ji rejîma Esad were êdî nîne, lewra ev rejîm wê di demeke nêzîk de bibe dîrok.

Encam

Bi giştî nabe ku careke din nûnerên komeke bi tenê ya ji xelkê, çawa ku niha el-Esad û hevgirên wî hemû elewî ne, bibin desthilatdar û li ser xelkê welêt ê pirdînî û piretnîk serwer bibe. Li Sûriyeya nû divê azadîya dîn, azadîya fikir û mafên mirovan pêk werin. Ji bo şikandina desthilatdarîya di dewletê de veguherîna ji dewleta navendî ber bi dewleteke federatîf avabûyî, dikare bibe derfetek. Ji bo vê yekê Herêma Federe ya Kurdistanê li welatê cîran Iraqê dikare weke mînak bi kêr were.

Armanc divê konferanseke navneteweyî be, ya ku tevahîya komên gelê Sûrîyê û aktorên navneteweyî yên cihê bi awayekî wekhev cihê xwe tê de bigirin: Nûnerên civakên dînî yên weke sunîyan, elewîyan, durzîyan û mezhebên cihê yên xirîstîyan yên weke ortodoksên sûrî û endamên dêra ortodoks a yekkirî ya romî. Lê belê herweha nûnerên hindikayîyên etnîk yên weke kurdan, ermenîyan, asûrî-aramî yan jî turkmenan jî divê di konferansê de cihê xwe bigirin. Ji bilî van koman divê dewlet û hêzên weke DYA, Rûsya, YE û Lîga Ereb jî beşdarî konferansê bibin. Bi tenê “desttêwerdaneke avaker” a bi vî rengî wê alîkarîya Sûrîyê bike da ku heke çareserîyeke siyasî ji bo pirsgirêkê hebe, ev çareserî were peyda kirin.

* Raportorê Rojhilatê Nêzîk ê “GfbV”yê [Civaka ji bo gelen di bin xeterîyê de]

Wergera ji almanî: Luqman Guldivê

(1) http://d-nb.info/967638798/34

(2) Dr. Kamal Sido, Zum Mord an Maschaal Tamo - Ein Nachruf / Li ser kuştina Mişel Temo – nivîseke bîranînê, http://www.gfbv.de/pressemit.php?id=2909

(3) صلاح بدرالدين, http://www.welateme.info/erebi/modules.php?name=News&file=article&sid=13600#.UBp41MA9X2E http://kurdwatch.org/html/en/html/de/syria_article.php?aid=2600&z=de&cure=246

(4) https://twitter.com/heyamaqil

(5) https://twitter.com/TcKurd

(6) http://www.kurdwatch.org/?aid=2595&z=de&cure=246

(7) http://www.faz.net/aktuell/politik/ausland/syrien-erdogans-angst-vor-einem-neuen-quasistaat-11834693.html

(8) http://www.deutsch-tuerkische-nachrichten.de/2012/07/457441/tuerkischer-aussenminister-davutoglu-syrien-darf-kein-zweiter-libanon-werden/

(9) مراد قره يلان. https://www.facebook.com/yoseef.jaglan

Li hemberî krîza Sûrîyê, çepgirên ereb ên parçebûyî

NICOLAS DOT-POUILLARD *

Berevajî serhildanên misrî û tûnisî, serhildana sûrî ya adara 2011ê di nav çepgirên ereb de bi yekdengî nehat pêşwazî kirin. Di navbera empatîya beramberî daxwazên demokratîk ên xwepêşandêran û tirsa desttêwerdanên siyasî û eskerî yên ji derve de man û vê yekê rê li ber parçebûnekê vekir.

Di tebaxa 2011ê de rojnameya libnanî ya çepgir û neteweparêz *El-Exbar* (1) ji damezirandina xwe û vir ve ango ji havîna 2006ê ve krîza wê ya pêşî hat serê wê. Alîkarê serredaktorê rojnameyê Xalid Saxiyeh ji rojnameya ku ew jî tevlî damezirandina wê bûbû, veqetîya. Saxiyeh ji kêmbûna desteka rojname dide serhildana gel a adara 2011ê destpêkirî, gazinan dike. (2) *El-Exbar*ê tu caran nêzîkatîya xwe ya siyasî a li Hizbullaha libnanî veneşart, ev Hizbullah yek ji hevgirên sereke yên herêmî yên Beşar el-Esad e. Û wan qet veneşart ku ew mentiqekî dîyalogê di navbera koma desthilatdarîyê ya li Şamê û beşeke muxalefetê de tercîh dikin û ne hilweşandina safî û hêsanî ya rejîmê. Di heman demê de rojnameyê mafê axaftinê da hejmarek muxalifên sûrî. Di nav wan de întelektuelekî sûrî-filistînî Selameh Kayileh jî heye ku dawîya nîsana 2012ê ji alîyê hêzên ewlekarîyê ve hat girtin.

Hezîrana bihurî lihevnekirinê xwe di versîyona bi ingilîzî ya rojnameyê (li ser Înternetê) de di encama gotareke Amal Saad Ghorayeb da der. (3) Bi awayekî aşkere gotarnûsa libnanî li ser xeta destekkirina Şamê ye, û berê tîrên rexneyên xwe dide partîzanên “rêya sêyem”, ango ew kesên gazinan ji rejîma otorîter a sûrî dikin, lê belê di heman demê de li dijî desttêwerdaneke ji derve ne, îhtîmala xurt ew e ku ev desttêwerdan li gor modela Lîbyayê eskerî û rojavayî be. Di encamê de heman mehê hevkarekî din ê *Al-Akhbar English*ê Max Blumenthal da zanîn ku ew ji rojnameyê vediqete, ev yek jî di gotareke xwe de kir ku pê rexne li “*alîgirên el-Esad*” ên di redaksîyonê de girtin. (4)

Krîza *El-Exbar*ê nimûneyî ye ji bo nîqaşên ku di cîhana erebî de çepgiran hem di warê stratejîk û hem jî di warê îdeolojîk de dike du bend. Hin jê li ser navê têkoşîna li dijî Îsraîlê û “berxwedana li dijî împeryalîzmê” desteka xwe ya ji rejîma sûrî re dewam dikin. Yên din jî li ser navê mentiqekî “şoreşger” û parastina “mafên demokratîk” bi awayekî biryardar di nav refên serhildanê de cihê xwe digirin. Ya rastî evên ku me dawîyê behsa wan kir xeteke di navberê de diparêzin: Di navbera piştgirîya bi mesafe ya bi daxwaza azadîya xwepêşandêran û redkirina “desttêwerdana ji derve”, ev xet pesnê awayekî “lihevhatina neteweyî” dide. Çi ji koka komunîst û marksîst bin, çi ketibin bin tesîra çepgirîyeke neteweparêz, çi tundraw bin û çi jî nerm, çepgirên ereb bi qewmîna li Sûrî re weke mozaîkeke derizî û şikestî bi gewde dibin.

Paradîgmaya dij-emperyalîst

Destekên safî û hêsan ên ji bavkê el-Esad re bêguman pir nînin û dengên ku doza weke xwe mana rejîmê dikin jî kêm in. Lê belê partîzanên bê şert û merc ên raperîna gel piranî xuya nakin. Para bêhtir li serîyê tundraw ê çepê yê siyasetê ne, carinan jî troçkîst in – Foruma Sosyalîst li Libnanê, Sosyalîstên Şoreşger li Misrê – yan jî maoîst – Rêya Demokratîk li Fasê. Têkilîyên wan bi hin beşên muxalefeta li dijî rejîmê yên weke Çepê Şoreşger li Sûrî ya Gayet Naîsse re hene. Ji bihara 2011ê ve wan dikarî beşdarî seferberkirinên yekcarî yên li pêşîya sefaret û konsolosxaneyên Sûrî yên li welatê xwe bibin. Hin întelektuelên çepgir herweha destekê didin mentikê serhildanê, weke dîrokzanê libnanî Fawwaz Traboulsi. (5) Ya ku pêşî doza wê tê kirin hilweşîna rejîmê ye: Ev hestîyarî û nazikîya di nav çepgirên ereb de çi dîyalog hebe li derveyî xwe dihêle. Ew alîgirê hewcedarîya protestokirina gel a pasîfîk be jî, ew mafê bikaranîna sîlehan ê serhildêran jî înkar nake. Li serîyê tundraw ê siyaseta çepê, partîzanên şoreşê li ser mijareke sereke xwe ji Konseya Neteweyî ya Sûrî (KNS) – yek ji koalîsyonên sereke yên muxalefetê – xilas kirine (6), ev mijar jî hevgirtina KNSê bi dewletên mîna Qetar, Tirkiye û Erebistana Suûdî ye ku bi tundî rexne lê tên girtin, lewra dikare serxwebûna tevgera gel a Sûrî bixe tehlûkeyê.



ZOUBER YOUSEF: **Benâv I**. Metal, 80 x 50 x 90

Partîyeke çepgir a ku gazinan ji rejîmê dike, banga rûxandina wê dike jî der barê alîkarîya monarşîyên Kendavê didin şoreşgerên sûrîyê de, têra xwe baldar û bi îhtiyat e, bi heman rengî ew newêrin bi tevahî bibin alîgirê nîqaşên dij-Esad yên ku di serî de Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, beşeke “civaka navneteweyî” wan dimeşînin. Di heman demê de ev refleksa dij-împeryalîst ji destekkirina serhildanê ne li pêştir bû. Tiştê girîngîya wê li pêş, rewşa navxweyî ya li Sûrîyê ye: Ev mentiqê serhildana miletekî li dijî rejîma xwe ye ya ku li pêşîya her tiştî tê, weke di pêvajoyên berîya niha li Tûnis û Misrê qewimî.

Li hemberî vê, mesafeyeke bi îhtiyat li beramberî raperîna li Sûrîyê xisleta piranîya hêzên xwe li alîyê çepê yê siyaseta cîhana erebî bi cih dikin e. Ev hêz serê pêşî ji eskerîbûna serhildanê gilî û gazinan dikin, lewra ev ê bi tenê bi kêrî komên îslamîst ên tundraw û şervanên bîyanî yên diherikin Sûrîyê were. Piştre ew îşaret bi mezhebbûna şer dikin, ku dibe sedem pêre pêre hindikahîya elewî û xirîstîyan bibe dijberê piranîyeke sunî ya zextê ew tundrawkirî, ew di vê yekê de şerekî navxweyî yê ku dawî lê neyê, dibînin. Di dawîyê de, ev hêz der barê têkilîyên hêzên herêmî û cîhanî de fikaran dikin. Îran û Sûrîye li dijî monarşîyên Kendavê; Rûsya û Çîn li dijî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê: Di lîstika mezin a şer a herêmî û navneteweyî de, ya ku Sûrîye ji xwe re kiriye xeteke bereya şer di navbera gelek aktorên dewletî yên navneteweyî de, tercîha çepgiran bi piranî li alîyê koma pêşî li dijî alîyê koma duyem e.

Bi vî awayî, 4ê nîsana 2012ê Yekîtîya Partîyên Neteweperest û Çepgirên Urdunî, koalîsyoneke ku ji komunîstan bigire heta bi neteweperestên ereb şeş partîyên siyasî dike yek, li Ammanê di nehemîn salvegera dagîrkerîya amerîkî ya li Iraqê de mîtîngekê organîze dike. Ya ku pêşîya dikê dadigire ne rûxîyana Sedam Huseyn e, krîza li Sûrîyê ye: Dijberîya li dijî “desttêwerdana ji derve” li Sûrîyê bi awayekî biryardar hatiye derbirîn, hin axaftvan operasyona eskerî ya nîsana 2003yê li dijî Iraqê û piştgirîya hêzên sereke yên rojavayî didin KNSyê û muxalefeta çekdarî dişibînin hev. (7)

Li Tûnisê di danezana 17ê gulana 2012ê de, navenda hêzdar a sendîkaya Yekîtîya Giştî ya Kar a Tûnisî (YGKT) – ku beşek ji buroya wê ya birêveber ji xeta çepgirên tundraw e –piştgirîya xwe ya ji daxwazên demokratîk a gelê Sûrîyê re pircarî kir, û hişyar kir li dijî “*komployeke*” ku dewletên “*kolonyal û yên ereb ên paşverû*” wê gij dikin. Berîya wê bi du mehan, Partîya Karkerên Komunîst a Tûnisî (PKKT) li alîyê dem û dezgehên neteweperest ên ereb banga tevlîbûna xwepêşandanekê kir ji bo protestokirina li Tûnisê lidarxistina konferansa “Dostên Sûrîyê”, “Dostên Sûrîyê” ji nêzî şêst heyetên navneteweyî pêk tê ku li dora KNSyê bûne yek.

Partîya Komunîst a Libnanî bi xwe xwedîya helwêsteke pir bi îhtiyat e: Carinan di dem û dezgehên xwe yên çapemenîyê de gotarên muxalifên sûrîyê yên weke Michel Kilo (yê ku ne endamê KNSyê ye) diweşîne, bi her halî wî xwe neda ber tevlîbûna çend xwepêşandanên ji salekê û vir ve li pêşîya sefareta Sûrîyê ya li Beyrûdê li dar dikevin. Bi ser de jî ew carinan dikeve ber tîrên rexneyên çepê tundraw ên libnanî, a ku beşek ji birêveberîya wê hê jî nêzî Partîya Daxwaza Gel a Sûrîyê ya Qedrî Cemîl e: Endamê muxalefeta “qanûnî” ye, Qedrî Cemîl weke alîkarê serokwezîr ê ji karûbarên aborî berpirsîyar întegreyî hukûmeta nû ya Riyad Hîcab bû, el-Esad Hîcab hezîrana 2012ê weke serokwezîr dest nîşan kiribû.

Para bêhtir mentiqekî reformîst û gav bi gav e ku beşek ji çepgirên ereb tercîh dike: Çareserîya pirsgirêka Sûrîyê li gor wan siyasî ye û ne eskerî ye. Danezana encamê ya Konferansa Neteweperestên Erebî ya ku hezîrana bihurî li bajarê Tûnisê Hemametê qederê du sed endamên partî û dezgehên neteweperest, çepgir (8) û di asteke kêmtir de yên îslamîst civandin, vê helwestê nîşan dide. Hewl hatiye dayîn ku belgeyeke bi qasî mumkin e herî yekdeng were amade kirin. Ew mafê gelê Sûrîyê ‘*yê azadîyê, demokrasîyê û guherîna pasîfîk a desthilatdarîyê*” qebûl dikin û “*şidet ji ku tê bila bê*” jî ew wê mahkûm dikin, dema vê dikin, çêl li rejîmê û muxalefeta çekdarî dikin, û bang li her duyan dikin ku bi mentiqekî “*dîyalogê*” tevbigerin; ev mentiq jî xwe dispêre plana vegera li aştîyê ya ku adara 2012ê nûnerê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (RNY) Kofî Annan pêşnîyaz kiribû.

Ji bo beşek ji çepgirên tundraw ên ereb perspektîfa şoreşger divê li Sûrîyê jî di rojevê de be, lê beşeke din ku hê mezintir e vê perspektîfa şoreşger êdî li ber çavan nagire: Rûxîneke xedar a rejîmê ne bi dilê wê ye. Ji bo vê beşê cewherê nakokîyê di nav şerekî sar de ye ku navê nayê gotin. Tirsa ji valatîyê û Sûriyeke piştî Esad a ku bi Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê re li hev hatî û bi dewletên Kendavê re hevgir e, ji ya demeke dirêj dewamkirina rejîmê bi gelekî xurttir e.

Wekî din, Sûrîye bi rengekî weke Janusekî ye li ber çavê milîtanên çepgir ên ereb. Yên ku xisleta Sûrîyê ya otorîter û zordar red dikin kêm in; lê belê îro jî axaftina rejîmê ya bergir tevî mueyîdeyên navneteweyî ên li dijî wê, li yek ji hîmên îdeolojîk ên herî kûr yên çepgirên ereb deng vedide: Paradîgmaya hevalbendîya dinyasêyem û dij-împeryalîst. Li cem hinan ev his bi girêdana bi xisleta gelêrî ya raperînê re girêdayî nerm dibe; li cem hinên din ev xislet berevajî ji ber navneteweyîbûna her diçe zêde dibe ya pirsgirêkê, pir zêde dibe.

Bi ser de jî dînamîka îslamîst a ku bi bihara erebî re peyda bû, ya ku li Fas, Tûnis û Misrê bi hatina devê derîyê desthilatdarîyê ya hêzên ji Birayên Misilman tên, xwe da der, bêguman li cem beşeke çepgiran kir ku mêzîn li berê vegere: Êdî dudilî li ser raperînên erebî heye, lewma dibe ku encama wan bibe hegemonîyeke îslamîst. Tevgera En-Nehda li Tûnisê, Birayên Misilman li Misrê û Urdunê weke desteka bi kelecan a muxalefeta Sûrîyê dîyar in. Helwêsta beşeke mezin a çepgirên ereb li ser mijara Sûrîyê bi vî awayî nîşana rûbirûbûna wê bi xwe ye bi hêzên Îslama siyasî re. Ji ber vê yekê û ji tirsa siberojên li ber avê biçin, partîyên ji xwe re para bêhtir dibêjin yên “şoreşê” û yên “pêşverû”, hin ji wan jî ji xwe re dibêjin marksîst, tercîheke nakokane dikin, ev tercîha wan ji bo çareserîyeke muzakerekirî û qonax bi qonax a derbasbûna li Sûrîyê ye.

* Lêkolîner li Institut français du Proche-Orient li Beyrûdê. Janusê: [Xwedayê romayî yê durûyên wî hene; nota wergêr] sûrîye û reşeyê îslamîst

(1) Vê rojnameyê salekê *Le Monde diplomatique* bi erebî weke pêveka xwe weşand.

(2) Ibrahim el-Emîn, “Çima Xalid Saxiyeh ji *El*-Exbarê veqetîya?” (bi erebî), *El-Exbar*, Beyrûd, 21ê tebaxa 2011ê.

(3) Amal Saad Ghorayeb, “Syrian Crisis: There’s a crowd / Krîza Sûrîyê: Li wir girseyek heye” *Al-Akhbar English*, 12ê hezîrana 2012ê.

(4) Max Blumenthal, “The right to resist is universal: a farewell to *Al Akhbar* and Assad’s Apologists / Mafê Berxwedanê Gerdûnî ye: Xatirxwestinek ji *El-Exbar*ê û Hevalbendên Esad”, *Al-Akhbar English*, 20ê hezîrana 2012ê.

(5) Kevne-endamê birêveber ê Rêxistina Çalakîya Komunîst a Libnanê (RÇKL), Fawwaz Traboulsî li Lebanese American University (LAU) ya Beyrûdê dersên dîrokê dide.

(6) Koneseya Neteweyî ya Sûrî havîna 2011ê li Stenbolê, li Tirkiyê hat damezirandin. Ew komên grîng ên muxalefeta Sûrîyê dicivîne, yên weke Birayên Misilman.

(7) “Partîyên neteweperest û çepgir reda xwe ya li dijî destwerdana jiderve ya nav karên navxweyî yên ereban, radigihînin” (bi erebî), *Nîda El-Weten*, Amman, nîsana 2012ê.

(8) Ji bilî sazîyên baasî yan jî nasirî, partîyên siyasî yên çepgir ên weke Partîya Sosyalîst a Yekbûyî (PSY) ya fasî, Bereya Gel ji bo Rizgarîya Filistînê (BGRF) yan jî Partîya Sosyalîst ya Yemenî (PSY) jî di Konferansa Neteweperestên Erebî de cihê xwe digirin.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurd.org

ELÎTÊN ABORÎ YÊN KU BIQASÎ EM DIFIKIRIN NE GLOBAL IN

Mîta «çîna global»

MICHAEL HARTMANN *

Ew ji bo hinan bi şiklê cîhguhertina şirketan xwe nişan dide, ji bo hinên din jî weke meaşên dêwane: Nîqaşên globalbûnê ji bo yên ku behsa wê dikin duqetî kar tîne, ew di heman demê de him reqabeta li ser mûçegiran "xwe ferz dike" him jî îmtiyazên elîteke weke ji neteweyê bilindtir tê terîf kirin, rewa dikin. Lê belê lêkolîneke hurgilî aktorên neteweyî yê serdestîya vê elîta xwe deshilatdar îlankirî, derdixe holê.

Di hevdîtina dawî ku berîya biçe rehmetê pêk anîbû, sosyologê lîberal Ralf Dahrendorf xwe dûrî teorîya xwe ya navdar kir û mirov matmayî hiştin. Yanî teorîya elîteke globalbûyî –yan jî di termînolojîya anglo-saxon de "çîna global"– ku xizmeta serwerbûna li cihanê dike û hez ji sînor û ayidîyetên neteweyî nake, wisa terîf dike. Wexta pirs jê hat kirin ka gelo ev elît ji krîza malî ya sala 2008ê sax filitîye, sosyologî weha bersiv dabû: *"Niha ev elît gelekî ji hev belawela dibe».* (1) Gelo bi dîtina wî ev belawelabûn dihat maneya têkçûna teorîya wî, yan jî ev qezayeke li ser rê bû? Dewama vê hevdîtinê vê yekê aşkere nake.

Ji bo gelek lêkolînerên zanistên civakî, nivîskarên ceribandinan û mîlîtanan hebûna vê "çîna global" –ku geh pesnê wê didin geh wê şermezar dikin– weke rastîyeke aşkere tê qebûl kirin. (2) Hê di sala 1996ê de, Jacques Attali xeyala *"şoreşeke çandî"* dikir ya ku dibe ku jê were rê li ber *"çîneke bilind ya ewropî"* veke. *"Qebûlkirina nû weke mizgînîyeke xêrê, qebûlkirina xizanîyê weke nirxekî, qebûlkirina bêîstiqrarîyê weke pirsgirêkeke lezgîn, qebûlkirina tevlihevbûna gelan weke dewlemendîyekê"* wê destûr bidaya afirandina *"eşîrên koçer ku tim xwe adapte dikin û gelek enerjîyê belav dikin û barê piştgirîyên nedîtî hildigirin*". (3)

Di sala 2008ê de, li gor rêveberê kovara *Foreign Policy* David Rothkopf daxwaza Attali hatibû bi cîh anîn. Ev yek jî ne di asta ewropî de, lê belê di asta cihanî de: Li gor sosyolog, wê demê ev "super-çînek" e ku ji netewan bilindtir bû, û ji qederê şeş hezar ferdan pêk hatibû û li tevahîya cihanê serdest bû. Cîhên ku ev elît tercîh dike çi ne? Paytextên mezin, hotel û cihên herî bilind yên randevuyên kapîtalîzma navneteweyî, li herî pêşîya wan jî Foruma Aborî ya Cîhanî ya Davosê heye. Pirtûka wî bi vê fikra cîgirê sekreterê giştî yê ingilîz yê Rêxistina Netewên Yekbûyî (RNY) Mark Malloch Brown dest pê dike: *"Wexta mirov tevlî şeveke li Davosê dibe pê dihese ku gelek nasên wî çêbûne, bêhtir in ji nasên ku dema mirov li bexçeyên bajarên xwe digere rastî wan tê.»* (4)

Ji bo patronên mezin avantajeke yekser ya mîta "afrînêrê dewlemendîyê yê ji kokên xwe qutbûyî" heye: Ev mît meaşên dêwane yên xwedîyên dinyayê ku wê gera wan di sergêjîya bazaran de bi tenê dema ku meaşê herî bilind bi dest xistin bi dawî bibe, rewa dikin. Seroka Tevgera Şirketên Fransayê (Medef) Laurence Parisot, di 11 adarê 2008ê de li ser kanala radyoyê France Interê weha hişyar dikir: *"Eger mirov hebûna meaşên bilind qebûl neke, tehlûke heye ku kesên herî jêhatî û potansîyelên mezin ji welatê me biçin deverên din".* Di demên nêzîktir de, serokwezîrê inglîz David Cameron soza "raxistina xalîçeya sor" da dewlemendên fransî ku ji ber biryara François Holland a bilindkirina heta bi %75ê ya bacên li ser dahatên herî bilind, wê ji Fransayê birevin û koçberî Ingilîstanê bibin. (5)

Peyva elîta global bi giştî koma kadroyên rêveber yên şirketên pirneteweyî îfade dike ku qaşo têkilîyên xwe bi nirxên neteweyî ku para mirovên asayî ye, qût kirine. Lê belê lêkolîneke li ser *top managers* ên Almanyayê tabloyeke rengorengo derdixe holê. Li alîyekî di dîroka Deutsche Bankê de cara yekem e ku piranîya konseya wê ya birêveber ji xerîban pêk tê. Li alîyê din jî, yek ji serkeftinên herî mezin yên pîşesazîyê, şirketa Bosch ji alîyê almanekî ve ku tevahîya karîyera xwe li nav welêt derbas kiriye, tê bi rê ve birin. Eger mirov bi dîtineke ferehtir nêzîkî bibe, wê bibîne ku hîletê "çîna global" ji kosmopolîtîzmê diçe.

Li Welatê Yekbûyî yên Amerîkayê weke li welatên ku xwedî hêzên aborî yên herî mezin ên Ewropa û Asyayê, hema hema tevahîya şirketên herî mezin ji alîyê herêmîyan ve tên bi rê ve birin. Bi navînî hejmara rêvebirên bîyanî ji sedî 5ê nabihure. Ev hejmar hîn kêmtir dibe wextê mirov hejmara rêveberên ku li welatê lê dişuxlin xwedîyê eynî zimanî ne (û pir caran xwedîyê eynî çandê jî) ji vê tabloyê derbixe, weke Swîsrî û Awusturiyayîyên ku li Almanya dişuxilin, yan jî weke Irlandî, Awûstralyayî, Kanadayî û Afrîkîyên Başûr ku li Ingilîstan û li Amerîkayê dişuxilin. Di nav şirketên pirneteweyî yên herî bi bandor de jî tercîh dikin elîtê xwe ji nav "malîyên xwe" hilbijêrin.

Li Çîn û li Italyayê, ji tu bîyanîyî nehat ku bikeve nav rêveberîya şirketeke mezin. Li Japonya û Spanyayê bi tenê îstîsnayek heye, ew jî ji ber yekbûna şirketeke herêmî bi şirketeke bîyanî re, yan jî wexta şirketek yeke din dikire, pêk tê. Li Fransayê didu şirketên pirneteweyî hene ku ji alîyê bîyanîyan ve tên bi rê ve birin, pênc li Welatên Yekbûyî yên Amerîkayê, neh li Almanya û hijdeh li Inglistanê hene. Lê ev hejmar dîsa kêm dibe wextê mirov bi tenê yên ku ziman û çanda wan ne ya welatê ku lê dişuxilin e, bihesibîne: Wê demê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê bi tenê du şirketên bîyanî wan bi rê ve dibin hene, li Almanya çar û li Inglistanê şeş hene.

Heke mirov li ber çavan bigire ku hema bêje tevahîya şirketên ku ew bi rê ve dibin du-neteweyî ne, senaryoya tevlihevbûneke mezin a çandî ya elîtên aborî di rastîyê de nayê dîtin. Gelo ev çîrokeke xeyalî ye ku ji xwendekarên mektebên bazirganîyê re tê gotin, yan jî ji bo alter-globalîstan [kesên ku doza globalbûneke alternatîf dikin ji bo parastina xwezayê û parastina heqê mexdurên globalbûnê, nota wergêr] bitirsînin dibêjin? Heke mirov li meyila birêveberan a ji bo çûna welatên xerîb binêre, nikare wisa bibêje.

Welatên ku kêmtir hez ji koçberîyê dikin jî, weke Spanya û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê, ji deh *top manager*an yek li welatê din şuxilandiye. Li Çînê ji heft rêveberan yek, li Fransayê, li Inglîstan û Îtalyayê ji pênc kesan yek, û heta li Japonya û Almanyayê ji sê rêveberan yek li welatekî xerîb şuxilîye. Ev yek tiştekî xwedî wate ye lê gelekî kêmhejmar e. Bi ser de jî tu feydeya ciwanbûna elîtan li vê rewşê nebû: Kadroyên nû ku li derveyî welêt dişuxilin kêm caran ji du salan bêhtir wezîfedar dimînin. Ev yek jî alîkarîyê nade ku ew ciwan çandên din baştir nas bikin. Wisa tê fikirin ku nifşa nû ji ya berê kêmtir navneteweyî ye. Bi vî rengî li Fransayê kêmtir birêveberên şirketên mezin li derveyî welêt dişuxilin: Tevî ku ji çaran yek ji serokên birêveberên giştî (ji wan re PDG tê gotin) yên kevin xwedî tecrubeyeke li welatekî xerîb in, di nifşa nû de bi tenê ji dehan yek bi qasî wan bi tecrube ye.

Pêşve gavavetineke gelekî nisbî

Wextê mirov li CVya wan binêre, xuya dibe ku tabloyeke kevneperest xwe bi israr dubare dike û mirov sedema şaxberdana kadroyan li welatê xwe baştir fêm dike. Dilsozên li şirketa xwe man, yek ji rewşa herî belav e. Li Japonyayê ji dehan neh ser-birêveberên giştî (PDG) tevahîya karîyera xwe li şirketa ku birêvedibin derbas kirine. Li Almanya, Îtalya û li Spanyayê nêzî nivê patronên mezin piştî ku di eynî şirketê de gav bi gav bilind bûn, desthilatdarîya şirketê bi dest xistine.

Heke li Fransayê û li Çînê rewş guhertî be jî, sedema wê taybetîyeke çandî ye ku li gor wê divê endamên elîtê pêşî dîplomayên xwe di warê memurîyê de bi kar bînin –di nav dewletê de yan jî di birêveberîya dewletê de– û piştre di birêveberîya şirketekê de cîhekî ku kar tîne peyde bikin. Li Spanyayê jî wisa dikin, ji çar ser-birêveberên giştî yek bi vî rengî hatiye deshilatdarîya şirketê, lê belê di tu şirketa din a cihanê de cîhê wî nîne, yan jî hejmara yên ku dikarin birêveberîya şirketeke din peyde bikin pir kêm e (di navbera % 0 û % 6ê de). Peydekirina karên birêveberîyê ya sîstema aborî gelekî girêdayî şikla elîta herêmî û girêdayî afirandin û perwerdekirina elîtan e, di heman demê jî girêdayî wê rolê ne ku dewlet di vê yekê de dilîze. Weke nimûne Fransa û Inglistanê cîhekî pêşdetir vediqetînin ji bo hin saziyên binavûdeng û di vî warî de wekhev in: Dibistana Neteweyî ya Îdarî (DNÎ) û Dibistana Polyteknîk li Fransayê; Eton, Oxford û Cambridge li Inglîstanê. Di vî warî de ew her dû ji cîranên xwe cuda ne, li Almanya, Spanya û Îtalyayê sazîyên bi vî rengî tunene. Lê Fransa û Ingilîstan li ser mijareke girîng gelekî ji hev cuda ne: Li Fransayê cîhguhertina ji sektora dewletê ber bi sektora taybet ve pir caran pêk tê, lê li Ingilîstanê tiştekî bi vî rengî hema bêje tu cara çênabe. Cudatîyên bi vî rengî di warê perwerdekirin, peydekirin û piştgirtina ferdekî de bê guman astengeke mezin pêk tînin li hember navneteweyîkirina elîtan. (6) Bi ser de jî dîplomayeke li welatekî peydekirî, li derveyî sînorên welatê xwe tevahîya prestîja xwe ji dest dide.

Qedandina Dibistana Neteweyî ya Îdarî li Fransayê li gor Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê rê li ber bêhtir îmkanan vedike, bi vî rengî mastereke li zanîngeha Todai bidestxistî li Tokyoyê xwedî bêhtir prestîjê ye li gor li Parîsê. Prestîja dîplomayên Oxford, yan jî Cambridge jî kêm dibin. Heta bi dîplomayên zanîngehên mezin ên amerîkî ku pir kes wan dixwazin jî li Ewropa û Asyayê bi rolekî piçûk radibin. Kêm cîhguhertina patronên mezin xwe li cîhneguhertina kesên ku bi karên piçuktir mijul in zêde dike. Rewşa Almanyayê di vî warî pir tiştan rave dike. Di nav çarsed serokên konseyên îdarî û çavdêrîyê yên dused şirketên herî mezin ên Almanyayê de bi tenê bîst û neh bîyanî hene, yanî ji %7. Ji bo wan jî, mirov nikare bibêje ku guhertineke mezin a çandî çêbûye, lewre ji sisiyan diduyên wan xelkê Awusturya, Swîsre, Danîmarka û Holandayê ne. Heke mirov di hîyerarşîya şirketên mezin de qatekî bi jêr ve dakeve, wê bibîne ku bi tenê di navbera % 1 û % 6ê de bîyanî di birêveberîya şirketên alman de cih digirin. Nîvê wan jî Swîsrî û Awusturyayî ne. (7)

Divê mirov lê mikur were: "Çîna global" bi maneya teorîsyenên, yanî weke arîstokrasîyeke bê netewe ku cîh diguhere û dinyayê di nav çûn û hatinê de ji hundirê balefirê bi rê ve dibin, tuneye. Bi tenê bi saya endamên bîyanî, ku ji xwe cihê xwe guhertine, yên konseyên çavederîyê tevneke navneteweyî pêk tîne ku heqê wê ye navekî bi vî rengî lê were kirin. Lê belê tu têsîra ve tevnê li ser ser-bireveberên giştî û kadroyên birêveberîyê nîne ku şax berdane, li welatê şirketên wan lê bicîhbûyî ne û karîyera xwe li gor stratejîyên herêmî temam dikin. Mecbûrîyeta cîhguhertin û "vekirîbûna li cîhanê" bi tenê ji bo karkerên wan rewa ye, ne ji bo wan bixwe. Bi ser de jî, tevnên endamên bîyanî yên konseyên çavderîyê hema bêje bi tenê têkilîyên ku Ewropaya anglo-sakson bi Amerîkaya Bakur ve girêdidin, dideynin. Welatên din yê Ewropayê, Japonya, Koreya Başur, herweha Çîn, Brezîliya û Rûsya cihekî pir bêmane/pir biçûk tê de digirin. Berevajî bi giştî tê bawer kirin, ji nû ve eyarkirina dengeya aborîya cîhanî ku bi kêrî hêzên nû bipêşxistî tê û guhertinên mezin di encama wê de pêk tên, astengîyeke din e ku xwe lê zêde dike li hemberî pêkanîna "çîneke global", lewra birêveberên van şirketan berî hertiştî li xurtkirina helwêsta xwe ya li welatê xwe difikirin.

Ev gotar xwe dispêre lêkolîneke li ser karîyerên birêveberên payebilind ên şirketan (serokê konseya îdarî, serbirêveberên giştî (PDG), serok, û hwd.) li nav pênc mezintirîn hêzên aborî yên Ewropayê (Almanya, Spanya, Fransa, Îtalya û Ingilîstan) û li nav sê welatên herî dewlemend ên li derveyî Ewropayê (Çîn, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Japonya) – cografyayeke ku di nav pêncsed şirketên herî mezin ên cihanê de ji çaran sisiyê wan pêk tîne. Mirov dikare encamên vê lêkolînê bi hejmar û bi hurgilî di "Internationalisation et spécificités nationales des élites économique" bixwîne. (Navneteweyîbûn û taybetîya neteweyî ya elîtên aborî), Actes de la recherche en sciences sociales, hejmar 190, Parîs, kanûna 2011ê.

Li vir jî dewlet bi roleke dîyarker radibe ku di tevahîya pêvajoyên pîşesazîbûnê de heye: Afirandina elîtên herêmî û afirandina şert û mercên ku bi kêrî bipêşketina wan tên. Bi tenê yek alîyê baş ê slogana "elîtên kozmopolît, gelê herêmî" (8) heye, ew jî dilxweşkirina karsazan e.

* Li Zanîngeha Darmstadtê sosyolog e.

(1) Ralf Dahrendorf, "Die Derivatisierung der Welt und ihre Folgen / Derîvatîzekirina dinyayê û encamên wê", *Leviathan,* hejmar 37, Düsseldorf, 2009.
(2) *Bigire li ber* Leslie Sklair, *The Transnational Capitalist Class (Çîna kapîtalîst a navneteweyî),* Blackwell, Oxford, 2001, yan jî William K. Carroll, "Transnationalists and national networkers in the global corporate elite" ("Transnasyonalîst û karkerên neteweyî di nav elîta global a şirketan de") , *Global Networks,* berg 9, hejmar 3, Malden, 2009.
(3) "La surclasse" ("Ji çînê jortir »), *Le Monde,* 7ê adara 1996ê. Ev konsept bi tenê dubarekirina konsepta *overclass* e ku par bi şiklê rexnekirinekê ji alîyê Michael Lind ê amerîkî ve hat bi kar anîn.
(4) David Rothkopf, *Superclass :The Global Power Elite and theWorld TheyAreMaking (Çîna Super: Elîta hêza global û cîhana ku ew çêdikin),* Farrar, Straus û Giroux, NewYork, 2009.
(5) "UK's Cameron Britain will 'roll out red carpet' for French businesses if govt taxes them more" ("Cameron ê Meliktîya Yekbûyî: Eger hukûmet bêhtir bacê ji wan bistîne Brîtanya wê li pêş şirketên fransî "xalîçeya sor raxe". *TheWashington Post,* 19ê hezîrana 2012ê.
(6) Bigire li ber *The Sociology of Elites (Sosyolojîya elîtan),* Routledge, London,2006, û *Eliten und Macht in Europa : Ein internationaler Vergleich / Elît û desthilatdarî li Ewropayê: Liberhevgirtineke navneteweyî,* Campus, Frankfurt, 2007.
(7) Markus Pohlmann, "Globale ökonomische Eliten? Eine Globalisierungsthese auf dem Prüfstand der Empirie /Elîtên global ên aborî? Tezeke globalbûnê ketiye ber lêkolîna empîrîk", *Kölner Zeitschrift für Soziologie und Sozial-psychologie,* hejmar 61, Köln, 2009.
(8)Manuel Castells, *The Rise of the Network Society.The Information Age : Economy, Society, and Culture (Bipêşketina civaka tevnê. Serdema agahîyê: Civak, aborî û çand),* Wiley-Blackwell, Cambridge, 2009 (çapa yekem: 1996).

Wergera ji fransî: Feryal Guladawîya

Di navbera piştgirîya şerê Iraqê û qanûnîkirina narkotîkan de, di navbera cezakirina Wikileaks û ya “Leviathana dewletê” de, di navbera pîrozkirina lîberalîzmê û banga alîkariya ji bo bankeyan de çi xalên hevpar hene? Weşanekê ev helwest hemû parast in: “The Economist”. Ev weşan her hefte neynikeke pesindayînê li pêşiya çînên serwer digire.

JI SALA 1843YÊ VE HEFTANEYEKE BRÎTANÎK PÊŞENGA ŞERÊ JI BO PEVGUHERÎNA SERBEST E

“The Economist”, rojnameya herî bi bandor a dinyayê

ALEXANDER ZEVIN *

Dema ku firotina rojnameyan li ser dezgehan, mehaneyên abonetîyê û hatinên ji reklaman bi hev re kêm bûn, rojnamevanîya çapkirî kete nav pêvajoyeke krîzê ya ku tevgera ber bi tevna Înternetê ve û karên wê cezbkar xuya dikin, divê êdî vê krîzê sivik bikin. Û ji bilî vê *The Economist* heye. Tevî ku ew jî ji ber kêmfirotina li ser dezgehan mexdûr e, serketina demdirêj a *The Economist*ê nexasim jî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê cihê ku piranîya xwendevanên wê niha lê dimînin, bixwe veguherî serhatîyeke çapemenîyê ya daîmî. Sala 2006ê dema kevne-edîtor Bill Emmott ji NPRê [Radyoya Neteweyî ya Dewletê] veqetîya û bi sergêjî pirsî ka çawa kovareke “sernavê wê xewa mirovan tîne”, û “carinan naveroka ezoterîk [bi tenê xîtabî komekê dike] e” dikarî di nav sala 2005ê – mirov bi tenê dikare bi rojnameyên rengîn ên bûlvarê yên mîna US Weekly û Starê re li ber hev bigire – de hejmara xwendevanên xwe zêde bike. Sala 2010ê hejmara tîraja wê –li seranserê cîhanê 1.42 milyon, ji van 820.000 jê xwendevanên li DYAyê ne, vê hejmarê ji sala 1982yê ve deh caran li xwe zêde kiriye– bû sedema dewreke nû ya muameleyên heyranmayînê.

*The New York Times*ê berîya demeke kurt serketina *The Economist*ê tevî buhayê wê yê li gor rojnameyên din ên nûçeyan zêde bilind, bi bazar û firotina wê ya aqilane ve girêda. Li gor *The New York Times*ê logoya wê ya beloq sor a ku li ser foneke spî bi kar tîne, xîtabî hisên neewlebûnê yên wan xwendevanan dike ku ji bo başkirina rewşa xwe têdikoşin, û *The Economist* ji bo wan kesên îhtîmal heye dewlemend bibin nîşaneke statuyê ye. (1) Reklameke sala 1988ê weha bû: “Min qet *The Economist* nexwend, Şagirdê Birêveberîyê. 42 salî”. Reklameke din a sala 2007ê di bin re derba xwe datîne “li herî jor mirov bi tenê ye; lê belê qet nebe tiştekî mirov bixwîne heye.” Ev nirxandin hinekî deyndarê James Fallows e yê ku gotara wî ya sala 1991ê der heqê rojnameyê de nivîsî, mînakeke kêmdîtî ya çapemenîya dijber e. Wî fikra xwe zexim dikir û digot, *The Economist* derî bi derî digere û zanetîya klasîk difiroşe pîşesazên amerîkî yên ku bi qasî ku cudatîyê ji hev dernexin sewdaser bûne bi aksana wê ya brîtanî û bi “fors û difreya wê ya bi şêwazê Oxbridgeê [pevheliyana navên Oxford û Cambridgeê]”. (2)

Tevî vê yekê dema behsa çîna civakî kir, wê xwe nêzîktirî armanca xwe kir. Li gor daneyên wê bixwe xwendevanên *The Economist*ê ji niha ve di nav yên herî ewle yên dinyayê de ne: Ew ne ku bi tenê berxwurên herî dewlemend ên çapemenîya perîyodîk in li DYAyê (dahata navînî ya malbatan 166.626 $, li hemberî 156.162 $ ji bo malbatên xwendevanên *Wall Street Journal*ê) û li dinyayê (“ku ji her sê xwendevanan yek mîlyoner e”), lê belê ew her weha ji kirîna tiştan re jî bi giştî muthîş in (sala 2007ê malpera rojnameyê pesnê xwe pê da ku ji sedî 4.7ê xwendevanên wê kêfxweş in 3.000 $ bi saetekê bidin, û di heman demê de bêhtirî ji sedî 20ê xwendevanên wê li xwe mikur hatin ku “mahzeneke wan a şerabên rezan” heye). Rojname objeyeke statuyê ya bi bangeke girseyî ye; lîderên dinyaya azad, miqnatêsên karî, xwendekarên sinifa yekê ya zanîngehê û dîyar e herweha Sarah Palin (xwedawenda zayînê ya Tea Party) jî wê dixwînin û heyranên wê ne.

Fabrîkevanekî kuman ew damezirand

Herçiqasî *Columbia Journalism Review* bi lez bû muxalif (wê bersiv da, û got, nivîsa *The Economist*ê baş e û mijarên li ser bipêşketinên li seranserê dinyayê hildibijêre, nekirina reklamê û mijarên zehmet ên welatên xerîb nirxên wê yên bi rastî ne), ya rastî ew e, rexnegirîya li *The Economist*ê û pesndayîna wê hewl didin bi zarê wê bikin, para bêhtir berê xwe didin stîla wê ya gubertî da ku bikaribin dagîrkirina wê ya peravên amerîkî rave bikin. Ya ku vê reş û tarî dike jî ew e, ku jê tê di demên zehmet ên aborî de jî mezin bibe, bi vê pesnê wê tê dayîn, ev mijareke ji serfirazîya rojnamevanî wêdetir e: Ji bo rojnameyeke xwe dûr digire ji desttêwerdana dewletê û hevalbendê zanetîya bazarê ye, maneya vê yekê qebûlkirin û palpiştîya siyaseta edîtoryal e. Ji ber vê yekê çapemenîyê bi giştî xwe terîfkirina *The Economist*ê weke parêzera mentiqekî-giştî yê “navendparêzîya tundraw” piştrast kir. Weke palpiştîyeke hê nû, Partîya Muhafezekar a Brîtanî bi awayekî rehet weha dibêje “dilsozîya ji berê de ya *The Economist*ê bi tu partîyê re nîne, lê belê pêşhukmekî wê yê xwegirtî yê hevalbendîya lîberalîzmê heye” – nîşana dilsozîyeke bi rojnameyekê re ku dema hatî damezrandin sala 1843yê Brîtanya hê jî yekane hêza endustrîyel bû li dinyayê.

Hilberînerê kuman James Wilson ji bo li ber Corn Lawsê rabe *The Economist* damezrand. Girêdana wê ya bi bazirganîya serbest re timî nêzî wê astê bû ku bêhnê li mirovan biçikîne. Faîzên karsazîyê yên Manchesterê yên li gor buhayên berhemên çandinîyê dîyarkirî, û Parlemanê piştî xitimîna buhayê dexil sala 1815ê ferz kir, sala 1830ê du caran bêhtir zirarker in: Wan got, mesrefên jîyana rojane mûçeyan bilind digirin û pêşî li îxracatan tê girtin, lewra yekane rêya ku dinya mayî berhemên fabrîkeyên brîtanî bikire ew e ku berhemên xwe yên cotgehan bifiroşin Brîtanyayê. Ev qanûn sala 1846ê hat betal kirin. Edîtorê wê yê duyem Walter Bagehot ji bo safîkirin û berfirehkirina rojnameya Wilson xwedî bandor bû, wî cîlayeke ciwanmêrîyê li ser navdarîyeke xweş heqê wî ya serhişkîyê, dikir. Navê wî li quncika li ser siyasetên brîtanî hatiye kirin, lê belê hebûna wî ji merasîmîbûnê û wêdetir e: Banga Bagehot a ji bo serxwebûna Bankeya Ingilîstanê qêrîneke yekser bû heta ku sala 1997ê bû qanûn. Ev xisleta dezgehî ya yekane qismî bi avahîyeke xwedîbûnê ya dabeşkirî parastî ye.

Dayik-şirketa *Financial Times*ê Pearson bi tenê nîvê hîseyan kontrol dike, di heman demê de birêveber di dawîyê de berpirsîyar e li hemberî xwedî hîseyan bêyî ku berjewendîyeke wî ya malî hebe. Di 169 salan de bi tenê 16 zilam bûn seredîtor. Hema hema temenê hemûyan di bin 40 salan de, ji salên 1900ê ve bi awayekî giştî di Oxbridgeê re derbas bûne. Sedemeke din a hevdengîya wê ji bo xwendevanan hemûyan dîyar e: Gotarên wê bê îmze tên weşandin. Gotarên nivîskarên mêvan û gotara dawîyê ya nivîskarekî vediqete îstîsna ne, qederê heftê rojnamevanan (nêzî pênciyan li buroyên wê yên li Londonê ne) bi awayekî anonîm dixebitin. Serketina blogên wê bêyî ku bibe alternatîfeke bi rastî, ev şiklê şuxilandina veşartî ya rojnamevanîyê guhert. Redaktorê heyî John Micklethwait li ser navê tevahîya komê ku pêre dişuxile rave dike ku pêvajoya redaktekirinê bi awayekî nedîtî demokratîk e. (3) Bes e ku mirov heta bi cihê rojname lê tê amade kirin bimeşe da ku hin tiştên eleqedarî wê fêr bibe –cihê wê ji Square Mile yan ji Fleet Street dûr e, li Saint Jamesê ye– devereke luks ku mirov dikare li bendê be xwendevanên rojnamê lê wextê xwe yê betal di holikeke şexsî de derbas bikin, şerab, cixare yan jî berhemekî hunerê modern bikirin, nîşana xwe li ser gopalê xwe bidin nivisîn, yan jî çaketê xwe bidin dirûtin.

Avahîya navenda *The Economist*ê ku bi awayê New Brutalîst hatiye ava kirin, li derdoreke bi vî rengî ji bo ciwanmêrên bajarî hatiye çêkirin. Ji dema hat saz kirin, di sala 1964ê de, şiklê avahîyê bi awayekî nazik mirovan aciz dike. Her dû mîmarên ku lê şuxilîn, wê weke “avahîyeke dîdaktîk, avahîyeke zuwa” terîf dikin. Mirov nizane çawa dibe, lê her sê bircên avahîyê ku bilindîya wan ne wek hev e, ku bi kevir û camên Portmouth hatine xemilandin hem bedewîya derdorê bi serfirazî der dixin pêş hem jî wê rexne dikin. Di hundirê avahîyê de labîrenteke ji odeyên teng personelê rojnameyê dihewîne. Personel di civînên duşemê de li odeya redaktorê runîştî, tewîyayî, yan jî xwe dutew kiriye. Rêveberên her beşekê amade ne, henekên ji hedê xwe zêde tên kirin û bergê hejmarê bê dudilî tê dîyar kirin. Roja ez çûm serdana rojnameyê, çil rojnamevan lê hebûn, diçûn û dihatin. Ji sisê paran yek jin bû û ji çar paran temenê parekê hê negihiştibû sîh salan. Heneka ku dibêje *The Economist* ji alîyê ciwanên bi tedbîr ên bîst salî ve bi awayekî anonîm tê weşandin ne rast e; piranîya personel di sîh çil salîya xwe de, navsere bûn. Li gor Gideon Rachman, redaktorê ku ev 15 sal in vî karî dike ku niha quncik nivîskarê rojnameya *Financial Times*ê ye, ev pêşketineke nisbî nû ye. Di destpêka salên 1990ê de, her rojnamevanê ciwan *The Economist* weke navgînekê didît da ku li kolana pir navdar ya Fleet Street [kolana ku rojnameyên herî navdar yê Inglîstan lê ne] bixebite. Lê niha rewş guhertî ye, karkirina di *The Economist*ê de êdî ewletir e û meaşên wê bilindtir in. Berevajîyê rewşa berê, mirov dikevin dorê da ku karibin karekî demdirêj lê peyde bikin”. Di encama vê yekê de emrê personel bilindtir e lê belê piranî di heman temenî de ne. Li gor Rachman “kêmbûna pirrengîyê feydeyeke bi rastî ye” lewra ew hêsan dike dengekî kolektîf û fikreke bi îstîqrar dewamî bibe.

Xwegirtin û demdirêjî hem hêz in hem jî lawazî ne, di bersiva ku *The Economist* li hember krîza sala 2008ê destpêkirî da, her du jî ceribandin. Li alîyekî din jî rojname li dijî hin şiklên hîsterîyê derman kiriye. Weke nimûne, dema Hank Paulson ji bo ku rojnameya wî ya bi navê Wall Street nepetixe ji bo bidestxistina fonan kire lavelav, *The Economist* jixwe razî şîret kirin û li ser mijara bidawîanîna krîza sektora avahîsazîyê peşnîyaz kirin. Wê herwiha li ser mijarên sekinandina kredîyên şexsî û pereranzandinan, bilindbûna rêjeya bêkarî û li ser mijara bazara ferzkirî û her diçe bêîstiqrartir dibe jî pêşnîyazên xwe parve kirin. Xisleta wê ya êş û westa cîhanê jê re kartvîzîteke timetê bû: Ev hemû berê hatibûn serê wê. Di dema sedsala xwe ya pêşî de, rojnameyê şahidîya krîzên kapîtalîzmê yên mezin kirin (ji 1873ê heta 1986ê, di salên 1930ê de), êrişên li ser rêyên hesinî (1873), panîka bankeyan (1907), hilweşîna borsayê (1929) û têrnekirina/qutbûna pereyên germ (1931) – eger em bi tenê behsa pirsgirêken aborî bikin. Sedsala wê ya duyem biqasî ya yekem bi serpêhatîyan buhurî, dawîlêanîna sîstema rêjeya sabit a pevguherînê ya Breton Woods, krîzên petrolê, pêsîrtengîyên herêmî yên girêdayî zêde hêdî bi pêş ketina giştî ji destpêka salên 1970yê û vir ve. Herçiqasî pêşnîyazên rojnameyê yên dibêjin ka mirov divê çawa di dema krîzên aborî de tevbigere, bi awayekî zêde bixwebawer hatibin kirin jî, ew dîsa jî ne aşkere bûn yan jî ne xwegirtî bûn.

Rastîya pêşî dîyar e ku ya jirêzêbûn û ne lîberalbûna helwêsta *The Economist*ê ye. Tevî ku hin rexnekirinên jirêderketinên etîk wê li hember petaxa bankeyan li çepikan da. “Wexta li alîyekî hiştina dogma û tedbîrên siyasî ye da ku mirov bikaribin li ser bersivên pragmatîk konsantre bibin. Ev tê wê maneyê ku di demeke kin de divê mudaxaleyên hukûmetê ji yê ku kesên bacê didin, ku siyasetvan û rojmeyên bazara serbest li bendê ne bêhtir bibin.” Dibe ku dengdar nerazîbûna xwe ji xisarkirina bi sedan mîlyaran ji bo meaşên birêveberên serhişk nîşan bidin, lê belê tiştê ku hukûmetan kir a baş bû; felaketeke mezin li pêşîya welatîyên wan bû, weke petaxên bankeyan û ketina dorê ya gel ji bo gezek nan mîna di salên 1930ê de, hukûmetê ew parastin. Rojnameyê di çirîya pêşîn a sala 2008ê de wisa dinivîsî “ne tu welat yan jî endustrî wê bikaribê ji tiştekî weke sekinîneke-dilê aborîyê xwe biparêze” (11ê çirîya pêşîn a 2008ê).

Di meha çileyê de mirov hîs dikir ku hin tişt ji hedê xwe zêde bihurîbûn –xwestina bi yekcar dewletkirina bankeyan wê zirar li “heqê mulkîyetê” bikira, wê piştigirtîya hevgirtina siyasî bikira, wê gelek xisar bikira û dawî li şirketên şexsî bianîya (24ê çileya 2009ê). Peşniyazên ku rojnameyê dikirin bixwe ne dîyar bûn û diguherîn. Pêdivî bi zêdetir koordînasîyonê hebû, nexasim di nav herêma euroyê de, da ku bankeyan rizgar bikin û rê li ber belavbûna krîzên deynê dewletê bigirin. Le belê li her welatî yeko yeko, biryara pêşîgirtina li wan kesên ji wan re hişyarker tê gotin, yên ku bûn sedema rexnekirina garantîya deynê dewletê, hatibû dayîn (9ê kanûna 2010ê). Rojnameya *The Economist* peşnîyazeke bi tenê ya bi rastî kir, ew jî (ji xeynî peşnîyaza ji nû ve xurtkirina dîsîplîna bacstandin û kêmkirina meaşan li qadên ku mumkun e) misogerkirina deynên euro yên hevpar da ku qadeke nû ya deynan were afirandin bû – ev fikir jî ji Bruegel hatiye dizîn, Bruegel *think-tank*ek e ku li Brukselê bi cih bûye (16ê kanûna 2011ê). Ango rojname gelekî dûr e ji wê wêrekîya xwe ya ku reklama wê dikir.

Meymûneke kal a ku piştî tevahiya qeşmerîyan karê xwe radiwestand

Heke şert û mercên siyasî ji bo başbûna aborî hê ji mêj ve havînî bi awayekî zelal hatibin îfade kirin jî *The Economist* zehmetîyên mezintir dikişîne di ravekirina sedemên krîzê de. Dema ku bankeya Northern Rock petixî sala 2007ê encama ew gihiştiye weha bû “ya divê were gunehbarkirin ne sîstem e, lê belê ew mirov in ku sîstemê bi rê ve dibin” (20ê tîrmeha 2010ê). Li Ewropayê rojnameyê ji ber bertîlxwurîyê lanet li Berlusconi barand, Sarkozy bêqîmet kir ji ber ku reform bi ser nexistin, û bi giştî mohra xwîntalîya şarezayîyê ya Angela Merkel erê kir. Dema ku radihêje xitimîna qanûnçêkerîyê li Washingtonê ew ji xwendekarên xwe dixwaze ku “ji sîstemê bêhtir Barack Obama gunehbar bikin” (18ê sibata 2010ê). Belavbûna krîza deynê dewletê di destpêka 2010ê de kir ku ew ji nû ve berê xwe bide Merkelê

û wê ji nû ve binirxîne, lê belê wê YE, yan jî kêmbûna rewabûna wê ya demokratîk nexist ber lêpirsînê (10ê adara 2011ê).

Çirîya pêşî ya 2008ê bi carekê wê ragihand "kapîtalîzm sîstema herî baş e ya ku benî adem heta îro vedîtiye. Lê belê demdirêj pir tişt girêdayî ne ka wê gunehbarîya ji bo vê felaketê çawa were dabeşkirin. Cihê ku şerekî girîng ê întelektuel dikare û divê were biserxistin, ev dever e." Armanca wê ne lêkolîn û lêpirsîn e, lê belê vemaliştina zend û bendan e ji bo bergirîya sîstemê û rêya wê ya berîya krîzê: buhayên kêmtir, bêhtir taybetîkirin, bêhtir piçûkkirina sektorên dewletê. Çileyê 2012ê derêgulasyona malî jî dîsa dihat nîqaşkirin, bergê wê London Blitz derdixist pêş di bin manşeta "Bajêr Rizgar Bikin" (7ê çileya 2012ê).

Mirov timî bi xwendina *The Economist*ê hin tiştan fêr dibe. Li gor xelefê wî yê edîtor Walter Bagehot, dildarîya herî mezin a Wilson rojnameyek bû ku cih dida bûyer, dane û tabloyên zelal û rast da ku alîkarîyê bi karsazan û wezîran re bike ji bo ku bi têr agahdarî bigihêjin biryaran. Lîsteya wê ya buhayê firotina bi tomarî ya pêşî bû ku dihat weşandin, û ew hê jî gelek rûpelan ji nîşanên sereke yên aborî û malî re vediqetîne, pê re jî ji hin rêzên agahîyan ên ku diguherin: Danader a gazên bandora serayê çêdikin, pêşdîtinên mezinbûna Hilberîna Hundir a Nesafî, mîqdarên hewaleyên pereyan ên global, yan jî bi navê niha navdar "Big Mac index". Kevne-edîtorê Newsweekê Jon Meacham bi tenê qismî mafdar bû dema ku ji ber ku analîzê li peş nûçegihandinê digirin wî rexne li edîtorên *The Economist*ê girtin. Wê pir kêm caran manşet dane yan jî rojnamevanîya lêkolîner kiriye; hêza wê timî ew bû ku hejmarên berdest yên herî baş radigihandin.

Di heman demê de belavbûna *The Economist*ê bi awayekî bêmînak fereh e. Heftaneyên din bi çi dikarin mirovî bi hejmareke bi tenê pêrgî gotarên li ser bazirganîya li ser Înternetê ya li Çînê, bermahîyên malî yên li Las Vegasê, hevdîtinên ji bo aştîyê yên li Rojhilatê Navîn, gera li jîyanê ya li Marsê, muzeyeke nû ya huner li Qetarê û nivîsa li ser mirina kaşifekî ji Başûrê Efrîkayê yê tarî yê ku tîmsahan ew xwarî bikin û wî sergêjî bikin? Hewasên *The Economist*ê timî ansîklopedîk bûn, çawa ku navê wê yê tam ê ku wê sala 1845ê demeke kurt ji bo ku ji boom a rêyên hesinî sûdê wergire li xwe kir jî piştrast dike: '*The Economist*, Weekly Commercial Times, Bankers' Gazette, & Railway Monitor. A Political, Literary, and General Newspaper.'Ji bo demeke dirêj a dîroka wê ev sernivîs hema hema biqasî rojnameyê bi xwe dirêj bû –di salên 1920ê de hejmara rûpelên wê gihişte bi tenê 50yê, salên 1940ê kêmbûna kaxetê hejmara rûpelan daxiste duzîneyekê. Îro bixwe hejmara rûpelên hejmareke asayî ji sedan dibihure. Dîtina wê weke ansîklopedîyekê fireh û rengîn be jî jêhatîbûna wê ya bi kûrahî rahiştina her mijara taybet, kêm e: Ji bilî îstîsnaya qismî ya kontrol û anketên wê yên taybet, gotarên wê kurt in.

Kêmasîyên *The Economist*ê ji hejmara peyvên wê bêhtir ji çandeke ku tevde pir zêde ji xwe razî ye –jê nayê yan jî naxwaze bi rexnegirên xwe re ji dil muamele bike. Paul Krugman ne ew kes e ku fanatîkekî li dijî hukmê şexs be, lê belê heta ew jî carinan bû mijara rexnekirinên bi hêrs ên *The Economist*ê. Rojnameyê ev peyv ji bo wî bi kar anîn "keynesîyenekî besît", "partîzanekî bêrehm", "qehremanê xeyalî yê gel ê çepgirên amerîkî", "Michael Mooreê kesekî difikire" (13ê çirîya paşîn a 2003yê). Dema li ber protestoya dijberî globalbûnê ya berîya dehsalekê ("bêaqil... bi tenê li xwe difikire –hewldaneke lawazkirina dinyaya radibe ser piyan bi rêya proteksîyonîzmê") digire, ew qebûl dike ku Tevgera Dagîr Bike "gilî û gazinên rewa yên di kûrahîyê de" dîde der. Lê belê ew ewqasî pê de çû ku îdîa bike, ev gilî û gazin di dawîya dawî de li dijî 'dewleta laşgiran' in û dikarin bi 'avakirina bazarên nû' werin çareser kirin (22yê çirîya pêşî ya 2007ê).

Gelek caran, muxalifî, weke karê ciwanên bêtecrûbe, piçûk tê xistin. Ev bû sedem ku ew bi berferehîya nerazîbûna li Tûnisê nehise, ew bi awayekî şaş gihiştibû wê encamê ku xwendekar û sendîkavan xuya ye wê nikaribin serokdewlet Bin Elî ji textê desthilatdarîyê bidin erdê (6ê çileya 2011ê). Ya ku yekcar kêf bi mirov re nedihişt portreyê wê yê der barê Bin Elî de bû, li gor peyvên wê yên weşandî "Bin Elî bi tawîzan ber bi girseyên aştîxwaz ve çûye" – divê mirov belkî îşaret pê bike ku tawîz heta ku 234 mirov hatin kuştin û 510 jî birîndar bûn, nehatin dayîn (26ê sibata 2011ê). *The Economist* li hemberî her kesê bêhna akademîyê jê dihat –mamoste, xwendekar, yan jî sergêjên din ên belgekirî yên xwendinê û lêkolînê – kêm bi sebir bû. Carinan rexnegirîya wê dikare fêhmbar be. Raporeke nû ya li ser bi serî ve tijîkirina xwendekarên piştî lîsansê û ji alîyê zanîngehan ve mêhtina wan; ya ev zanîngeh lê digerin kedkarên erzan, agahîya prestîjbarkirî ya giranbuha ya der barê rêjeya temamkirina zanîngehê, meyila global a nivîsandina PhDyan, dahata navînî û her wekî din e (16ê kanûna 2010ê). Bêguman çareserîya wê ne ew bû ku budceya ji xwendina bilind re tê veqetandin were zêdekirin da ku bêhtir cihê kar werin çêkirin; pêşnîyaza wê sînordarkirina hejmara PhDyan bû. Anketeke dilrehet a zanyarên di *The Economist*ê de dinivîsin quretir û ji xwe razîtir bû. Zanîngeh 'daristanek' e ku lê xwendekar li ser mijarên 'zelûl' dinivîsin, û modeyên weke jihevderxistinê [deconstruction] (ji Fransayê!) yan jî lêkolînên çandî profesoran direvînin (16ê kanûna 2004ê). Dibe ku hin akademîsyen bikin minemin, yan jî peyvên mîna 'intersemiosis [nîşanên ku bi maneyên xwe yên cihê tevneke nîşanan pêk tînin; nota wergêr]'. Hê *The Economist* ji alîyê sînordarîyên xwe yên rojnamevanîyê ve bi kelecan xuya nake. Di ragihandina hê nû ya mirina Tony Judt de bi çar gotinan çêl li fîlozof Louis Althusser tê kirin *"marksîstê dîn kujerê jina xwe"*, (4) ev bi tenê mînakek e (12ê tebaxa 2010ê)

Dibe ku *The Economist* tu cara nebûbe markaya bêqisûr a lîberalîzma aborî, civakî û siyasî, ya ku edîtorê wê yê niha John Mickletwait ji xwendevanên xwe yên amerîkî re terîfa wê dike. Di pratîkê de azadîya bazirganîyê berîya yên din hatibû, bi azadîyên civakî, nexasim ji bo zilamên ne ingilîz, wan carinan jî berdêla wê weke ceza da. Kîna wê ya li dijî mentiqê hisî yek jî xisletên wê yên cazib e, tevî ku panjehra wê bi xwe ya bazirganîya serbest timî bi tesîrtir, yan jî insanî xuya nekiribe jî. Wilson muxalifê qedexeyeke bazirganîya bi welatên koledar re bû ji ber ku ev yek wê serfkarên brîtanî û herweha koleyan jî bêşîne, ji bo nehiştina koledarîyê pir hindik tişt dikirin. Bersiva Wilson dayî xelaya Îrlandayê dîsa bazirganîya serbest bû. (5) Dema ku ev yek û herweha reforma çandinîyê bi bin ketin, rojnameyê gotarên ku îrlandî bi bênanûxwêtîyê gunehbar kirin, weşandin û doza tepisandina wan kir. Siyasetên fransî timî *The Economic* aciz kir.

Di encamê de Bagehot bi kêfxweşî nêrî li kirina Napoleonê Sêyem a desteserkirina desthilatdarîyê di sala 1851ê de ya ku bêguman ne lîberal bû, argumana wî ew bû ku xisleta neteweyî ya fransî – 'li kelecanê vekirî, geherbar, seresere, pir zêde mentiqî, ji ya xwe nayê xwarê' –kêm li gor nezaketên parlemanterîyeke li gor mestereya ingilîz e. (6)

Paranteza prularîst

169 salan pir kêm navlêkirinên hîsterîk nerm kirin: Sernivîseke nû François Hollande ê mulahim weke 'zilamekî bi tehlûke' yê ku 'xwedîyê helwesteke pir zêde li dijî bazirganîyê' îlan kir, û bi heyranîya xwe ya bi melaqî ya ji bo almanan Partîya Sosyalîst bi şaşî weke 'reformnebûyî' û meyildarê 'qutbûna' têkilîyên almano-fransî terîf kir (28ê nîsana 2012ê).

Bagehot hevalbendîya destwerdana Şerê Navxweyî yê Amerîkî nekir, belê wî bi kêfxweşî jihevdeketina Yekîtîyê sala 1861weke rastîyeke qewimî didît, wî red dikir ku koledarî di şerî de xwedî rolekê ye. Wî li paşerojekê dinêrî ku têde du welatên kêmtir êrîşkar, kêmtir qure, û asabî hene – maneya vê ji bo Lancashireê buhayên erzantir ên tayên pembû bû. (7) Tevî vê yekê û lekeyên din ên li ser amentuya wê ya lîberal jî, *The Economist* a sedsala 19ê li ser sê rêyên sereke her hebû: Reformên civakî yên pir zêde gav bi gav wê pêk werin da ku pêşîyê li şoreşên mîna yên sala 1848ê bigire, yên ku parzemîn talan kirin, bazirganîya serbest û aştîya parzemînî.

Ji Şerê Cîhanê yê Duyemîn û vir ve herî kêm du bûyerên mezin qewimîn. Ya pêşî bi tona siyasî ye û cewherê întelektuel e. Salên 1940ê tîraja rojnameyê nîşana qebûlkirina wê ya dewleta refahê bû, mikurhatina li wê yekê ye ku mohra lîberalîzmê ya Wilson xwedî şaşîyên bi rastî ye. Di bergeke ceribandinan de ku sala 1943yê bi rasthatina sedemîn salvegera damezrandina wê, Geoffrey Crowther ê hingê edîtor, noteke li hevhêner jî nivîsî: Laissez-faire [maneya wê *bihêlin bila bike* ye, di aborîya kapîtalîst de nehiştina desttêwerdana dewletê terîf dike; nota wergêr] newekhevî û neewlebûn bi xwe re anî ku îro bi tenê desttêwerdana dewletê dikare wê sererast bike. Heke *The Economist*ê bi sosyalîstan re li hev nedikir, tiştê li ser li hev nedikir *"ne armanc bû, belê bi tenê rêbazên ku wan ji bo gihiştina vê armancê pêşnîyaz dikirin, bûn."* (8)

Di bin birêveberîya Crowther û paşê Tyerman de *The Economist*ê şêwazên xwe yên herî berfereh ên jêhatîyan û nêrînan civandin. Di nav gelek akademîsyen û nivîskarên penaberên ji Ewropaya nazîyan dagîrkirî revîyan, hebûn – yê herî zêde lê nedihat û herweha yê herî manedar Isaac Deutscher ê ku dîrokzanê marksîst bû, wî li ser Ewropaya Navendî û Yekîtîya Sovyetan berhem nivîsandibûn, û Daniel Singer nûçegihanê ji Fransayê. Hilberîna îdeolojîk bi giştî bêrawestan ji salên 1960ê ve ber bi rastê ve şemitî. Îro kesên piştî şerî hatin bi cîh kirin weke bendeke li pêşîya mezinbûna aborî tên dîtin, alîgir û parazvanên wan yên mayî divê ji holê werin rakirin. Sendîka bi taybetî hedef in. Sala 2011ê *The Economist*ê îdîa dikir ku şidandina qutkirina ji pereyên teqawidbûnê, û zêdekirina temenê teqawidbûna mûçegirên dewletê wê têra lihevderxistina budceyê neke – di "şerê [sic] bi sendîkayên sektora dewletê re" de beranîn bi ser dikeve û peymanên kar ên demkurt û nerm jî divê werin ferz kirin (6ê çileya 2011ê). Berîya bi pêncîh salan ne bi tenê xwedîbûna hîsekî bi vî rengî , lê belê bilêvkirina wê jî wê mumkin nebûya mirov lê bifikirîya.

Di kesayeta rojnameyê de guherîna herî cidî di qada karên derve de bû. Di sedsala 19ê û destpêka sedsala 20ê de wê destek da împeretorîyê weke pererazandineke aqilane, lê belê kêm caran şoven bû. Împeryalîstên mîna Rhodes yan jî Chamberlain bi awayekî rûtîn weke hebakerên bêexlaq rastî êrişan dihatin. Di navbera 1919ê û 1939ê de wê bi kelecan û dildarî destek dida xurtkirina Lîga Neteweyan bi tevlîbûna Almanya, Rûsya û DYAyê. (9) Ev yek bi awayekî pir zêde di serdema piştî şer de guherî. Muxalefeta wê ya li dijî dagîrkerîya Misrê bi destê Ingilîstan û Fransayê ji ber kanala Suêzê di sala 1956ê de ji bo wê werçerxek bû – elaqeya wê bi jîrtîya tevlîhevîya împeryal re kêm e, bêhtir elaqedarî nîşana hurmeta nû ya ji DYAyê re ye. (10)

Ev sedaqet di siyaseta derve de ji hingê ve rê nîşanî wê dide. Encam çerxkirineke şervan a bi carekê ye ku mirovan matmayî dihêle. Ji Vîyetnamê û vir ve, di şerê Kendavê de, di yê Balkanan de, di dagîrkirina li Afganistan û Iraqê de edîtorên wê di her pirsgirêka mezin de pişta DYAyê girt. Wê şandina eskeran a Afganistanê ya ku Obama kirî û girêdana wî ya her zêde dibe ya bi êrişên balefirên bêpîlot li Pakistanê, bi kêfxweşî pêşwazî kir. Li ser mijara Koreya Bakur û Îranê, ew xeta tundraw li hişk tercîh dike, NY bixwe bi awayekî rûtîn weke bêkêr û burokratîk tê gunehbar kirin.

Rêjeya tîraja li Amerîkaya Latîn hîç hev nedigirt, nexasim li Arjantîn, Brezîlya, Bolîvya û niha jî Nîkaraguwayê, yên ku çepgir li wan desthilatdar in. Venezuela bi serê xwe mijarek e. Tevî ku Hugo Chavez ji çardeh hilbijartinan di sêzdehan de bi ser ket, rojname dev jê bernade û jê naweste "tirsan zêde bike ku Venezuela wê her bi leztir ber bi dîktatorîyê ve biçe". Çavkanîyên wê? Heman muxalefet û çapemenîya taybet a ku bêbextî gerand ji bo ku Chavez ji desthilatdarîyê bixe bi darbeya eskerî ya DYAyê destek didayê ya 2002yê, (23yê îlona 2010ê, 5ê çileya 2012ê). Belkî jî nîşana herî baş a hevdengîya wê ya bi dîplomasîya DYAyê re, di reaksîyona wê ya vê dawîyê de ya li dijî Julian Assange Wikileaksê de mirov dikare bibîne. Wexta derfet danê da ku alîgirîya wê ya dozeke ji rêze ya lîberal îlan bike –azadîya agahîstendinê– ew dudil ma. Li gor wê mafê DYAyê heye ku bi wan kesan re ser bike yên ku sirên wê didizin û lê aşkere dikin, çi 'Jacobinên Dîjîtal' [çepgir an jî çepgirên tundraw yên ku li ser Înternetê çalak in; nota wergêr] bin ên ku "xwedî gelek alîgir" in, çi jî ne ew bin, ev ne girîng e (9ê kanûna 2010ê).

The Economist bi awayekî lîberalîzma ciwanîya xwe ji nû ve vedît. Li ser dewra dewletê, zanetîya bazaran û tehlûkeyên xwebirêxistinkirinê, helwêstên wê bi awayekî madî ji edîtorên wê yên mezin ên Victorian ne cihê ne. Bi her halî, vê carê divê dildarîyên xwe bi wekalet bijî. Lîberalîzm bixwe guherî. Girêdana wê bi yek neteweyî re –ji sala 1945ê û vir ve Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê– cihêtîya herî darîçav e. Ji barê şovenîzma neteweyî derzîkirî, wê destek da şeran, ên ku wezîrên wê berê bawerî bi hîmê wan ê mantiqî (çi insanî, çi welatparêzî yan jî ji bo pereyan) nedianîn. Edîtorê wê yê niha yê ku li bankeyên Amerîkayê û navendên nûçeyan hatiye perwerde kirin, encama vê çanda nû ya edîtoryal e –mêzînek e navbera lîberalîzma klasîk a rojên xwe yên bê teşqele û awayê neo yê ku ew niha rave dike. Piştî 169 salan *The Economist* markeya aborîya siyasî ji bilî Efrîkayê li her parzemînê bi berferehî tê belav kirin. Lê belê roja me ya îro ruhê nepenî yê ingilîzan kêm elaqeya wê pê re heye.

* Dîrokzan, li zanîngeha Californiayê li Los Angelesê.

(1) "The Economist Tends its Sophisticated Garden / The Economist Meyildara Baxçeyê xwe yê Sofîstîke ye," Jeremy W. Peters *The New York Times.* 8ê tebaxa 2010ê.

(2) "The Economics of the Colonial Cringe / *The Economist*a Tirsonekîya Kolonyal," *The Washington Post.* 6ê çirîya pêşî ya 1991ê.

(3) *Libération*, Paris, 8 tebax 2003.

(4) Fîlozof (1918-1990) di sala 198ê de jina xwe xeniqand

(5) Li pirtûka Ibrahim Warde, ya «Quand le libre-échange affamait l'Irlande» binêrin, *LeMonde diplomatique,* hezîran 1996.

(6) Collected Works of Walter Bagehot [Berhemên Komkirî yên Bagehot] v. iv, r81. Xwendevanên fransî divê hez jê bikin. Li gor Bagehot ingilîz nexasim pir baş li hukûmeta parlemanterî tên ji ber 'ehmeqîya xwe ya bêhemta'. Fransîyekî bi rastî 'nabe ku ehmeq be; *esprit* [aqil] cewherê wî ye, mejî ji wî re weke avê ye, *bons-mots* [gotinên baş] weke *bon-bons* [şekir] in." (Bagehot Collected works IV, 81).

(7) "The Disruption of the Union/Xirabûna Yekîtîyê" The Economist 19ê çileyê sala 1861ê; "Is the success off the North Possible? / Gelo serketina bakur mumkin e?" The Economist 29ê hezîrana 1861ê (260); "English Feeling Towards America / Hisên ingilîz beramberî Amerîkayê" 28ê îlona 1861ê (323-328); "The Invasion of the Federal States / Dagîrkirina Deweltên Federal" The Economist 11ê hezîrana 1863yê (387-389).

(8) The Economist*:* 1843-1943. r13-15

(9) Di nav heman demê de 150 gotar ji bo mijarên kolektîfkirina pirsgirêka ewlekarîyê û sînordarkirina çekdarîbûnê hatin veqetandin. Graham Hutton. "*The Economist* and Foreign Affairs / *The Economist* û Karên Derve," di The Economist 1843-1943 de.

(10) "Channel Crossing / Derbaskirina Kanalê," *The Economist* 6ê çirîya pêşî ya sala 1956ê. Ev gotarek e ku muxalefeta li dijî kanala Suezê ya bi temamî bi van gotinan rave dike – dema ku Brîtanya û Fransa têra xwe hêzdar bûn ku karûbarên kolonyal di nav xwe de hal bikin, li paş ma û bihurî. Ji bo Ewropayê pêwîst bû ku girêdayî DYAyê be.

Wergera ji ingilîzî: Feryal Guladawîya

Sala 2011ê dahata rojnameyê her zêde bû, di reklamgirtinê de rewşa wê baş bû, tevî ku tîraja wê ya global bi rêjeyeke kêmtir zêde bû, kêmtirî ji sedî 1ê. Ev encam diviyabû li ber endustrîya sektorê hemûyî bihata girtin, bandorên krîzê di îndustrîya vê sektorê de kêmbûnên demdirêj bi lez kirin, nexasim jî li DYAyê. Hatinên madî yên rojnameyê sala 2008ê ji sedî 14.6 kêm bûn û sala 2009ê ji sedî 18. Firotinên reklamê jî di heman demê de ji sedî 23 li xwe kêm kirin, tîraja wê jî kêmbûna xwe ya ku ji du dehsalan ve dewam dikir, ajot. (10) Firotina li ser dezgehan a kovaran di nîvê pêşî yê sala 2009ê de ji sedî 12.36 kêm bû, di nîvê duyem de ji sedî 9.1, li gor adahîyan di sala 2010ê de kêmbûna firotina wê ne pir e. (1)

(1) "Newsstand sales and circulation fall for magazines / Firotina li dezgehan û belavkirina kovaran kêm bû", *The New York Times*. 8ê sibata 2010ê. Stephanie Clifford.

ADAR 1998

Dema ku «hevalê me» Sedam Husên kurdên xwe kîmyabaran dikir!

KENDAL NEZAN

Lêkolîna çekên kîmyayî û bîyolojîk ên Iraqê, mijara bingehîn a Kêşeya Kendavê ya li vê dawîyê bû. Biryara Bexdayê ku nehişt şarezayên Neteweyên Yekbûyî li cîhên serokatîyê ku Iraqê dikarîbû ew çek tê de biveşartana lêkolînê bikin, dê bizava nû ya bombebaranê rewa bikira. Dem guherîbû. Deh sal berî wê, êrişa sîstematîk ya bi gazên kîmyayî li ser gelê kurd li bakurê Iraqê, bi awayekî aşkere tesîreke kêm li ser Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê kiribû. Şeş mehan piştî qetlîama li bajarê Helepçeyê, Qesra Spî mîlyarek dolarê din deyn dida Sedam Husên. Hingê, «Hitlerê nû» yê siberojê li dijî soreşa îslamî ya Îranê hevalbendê rojavayê bû.

Li sibeheke biharê ya 16ê adara sala 1988ê, balafirên bombebaranê yên iraqî hatin esmanê Helepçeyê, bajarê bi 60 000 nifûs, li alîyê jêr ê başûrê Kurdîstana Iraqê ku bi çend kilomêtreyan ji sinorê Îranê dûr e. (1)

Bajar roja berî wê ketibû destê peşmergeyên Yekîtîya Nîstimanî ya Kurdîstanê (YNK) ya Celal Talabanî ya bi piştevanîya pasdarên Îranê. Êrişên bi dû hev yên her du alîyên şerê Îran û Iraqê ew herêm ji îlona 1980ê û pê de wêran kiribû, loma şênîyên Helebceyê êdî fêrî jîyana wisa bibûn û wê rojê jî, wan li pêşîyê hizir kir ku ew dîsa yek ji wan êrişên wisa ye. Yên ku wextê wan heye xwe di stargehan de vedişêrin. Yên din, bi bombeyên kîmyayî yên ku balafirên Mirage û Mig yên iraqî bi dû hev diavêjin diguhuşin. Bêhneke genî ya sêvên rizyayî Helepçeyê verdigire. Êrişên hewayî bi şev radiwestin û baran lê dike. Ji ber ku leşkerê Iraqê santrala elektrikê ji nav biriye, şênî bi ronahîya xetîreyan di nav herîyê de li mirîyên xwe digerin.

A ku ew roja paştir dîbînin, karesat e: Kolanên bi terman tijî, mirovên ku di nîveka tevgerên xwe yên rojane de bi kîmyayê ketine û mirîne, pitikên ku hê jî şirê dayîkên xwe dimêjîn, zaroken ku destê wan di nav destê bav an dayîkên wan ên bêliv de, ku di cîhê xwe de cemidî ne û wisa mane. Di nav çend saetan de 5000 mirov mirin, 3200 ji wan êdî bê kes û bê malbat bûn, di gorên giştî de hatin veşartin.

Wêneyên wê komkujîyê bi saya nûçegîhanên şerî yên îranî li cîhanê belav dibin. Çapemenîya navneteweyî ku ew rojnameyan şandibûn cîh dide nûçeya wê bûyera nedîtî. Çunkî bikaranîna çekên kîmyayî bi Peymana Cenevrê ya 1925ê bi awayekî fermî hatiye qedexe kirin -bi tenê Îtalyaya Benito Mussolini di dema şerê xwe yê li Etîyopyayê de ew qedexe şkand. Vê carê, dewletekê li hemberî welatîyên xwe bixwe gazên kîmyayî bi kar tîne…

Di rastîyê de, Iraqê ji 15ê meha nîsana 1987ê, du hefteyan piştî ku Hesen Alî Mecîdê pismamê Sedam Husên wek şefê buroya karûbarê bakur, anku Kurdistanê, hat dest nîşan kirin, li dijî kurdan dest bi bikaranîna çekên kimyayî kiribû. Biryarnameya jimar 160 ya 29ê adara 1987ê ya Civata Fermandarîya Şoreşê gelek hez û desthilat dida wî ji bo ku ji pirsa kurdî re çareya dawîn peyda bike, ku ne bi rêbaza xurt a erebkirinê, ne bi bêcîhûwarkirina xelkê, ne bi îdamkirina «rêberan», ne jî bi şerê ku ji 1961ê vir de geh radiwesta, geh berdewam dibû, çareser bûbû.

Bi hêza biryara jîyan û mirinê, ew desthilatdarê iraqî biryarê dide ku hemî gundan vala û wêran bike, şênîyên wan di nav kampên li ser rêyên sereke amadekirî de kom bike û ew kêsên ku wek dijmin tên hesibandin ji holê rake. Di çarçoveya vê stratejîyê de, bikaranîna çekên kîmyayî ji bo paqijkirina jibermayîyên berxwedanê û gundên asê yên çîyayî tê pêşnîyar kirin.

Ji 15ê meha nîsanê heta hingê di ceribandinên pêşîn ên kimyayî yên Hesen Mecîd li dijî nêzîkî 30 gundên wîlayetên Silêmanî û Hewlêrê de ew çek tesîra xwe nîşan didin û bi sedan mirov dikujin. Li 17ê adarê, piştî ku êrişekê bi çekên kîmyayî di newala Balisan de dibe sedema mirina 400 mirov, 286 kesên birîndar hewl didin ku xwe ji bo dermankirinê bigihijînin Hewlêrê, lê ji alîyê leşkerî ve tên girtin û gulebaran kirin.

Birêveberê buroya karûbarê bakur, ji bo ku hevkarên xwe yên din, û bi taybetî serok Sedam Husên, ji tesîra rêbazên xwe piştrast bike, komkujîyan, bêcîhûwarkirinê û tesîra gaza kimyayî li ser gel, bi vîdeoyê dide tomar kirin. Serbazên iraqî yên ku ji alîyê şarezayên Stasî ya Almanyaya Rojhilatê ve hatine perwerde kirin, bi kêfxweşî kiryarên xwe yên herî xirab jî dixin arşîvan. Dema serhildana kurdan a adara sala 1991ê, perçeyeke ji vê arşîvê wê biketa destê hêza berxwedanê ya ku ew ê ji bo komela Zêrevanîya Mafên Mirovan ya li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî bişanda. Parastin û bikaranîna wan 18 ton belgeyên polisî û polîtîk ji alîyê Zaningeha Coloradoyê ve hat piştrast kirin û ew ê di demeke nêzîk de li ser Înternetê bihatana weşandin. Ji wan, em dikarin dîroka kampanyaya qirkirinê ya ku rejîma serok Sedam Husên li dijî Kurdan pek anî, bibînin.

Di panzdeh salan de 400 000 mirî

Em ji wan belgeyan dibînin ku, di 26ê gulana 1987ê de, Hesen Mecîd birêveberên partîya Be'esê dicivîne û ji wan re dibêje: *«Piştî ku me valakirina gundan temam kir, em ê ji her alîyî ve dest bi êrişên li ser wan (Pêşmerge) bikin. (…) Em ê wan di cîhên biçûk de asê bikin, dora wan bigrin û bi çekên kîmyayî êrişî wan bikin. Ez ê ne bi tenê rojekê bi çekên kimyayî êrişî wan bikim, ez ê bi panzdeh rojan êrişê bidomînim. (…) Min ji şarezayên hevrê re gotîye ku, pewistîya min li Ewropayê bi komên gerilayan heye ji bo ku hemîyên (dijberên kurd) ku ew dikarin bikujin, bikujin. Ez ê bi alîkarîya xwedê vê bikim. Ez ê wan ji nav bibim û berê wan bidim Îranê. Û li wir jî, ez ê ji Mucahidîn-î Xelkê (2) bixwazim ku êrişî wan bikin.»* (3)

Di 3yê meha hezîrana 1987ê de, ew fermandar, fermana xwe ya şexsî ya jimar 28/3650 îmze dike: Ev ferman herêmeke ku bêhtir ji 1000 gundên kurdan pêk tê wek *«herêmeke qedexe»* destnişan dike û dixwaze ku her çî mirov û heywanên ku tê de werin dîtin, bên kuştin. Li gor vê fermanê, *«hemî çûyîn û hatina xwarin, mirov û makîneyan ber bi gundên qedexe ve ji ber sedemên ewlekarîyê yekcar qedexe ye (…). Berhemên çandinê divê heta 15ê tîrmehê bên çinîn û rakirin û ji îsal şûnda destûr nîne ku li vê heremê çandin were kirin(…) Hêzen leşkerî divê hemî mirov û heywanên li van herêman bikujin».*

Bi vê destûra bê sinor, di navbera meha sibat û îlona 1988ê de hêzen iraqî bi kiryara «Enfal»ê (navê ayetekê Qur'anê ku destûra talana malê kafiran dide) êrişên xwe gihandin dereceya herî bilind. Ji van kiryaran a dawîn li 25ê tebaxê ye, çend rojan piştî ku agirbesta di navbera Îran û Iraqê de şerê heşt salan bi dawî anî. Şanzdeh liq û tabûrekê çekên kîmyawî, anku bi giştî 200 000 serbazên bi desteka hewayî, li devera Behdinan a kurdan a li ser sînorê Tirkiyeyê «bizava dawîn a paqijkirinê» bi rê ve dibin. Ev operasyon dibe sedema reva nêzîkî 100 000 kesên sîvîl ber bi Tirkiyeyê ve.

Meha tîrmehê ya 1988ê, artêş bajarê Helepçeyê yê ku kurd wek cîhekî pêşkeftî yê çandî dihesibînin, dide ber dînamîtan û bi temamî xirab dike. Nav û dengê wî cîhî li rojavayê ji belav bû ji ber tesîra li ser ingilîzan ya hikûmdara wê ya destpêka sedsalê Adle Xanê, ku parêzera huner û hunermendan bû.

Birêvebera wê herêmê ya piştî Şerê Yekem ê Cîhanê Londonê nîşana Xan Bahadir (dotmîra dilêran) dabû wê hikûmdara jin a li warê Îslamê. Ew dilêrên ku ji dema Xénophon were bi hostatîya çekan û hunera şerî navdar bûn, li dawîyê ji alîyê neyareke nedîyar ve hatibûn şkandin: Ji alîyê gazê ve.

Xirabkirina bajar û gundên kurdan heta sala 1989ê didome. Di hezîrana wê salê de, Qeladizê, bajarê bi 120 000 nifûs ê li ser sînorê Îranê tê vala kirin û bi dînamîtan tê xirab kirin. Ew bedkarîya mezin a dawîn ya Enfalê ye. Civata Fermandarîya Şoreşê, ew desthilata taybetî ya ku wê dabû Hesen Mecîd, bi fermana jimar 271ê ya 23yê nîsana 1989ê ragirt (betal kir) û meha çirîya pêşîn serok Sedam Husên êdî pirsgirêka kurd wek çareserbûyî dihesiband, û buroya karûbarê bakurê ya ku wî berî deh salan damezrandibû, rakir.

Li dawîya vê qirkirina har, 90% gundên kurdan ji xerîteyê hatin rakirin (4), her wisa bi dehan bajar û bajarok jî. Nêzîkî 1,5 mîlyon mayîn li gundan danîn, ji bo ku rê li ber çandinê û ajaldarîyê bê girtin. Û 1,5 mîlyon gundîyên kurd di kampan de hatin heps kirin. Ji sala 1974ê vir de, şerê Iraqê li dijî kurdan bi mirina zedeyî ji 400 000 mirovan, ku nêzîkî nîvê wan winda ne, bi dawî hat. Ev hejmar nezîkî 10% nifûsa kurdên Iraqê ye. Meha gulana 1991ê, dema hevdîtinên ji bo aştîyê digel Bexdayê ku dê negihiştibûna tu encaman, wefda kurdî wan mirovên winda dipirse. Dema ku aqûbeta 182 000 kesên bêserûşûn jê tê pirs kirin, Hesen Mecid hêrs dibe û dibêje: *«Hûn her tim tiştan mezin dikin. Hêjmara temamê kesên li Enfalê hatine kuştin ne zêdeyî ji 100 000an e!»* Ew rêyên ku wî bi kar anîne jî, di rapora civîneke li meha çileya dawîn a 1989ê de (5), venaşêre û dibêje: *«Ma min ê ew xwedî bikirana, sexbêrî li wan bikira? Na, ez ê wan bi dozeran veşêrim. Ew ji min navên hemî kesen di zindanê de dixwazin ji bo ku biweşînin. Ma bi wan ez ê vê hejmara bilind a mirovan deynim kî derê? Min dest pê kir ku wan li ser wilayetan belav bikim. Divîya min dozer bişandana wira û vira».*

Parastina rojavayî

Rejim ji çi reaksîyonên navneteweyî natirse. Di kaseta civîna 26ê gulana 1987ê de, Hesen Alî Mecîd wiha dibêje: «Ez ê wan hemîyan bi çekên kîmyayî bikujim! Wê kî tiştekî bibêje? Civaka navneteweyî? Di.. wan bigêm…!!» (6) Her ciqas axaftineke bêedeb be jî, lê ew helwêsta qesabê Kurdistanê, ku bi dû re bû walîyê Kuwêtê, û piştra jî wezîrê berevanîyê ne bê sedem bû.

Iraq wê demê wek sîperekî sekuler ê li dijî rejîma îslamî ya Tehranê dihat dîtin û ji alîyê welatên rojhilatî û rojavayî ve, her wisa, ji bilî Surîyeyê, ji alî hemî cîhana erebî ve piştevanîya wê dihat kirin. Welatên rojavayî hemî çek û kredîyan didin Iraqê. Bi taybetî Fransa: Firotina balafirên Mirage û helikopteran têrê nekir, Paris radibe tam di nav şerê li dijî Îranê de balafirên Super-Etendard dide Iraqê. Almanya bareke mezin a teknolojîya çekên kîmyayî teslîmî Iraqê dike û bi hevkarîyekê leşkerî ya nedîtî di navbeyna rojhilat û rojavayê de, endazyarên alman roketên Scud ên ku Iraqê ji Sovyetê kirîbûn xurttir dikin, ku karibin bigihijin bajarên wek Tehranê dûr yên Îranê.

Tevî hêrs û nerazîbûna gelerî piştî bihîstina kîmyabarankirina Helebceyê jî, Fransa, hevpişka peymana Cenevre ya 1925ê, bi tenê bi ragihandineke ecêb rexneyan li «bikaranîna çekên kîmyayî li her dera ku ew tên bikaranîn» digire. Neteweyên Yekbûyî şarezayekî leşkerî yê îspanî, mîralay Dominguez, dişîne cîhê qirkirinê. Di rapora wî ya ku 26ê nîsana 1988ê tê ragihandin de, bi tenê tê gotin ku *«çekên kîmyayî dîsa hem li Îranê, hem jî li Iraqê hatine bi*

kar anîn» û *«hêjmara qurbanîyên sîvîl zêde dibe»*. Sekreterê giştî yê Neteweyên Yekbûyî eynî rojê dibêje *«Zehmet e ku neteweyên xwedîyên wan çekan an yên ku ew çek bi kar anîne bên zanîn»*.

Bêguman, hevalbendên Iraqê mehkûmkirina Bexdayê naxwazin. Di tebaxa 1988ê de, komîsyona mafên mirovan ya Neteweyên Yekbûyî bi 11 dengan li dijî 8an biryarê dide ku *«mehkûmkirina Iraqê ji ber zêdegavîyên li ser mafên mirovan ne di cihê xwe de ye!»* Bi tenê welatên îskandînavî, Avustralya û Kanada, û her wisa rêxistinên wek Parlamentoya Ewropî û rêxistina Enternasyonala Sosyalîst bi awayekî zelal Iraqê mehkûm dikin û avrûyê xwe diparêzin.

Heta ku şerê Iraq û Îranê bi dawî hat û bi dû re kurd di îlona 1988ê ji ber êrîşekê din a bi çekên kîmyayî revîn û pena xwe bir Tirkîyeyê, tu tiştek naguhere. Lê bi dû re, serokê Fransayê François Mitterand, di daxwuyanîyeke 7ê îlonê de behsa «endîşeya xwe ji ber agahîyên li ser amûrên zordestîyê yên ku li dijî gelê kurd ê Iraqê tên bi kar anîn, û wek mînak bikaranîna çekên kîmyawî» dike. Bêyî ku xwe têkilî karûbarê navxweyî yê Iraqê bike, ew dibêje ew bawer dike ku «têkilîyên dostane yên ku Iraq û Fransayê tinîn ber hev hê bêhtir rê didin ku ew hestên xwe bide zanîn». Serok George Bush, ji alîyê xwe ve, biryarnameya ku her du civatên kongreyê bi peşnîyara senator Claiborne D. Pell ji bo cezakirina Iraqê pejirandibû, veto dike. Bi ser de jî, Qesra Spî kredîyeke nû ya bi mîlyareke dolaran dide Iraqê.

Bi tenê piştî dagîrkirina mîrnişîna dewlemend a Kuwêtê di meha tebaxa 1990ê de, Sedam Husên wê ji Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî re bûba «dirinde» û ew ê ji alîyê serok George Bush ve wek «Hîtlerê nû» bihata bi nav kirin. Lê dîsa jî ew bi kêr dihat, loma piştî şerê Kendavê jî li ser pêyan ma: Leşkerê amerîkî ne bi tenê ji bo lêdana dîktatorîyê tu tiştek nekir, wî herwisa hişt ku nobedarên serokatîya wî di bihara 1991ê de serhildana gelê Iraqê –a ku serokê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî bi xwe ji gelê Iraqî xwestibû– di nav xwînê de bipelêxin…

(1) Binêre, Christiane More, «Kurd li stratejîyeke nû digerin» *Le Monde diplomatique,* çirîya pêşîn, 1988.

(2) Rêxistina opozîsyona Îranê ya ku bingehên wê li Iraqê ne û hikûmeta Bexdayê alîkarîyê didê.

(3) Axaftinên di kaseta vê civînê de di pirtûka «*Genocide in Iraq,The Anfal Campaign Against the Kurds » (Qirkirina li Iraqê, Bizava Enfalê li Dijî Kurdan)* ya ji alîyê komela Human Rights Watch (Zêrevanîya Mafên Mirovan) ve (New York, 1993) hatine çap kirin.

(4) Li gor lêkolîneke wezareta avakirin û pêşkeftinê ya hikûmeta kurdî, li sê wîlayetan Hewlêr, Dihok û Silêmanîyê 4,049 gund hatin xirab kirin, 673 man. Ew hejmar wîlayeta Kerkûkê venagire ku li wir jî bi sedan gund hatin wêran kirin.

(5) *Genocide in Iraq, op. cit.*

(6) *Genocide in Iraq, op. cit.*

(7) *Le Monde,* 28 nîsan 1988.

Wergera ji fransî: Bêrîvan Kilic Tugan

ÎLON 1998

PIRTÛKA NÛ YA JONATHAN C. RANDALL

Kurd, gelê bêparhiştî

ERIC ROULEAU *

Ji hemû pirtûkên ku li van salên dawîyê li ser Kurdan hatine nivîsandin, eva hanê hêjayî cîhekî taybet e. (1) Ev pirtûka Jonathan Randall, rojnamevanê amerîkî yê li cîhanê bi nav û deng, dê hem bala şarezayên Rojhilata Nêzîk, hem jî bala giştî bikşîne ser xwe. Nivîskar li wê herêmê bisteh e û bi qasî sîh salan e ku wek nûçegihanê rojnameya *Washington Postê* diçe û tê. Randall bi rastgoyîya xwe navdar e, her wisa xwedî karîneke analîza kartezyen e ku di çapemenîya amerîkî de kêm e. Wî bi salan ji bo vê pirtûkê lêkolîn kir, li belgeyan gerîya û li wê herêmê ji bo nivîsandina pirtûka xwe xebitî.

Vegotina Jonathan Randall, ji awayê amerîkî dûr e, şexsî ye; ew serpêhatîyên xwe bi terza xwe ya taybetî li deftera xwe ya rêwîtîyê tomar dike: Xwendevanî dibe mêrg, çîya û şikeftên Kurdistanê, zehmetî û talûkeyên ku dibîne dinivîsîne, jê re bi peyivan portreyên axayên şerî, destkîsên bîyanî û dîplomatên xweveşartî dinexşîne û keşfên xwe, hest û tirsên xwe, carên bêhêvîtîyê û hêrsa xwe pê re parve dike.

Randall piştevanê mafên kurdan e, lê ev yek nabe asteng li pêşîya rexneyên wî li hember rêberên wan, nexasim li hêzên bîyanî yên ku rewşa kurdan bi awayekî bêperwa têk vedane. Ew rojnamevanê mezin çîroka xwe bi bîranînan û bi zanyarîyên sosyolojîk û psîkolojîk vedirêse, da ku xwendevan karesatên bi serê vî gelî de hatine çêtir fam bike. Ev gelê nezîkî 25 mîlyon jin û mêran li ser erdeke bi qasî Fransayê di bin hukmê gelek dewletan de, bi taybetî Tirkîye, Iraq û Îranê de, perçe bûye û bi salan e têdikoşe da ku qet nebe otonomîyê bi dest bixe. Jonathan Randall qala kurdên di bin hukmê komara îslamî ya Tehranê de nake, behsa şerê çekdar ê li Tirkiyê dike, lê mijara wî ya bingehîn, şerê berdewam ê di navbera Bexda û kurdên Iraqê de ye. Ew bûne qurbanîyên hovîtî û komkujîyan ku nîvîskar wek jenosîdê (qirkirinê) dinirxîne.

Beşa li ser peywendîyên netewe-perwerên kurd û Îsraîlê li salên 60 û 70yê dagirtî ye û ji ber agahîyên ku heta niha nedihatin zanîn, balkêş e. Jonathan Randall li mebestên bingehîn ên hevgirtina wan vedikole ku her du alî jî wek hevgirtineke xwezayî ya du gelên hindikayî yên di nav deryaya erebî de pêşkêş dikin. Jona-than Randall, bi taybetî bi vegotinên endamên berê yên Mossadê, nîşan dide ku niyetên birêveberên îsraîlî jî bi qasî yên karbidestên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkî û Îranê tarî ne. Di meha adara 1975ê de, her sê hikûmetan di şev û rojekê de kurd dan destê celadên wan ên iraqî…

Jonathan Randall hişyar e û berpirsîyarîya kul û kovanên bêdawî yên kurdan bi tenê naxe stûyê hêzên bîyanî. Safîtîya berdewam a rêberên wan, şaşîtîyen wan ên siyasî ku qet dawî li wan nayê, şerên birakujîyê yên xwînî ku rê didin xiyanetê, nîşanên şert û mercên civakî û çandî yên gelê wan in. Agahîyên ku Jonathan Randall pêşkêş dike, şikestinên bi dû hev ên tevgera kurdî şirove dikin û divê bibin sebebê hizirînê.

* Rojnamevan, balyozê berê yê Fransayê

(1) Jonathan C. Randall, *After Such Knowledge, what Forgiveness ? My Encounters with Kurdistan* (Piştî Hewqas Zanînê, Efûkirina çi? Rastîhevhatina min bi Kurdistanê re), weşanxaneya Farrar, Straus û Giroux, New York, 1997, 356 rûpel, 25 dolar. Bi zimanên ingilîzî, îtalî, erebî û hollandî hatiye çap kirin û dê li Amerîkayê ji nû ve bi berga tenik jî bê çap kirin.

Wergera ji fransî: Bêrîvan Kilic Tugan

ZOUBER YOUSEF: **Suwarî**. Metal

WÊNESAZÊ VÊ HEJMARÊ

ZOUBER YOUSEF

Hunermend Zouber Yousef di 1968ê de li Khirbat Al-Bayader (Sûrîye) ji dayik bû. Sala 1973ê tevî malbata xwe li Hesekîyê bi cîh bû.

Di 1979ê de li Sûrîyê di beşa wênesazîyê de wek xwendekarê herî serkeftî hat hilbijartin.

Perwerdeya xwe ya bilind di navbeyna salên 1986-1990ê de li Akademîya Huner a Şamê kir. Bi xebata xwe ya "Piçek Mîtolojî" li Akademîya Huner wek xwendekarê herî serkeftî perwerdeya xwe xelas kir û ji beşa peykertraşîyê bawernameya xwe wergirt.

Di 1990-1991ê de wek mamosteyê wênesazîyê û wênesazekî xweser xebitî.

1999ê de li Almanyayê bi cîh bû. Li NRWê li bajarê Siegburgê dijî û xebatên xwe yên hunerî û wênesazîyê li wê derê didomîne.

Mijara bingehîn ya wêne û peykerên hunermend Zouber Yousef liv û tevger e. Ev liv û tevgera di berheman de şêweya xwe îfadekirina hunermend e. Bi vî awayî hunermend Yousef hestên xwe yên veşartî pêşkeşî bîneran dike. Hunermend bi vê dozîn û têgehê berhemên xwe diafirîne û di heman demê de bi bedewkarî û estetîkeke bi hêz digihîjîne me bîneran.

Hunermend ji alîyekî ve dixwaze bi hestên xwe yên veşartî berhemên xwe biafirîne û ji alîyê din ve jî bawer dike ku di jîyanê de enerjîyeke veşartî û nependî heye û ji vê enerjîyê îlhamê werdigire.

Hunermend, mijar û figurên berhemên xwe ji bûyer û serpêhatîyên ku di jîyana rojane de tesîr li ser hiştine, werdigire. Mirov dikare bibêje figurên berheman kurtedîmenên ji jîyana hunermend in.

Xalekî din a di berhemên Yousef de balê dikşîne ser xwe jî, bikaranîna efsane û bûyerên mîtolojîk in. Hunermend bawer dike mirov dikare ji bûyerên mîtolojîk û efseneyan ji bo dahatûyê dersan derxe.

Hunermend Yousef xebatên xwe yên hunerîyê li kargeha xwe ya bajarê Siegburgê didomîne û di heman demê de li kargeha xwe ji bo şagirtên alman dersên peykertrajî, wêne û enstalasyonê dide.

Di derheqê hunermend Zouber Yousef de ji bo agahdarîyên zêdetir li malpera **http://www.zouber.com** binêrin.

www.arsivakurd.org

Piştî hewldanên çaryek sedsalê, Hindistan difikire ku dîware sînorê xwe yê bi Bangladeşê re xilas bike: 3286 kîlometro, ango benda jeopolîtîk a herî dirêj a dinyayê. Lê belê derbaskirina vî dîwarê ku kirina neteweperestîyê ye, diyar e bi qasî ku dihat bawer kirin nemumkin nîne. Gelek tişt tê re derbas dibin: mirov, zimanekî hevpar, sewal, sîr, sarî [cil û bergên jinan ên hindî], biharat, şirûba kuxikê, alavên midbexê û çar hezar sal dîroka bengalî.

HERÊMEK, DU WELAT... QAÇAXÇÎTÎYEKE ZÊDE

Hindistan - Bangladeş, sînorê bêkêrkirî

ELIZABETH RUSH *

Ajotvanên qamyonê yên hindî tevî telîsên riz li başûrê Lalgola ya ku li ser sînorê Bangladeşê ye

Bengala Rojava, Hindistan. Li dûr, du jin di ber sînor re dimeşin, cilûbergên yekê ji wan spî ne, yên ya din porteqalî ne. Ya pêşî xwe ji ser axa bilindahîyekê ve bi lez digindirîne û destê xwe dirêj dike da ku alîkarîya ya din bike. Bi hev re her du di kanaleke teng de bi zor û zehmetî dimeşin, av digihêje heta bi navtenga wan di nav simbilên avê yên xemrî de ne. Pêncsed metroyan dûrî wan li alîyê wan ê çepê qismekî dîwarê navdar heye. Lê belê li vir tu tişt nîne. Bi tenê rohnîyeke berîya roj hilê heye ku her tişt di navê de ji hev de dikeve û zelûl dibe. Her du reşên piçûk bi rêyeke axê bi kaşekî li dûr hildikişin. Û va ye, her du jî derbas bûn, di nav tew û kaşikên welatekî din de wenda bûn. Buhayê vê rêwîtîyê bi giştî: ji 500 ta 1000 rûpîyan (di navbera 7 û 14 euroyan de) bi tenê ji bo çûnê (1) – hertişt girêdayî asta samîmîyeta bi nobetdarên bertîlxwur re ye.

Bernameyek hem buha hem jî ewqasî bêkêr

Şûn (2) xeteke darxurmeyan nîşanî me dide û dibêje "Bangladeş li pişt wir e". Kenek xetên nazik ên xortê ciwan rohnî dike. "Ez serfiraz im ku li vir dijîm, du welatên cihê li ber çavên min in." Welatê duyem yê ku ew behsa wî dike heta bi sala 1947ê parçeyek ji Hindistanê bû, hingê brîtanîyan herêm li gor pîvanên dînî dabeş kirin: Misilman li alîyekî û nemisilman li alîyê din. Sînorekî navneteweyî yê bi bayê bezê hatî kişandin û li nav herêmeke ku berê qet sînorekî bi vî rengî nedîtî danîn. Bengala hindistanî a ku berê devereke hevgirtî ya herêmî, çandî û aborî bû, li du beşên ne weke hev hat dabeş kirin: Bengala Rojava (ku hê jî ser bi Hindistanê ye) û Pakistana Rojhilat. Pakistana Rojhilat piştî şerê serxwebûnê yê sala 1971ê xwe rizgar kir û navê Bangladeşê li xwe kir. Tevî ku Hindistan weke yek ji hêzên mezin ên dinyayê derdikeve pêş, Bangladeş hê hewl dide binesazîya xwe ya herî sereke ava bike û xwe ji bertîlxwurîyê xilas bike.

Di nav çaryek sedsala bihurî de Delhîya Nû bi milyaran dolar pere lê da da ku dîwarê sînor ê modern ê herî dirêj ê dinyayê ava bike. Wezareta karên hundir a hindistanî her sal 1.3 mîlyar dolarên din ji vê bernameyê re vediqetîne, lewma personelê berpirsîyar e ji vê bernameya parastinê ya neteweyî hem buha ye û hem jî bêkêr e. Ev personel bernameyê weke Benda Mezin a Çînê ya serdemên modern dide nasîn: Bendeke mirov nikarin jê bibihurin da ku bangeldeşîyan li alîyê din bigire. Lê belê elaqeya rastîyê bi dîmenê fermî re zêde nîne. Li gelek deveran dîwarê navdar ji çend rêzên têlên rêsayî yên di navbera holikên hejmara wan kêm de dirêj dibin, pêk tê. Bi awayekî birêkûpêk navber dikeviyê, li dûrtir dewam dike; bi vî awayî navberên ku herkes dikare di wan re derbas dibe pêk tîne: Gundîyên çandîya van erdên ne yên tu kesî ne li herdu welatan dikin, penaber, jin û zarokên mexdûrên bazirganîyê, û bi sedan milyon dolarên bazirganîya qaçax ên ku biqasî ji çar paran sê parên bazirganîya fermî ya di navbera her du welatan de ye. Sînor qulopilo ye û bi vî rengî bi kêrî herkesî tê. Delîla bê qisûr a piştrast dike ku hewcedarî qanûn e, û rastîya li cihê cih henekê xwe bi siyaseta netewperest û nasnameyên derewîn ên lihevçêkirî dike.

Ne bi tenê bi hatina desthilatdarîyê ya Bharatiya Janata Party (BJP) partîya hindû ya neteweperest a ultra muhafezekar re "ewlekirinê" bi rastî dest pê kir. Dema ku sala 1986ê parlemana Hindistanê xurtkirina sînor erê kir, armanc xweşkirina ber dilê xelkê Assamê bû yê mitale dikirin ji ber fikra ku dibêje, koçberîya qaçax a misilmanan dikare mêzîna dînî ya wilayetê biguhere. Budceyeke destpêkê ya nisbî kêm ji bo projeyê hatibû veqetandin ku wê sala 1989ê dest pê bikira. Piştre bi manîpule-kirina hejmarên der barê koçberîya bangladeşî de û bi gijkirina tehlûkeya dagirkerîyeke misilman ji BJPyê hat ku hinduyan bikişîne nav refên xwe û di hilbijartinan de bi ser bikeve. Ji bo zindîkirina dildarîya neteweperest, wê di navbera "Bangladeşa îslamî", bêkarî û êrişên terorîst li Hindistanê de nîşaneke hevdengîyê dît. Piştî 11ê îlonê, dema ku "şerê li dijî terorîzmê" gihîşte asteke cîhanî, berpirsîyarên ewlekarîya neteweyî li Delhîyê dest pê kirin behsa dîwarên navdar kirin ên ku hêzên din ên mezin yên weke Îsraîl, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ji bo misogerkirina ewlekarîya xwe lêkirine. Bi xêra dîwarê xwe Hindistan êdî beşek ji demokrasîyên herî bihêz ên dinyayê bû...

Dema ku mirov ji hindistanîyan bixwaze hebûna vî dîwarî rave bikin, ew bêyî ku sedema surprîzekê be didin nav lîsteya dawî lênayê ya tirsên neteweperestan: Koçberên ku wê karên wan ji wan bidizin, penaberên ku mêzîna etnîk û dînî ya ji xwe nazik ya herêmê bêîstîqrar bikin, terorîzma navneteweyî ya ku wê Bangladeşê weke baregeha li pişt bereyê bi kar bîne da ku destûrê bide tundrawên îslamîst êrişên xwe yên întîharî li Bombayê pêk bînin...

Lê belê gelo li pişt dîwarê xwe Hindistanê bi rastî parastî ye ji tehlûkeyên ku parçebûn, BJP û 11ê îlonê rê li ber wan vekiriye? Risteke holikên banê wan ji qamîş û kayê li ser rêya di ber sînor de heye. Her serê sêsed metroyê kolikeke nobetdaran heye û nobetdarekî bi unîforme bi tivingeke pompeyî li ser milê wî li ber e. Hêza ewlekarîyê ya li ser sînor (Border Security Force, BSF) ji du sed û çil hezar endaman pêk tê. Kampên vê hêzê li ser sê hezar kîlometroyan yekoyeko rêz dibin, da ku xeteke berîya bi nîvsedsalê li ser qaxetê hatî kişandin, kontrol bikin.

Heke em ji mîralay Singh ê berîya bi bîst û pênc salan di BSFyê de dest bi eskerîyê kir, bawer bikin, "tu tişt di sînor re derbas nabe, tu kes, tu mal, tu tişt". Xelkê deverê bi xwe behsa tiştekî bi tevahî guhertî dikin: Bazirganekî sewal û dewaran ê ji bajarê piçûk ê Bengala Rojava yê li ser sînor Lalgolayê texmîn dike ku qederê % 80yê şênîyan tevlî bazirganîya ji sînor dibihure dibin.

Dema dibe şev, li ser rêyan dengê qapqapkan olan dide

Li herêmên tropîkal şev zû xwe bi ser dinyayê de berdide, û bi tarîyê re dinyayeke din xwe dide der. Bi carekê dengê qapqapkan ên mirovan kerr dike li ser rêyan olan dide. Ji nav sîya daran reşên mirovan derdikevin, lempekên destan şiverêyên tengokî rohnî dikin. Her êvar zincîra mirovan xweber çêdibe; bi dehan heta bi sedan mirov malên bazirganîya qaçax hildigirin dibin Bangladeşê. Û hema hema tevahîya nobetdarên sînor kareke pir baş bi dest dixin bi destûrdana derbasbûna kesên ku diviyabû pêşîyê li derbasbûna wan bigirin.

Supriyo Sen filmçêkerekî bi eslê xwe ji Bengalê ye, belgefilmên wî yên li ser sînorên Hindistanê hêjayî xelatan hatine dîtin, ew dibêje "Hindistan û Bangladeş weke du birayên mirovan ew ji hev qut kirî ne. Gelek tişt hene li cem birayê mirovî ku mirov hez dike, lê belê têkilîyên [birayan] bêyî kînê nabin." Berîya bi sedsalekê Bengal mala ronesansa çandî ya hindistanî û nasnameya wê ya modern bû. Lê belê hem dewlemendîya întelektuel û hem jî ya çandinîyê ya ku ev herêm ji yên din cuda dikir xwe disipart hevtemamkirina du nîvên xwe: Pîşesazîyên paytextê kolonyal Calcuttayê madeyên xam ên ji erdên bi aluvyon ên ku îro jê re Bangladeş tê gotin bi kar dianîn. Dema ku Bengal hat parçe kirin, cotkarên li rojhilat hem bazara xwe ya ku berhemên xwe yên xam bifiroşinê ji dest dan, hem jî navgînên ku van berheman veguherînin berhemên dawî yên dikarin werin kirîn û firotin. Fabrîqeyên ku ji kenewira hindê kîs çêdikirin û ji pembû ta çêdikirin li alîyê din ê sînorekî navneteweyî bûn.

Piştî parçebûnê, eyaleta nû ya hindî ya Bengala Rojava bi pirsgirêkên bi tevahî cihê re rûbirû bû: Xelayê û kêmbûna zad û qût Calcutta da ber xwe. Paşê di salên 1960ê de Delhîya Nû "şoreşa kesk" da dest pê kirin: Bi avdana eyaletên Bihar, Haryana, Pêncab û Uttar Pradeşê wê bakurê welêt veguherand kewara genim. Bi vî awayî xisara ku dema nîvê Bengalê bû dewleteke din bi carekê lêkirî, telafî kir; ango wê dikarî bipêşketina xwe ya pîşesazîyê xwedî bikira.

Ji sedî 18ê itxalatên fermî yên Bangladeşê ji Hindistanê tên, li hemberî vê bi tenê % 0.01ê malê dikeve Hindistanê ji Bangladeşê ye. Kevne Pakistana Rojhilat jî xwedîya berhemên xwe yên taybet e – tevî ku dibe ku dîrok bike mirov li tiştekî din jî bifikire, ev ne kenewira hindê, nejî pembû ye, lê belê ziblekî jehrî ye ya jêre amonyak anhîdrûs tê gotin. Erê rast e ew cil û bergan û madeyên xam ên ji bo pîşesazîya tekstîlê difiroşe tevahîya dinyayê, lê belê Hindistan hema hema tu tiştî jê nakire.

Bangladeş bi xwe pir hewceyê wan tiştan e ku li alîyê din ê sînor in. Sewal û dewar pîşesazîya çerm xwedî dikin ku yek ji pîşesazîyên herî zêde kar tînin yên welat e; ev sewal hema hema bi tevahî ji Hindistanê tên. Serjêkirin û îxracata sewal û dewaran li ser piranîya erdên Hindistanê qedexe ye, tevî vê qanûna ku xwe disipêre fermanên dînî jî, herroj bi dehan hezar sewal û dewarên sax bi awayekî mucîzewarî tên. Birêveberê ragihandinê yê rêxistineke derveyî hukûmetê (NGO) ya bi navê Rupan-tarê ya li Xulnayê, Emînul Ehsan ji me re dibêje "qaçaxçîtî duyemîn pîşesazîya mezin a welêt e. Belê, helbet bazirganîya qaçax li Hindistanê jî heye, lê belê ne bi qasî li vir, li vir nîvê hertiştî pêk tîne", her tiştê tê kirîn, firotin û serf kirin.

Erê bazirganîya sewal û dewarên sax li alîyê Hindistanê qedexe ye, çeleka hindû ya ji Bangladeşa misilman tê êdî weke neqanûnî nayê dîtin. Têrê dike ku mirov di anîna çêlekê de baceke 500 takasî (hinekî ji 5 euroyan kêmtir e) bide, û bi vê yekê her tişt diqede. Ji bo yên herî xizan, ji şivanê gundên dûr heta bi zeneatkarê çerm ê Daccayê, dewar heyatî ye. Û mirov gayê bangladeşî li seranserê dinyayê peyde dike: Weke bîftekan li Dubaî û Ebû Dabîyê, weke eşyayên ji çerm ên luks li Parîsê, weke potînkên îtalî yên texlîd li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê...

Şidet û bertîlxwurî sazî û dezgehan kangren dikin

Birêveberê dibistaneke Quranê ya herêmî Korbanuddîn parçeyek erdê têr gîya yê pêrçiqandî yê li ser kevîyeke cîran nîşan dide û dibêje: "Ev dever e cihê ku sewal û dewar tê re derbas dibin. Deh yan jî panzdeh çêlekan bi hev ve girê didin bi benekî, di nav erdên birinc re derbas dibin, û paşê bi tenê li benda kêlîya rast dimînin. Wan ber bi çemekî piçûk ve diajon, ev çem Bangladeş û Hindistanê ji hev vediqetîne. Bi dewaran re heta bi kevîya din a çêm soberîyê dikin, û li wir êdî ew qanûnî ne." Dewar ji sînorên Hindistanê tên lewra birên bengalî êdî têrê nakin. Li Bangladeşê yeka wan bi qederê 40000 takasî (390 euro) tê firotin, ango 32000 takasan bêhtirî çêlekeke wî cihî û qederê şeş caran ji buhayê xwe bêhtir li devereke Hindistanê a ku lê serjêkirina sewalan qedexe ye.

Ji bîst û heft kîlometroyên şaredarîya Lalgolayê ya li ser sînor, bi tenê heft jê bi têlên rêsayî hatine girtin, û heta di wir re jî sewal û dewar bi rehetî derbas dibin. Bazirganekî dewaran ê xwecihî rave dike: "Hûn îskaneke tijî av bi têlan ve didewisînin da ku dema mirov di wan re derbas bû deng bifetisînin, û va ye qedîya, tu li alîyê din î. Ev zehmet nîne! Dîwar hebe jî, nebe jî, heke tu pereyan bidî kesên rast, hîç ne girîng e!" Li Lalgolayê li her deverî dewar hene. Li Racşahî, hema li alîyê din ê çêm û carinan ê têlên rêsayî, bazirganîya wê sazîyeke bi rastî ye. Bazarên (haat) gelek bajarên li ser sînor wisa tên dîtin ku dikarin hejmareke ecêb mezin a conegayan bihewînin. Li City Haat (bazara şaredarîyê) ya Racşahiyê ku yek ji deh bazarên wilayetê ye, her hefte sê hezar dewar dest diguherin û heta di meha berîya cejna misilmanan eydê de, çar caran ji vê bêhtir e ev hejmar.

Atîqur Rehman îmtiyaza City Haatê girtiye, ev jî deynekî hukûmetê ye ku salê mîlyonan takasî lê dibe bar. Gotegot îdîa dikin ku wî hin ji reqîbên xwe dane kuştin da ku vê bazara bi qîmet bi dest bixe. Ji ber ku nîvê Hilberandina Hundir a Nesafî (HHN) ji avantaj yan jî pîvanên neqanûnî tê, şidet û bertîlxwurî tevahîya sazî û dezgehan kangren dikin. Bi awayê fermi Haat komîsyoneke % 3 distîne ji her firotinê – ev jî bi sê hezar dewarên di hefteyekê de tên firotin pereyekî baş e, yan jî weke ku bengalî dibêjin: "Bohoot taka!" Û li bajêr herkes dizane ku ev bi tenê yek ji navgînan e da ku Rehman bike ku pozîsyona wî ya serwer li ser rêya herî mezin a sewal û dewaran a welêt kar bîne.

Di çirîya pêşî ya sala 2011ê de çapatî(3)firoş Nûrul Îslam li ser peyarêyeke Racşahî ye ku mirov herî zêde tê re derbas dibin, xwe dide pêş da ku dewarên derbas dibin bihejmêre: Ew dibêje "ez êdî hew dikarim xwe lê ragirim, ew kesên ku berîkên xwe bi xêra çêlekan bi pereyan dadigirin hemû bîyanî ne. Ew pereyên xwe li Racşahiyê bi dest dixin û wan pereyan ji xwe re dihêlin." Li gor wî "bavê mafyayeke" xwecihî bi gheitalekê (li ser peyarêyê wezîfedarkirî, ev baceke din a hukûmetê ya kar tîne ye) xwe amade dike da ku dewaran di derîyê sînor re derbas bikin. Ew piştre mirovên di nav vî karî de dişînin deverê da ku dewaran ji Hindistanê bînin, dema vê dikin jî bertîlê didin nobetdarên sînor jî da ku çavên xwe li wan bigirin.

Dîwar, jesteke besîd a neteweperest

Ceynikên Îslam û hevalê wî Eshamel ji vê sîstemê diarin, lewra yên ku xwe didin ber rîskên herî zêde herî kêm kar dikin, wan li ser vê cihekî derbasbûnê yê ne fermî li ser ghâtê danî, wan ji gavanî ji bo her çêlekê doza fatoreyê kir da ku karibin kontrol bikin ka gelo bacên gumrukê hemû hatine dayîn. "Hema berîya eydê ye, û di rojeke bi tenê de ji çar hezar çêlekên di vir re derbasbûyî bi zor nîvê wan qanûnî bûn; ev yekane rê bû ku em bertîlxwurîyê piştrast bikin." Pereyê li sertîfîkayeke sexte ya îtxalatê diçe pênc caran ji pereyê li belgeyeke fermî diçe kêmtir e. Mafyaya herêmî piştî ku bertîl da gheitalekî da ku berê xwe bide devereke din, yek ser belgeyên sexte ji haatê tîne, ji bazara heywanan a ku Rehman mecbûr bû ji bo wê pereyan bide û, belkî jî xwînê. Bi tenê du hefte ketin navberê û ew kesên bazirganîya sewal û dewaran kontrol dikin li Racşahiyê ji bo dawîanîna li hewldanên Îslam û hevalê wî derba xwe datînin: "Yên ku milên wan dirêj hatin û Eshamel birin ser giraveke di nîvê çêm de. Wan destên wî û piyên wî şikandin. Polîs tu tişt nekir, lewra wan bertîl dabû polîs. Eshamel kelekvan bû, lê belê ew êdî hew dikare bêra xwe li avê bixe. Jixwe ew hew dikare bimeşe jî..." Awirên Îslam diçin ser çêm û girava di navbera her du welatan de, ew cihê hevalê wî lê lêdan xwarî, ew cihê ku çawa bibe şev bi hezaran çêlek wê tê re derbas bibin.

Li Bangladeşê mirov kevirekî biavêje, ew kevir li eşyayeke bi awayekî neqanûnî ketiye welêt dikeve: Sarîyekî diberiqe yê dawetan, piçek kîmyon yan jî porsîyonek goru bhuna (4). Tevna ku vê çavkanîya malên îtxalkirî diparêze pir belav e û welêt jî dike girêdayîyê vê qaçaxçîtîyê. Heta wê radeyê ku tevahîya şansê bipeşketina bêyî pereyên ji bazara reş a ku ji jor heta bi jêra civakê xwe berdaye nav, bixe tehlûkeyê. Di rewşa Îslam de ne bi tenê polîs, huqûq jî hevkarê guneh bû: Dema ku bavê mafyaya sewal û dewaran Kinu Mia yê ku ji lêdana dijwar a Eshamel bepirsîyar bû, xwest pê re "biaxive", bes bû ku fermaneke anîna buroya komîserîyê (ji bo anîna Eshamel) bide derxistin. Li buroya komîser a li navçeya nehemîn, wî jê re got: "tu ji masîyên bêqîmet î û ez masîyekî mezin im. Li cihê xwe bimîne, yan na ez ê hestîyên te bikim bi hezaran parçeyên hûrik û li dora giravê bireşînim. "Dema ku êriş birin ser Eshamel, çapemenîya herêmî xwe neda ber ku cih bide bûyerê.

Erê qaçaxçîtî di rastîyê de bi sazî û dezgeh e, û belkî jî ji ber vê yekê, sînorê di navbera Bangladeş û Hindistanê de yek ji yên herî xwînrij ên dinyayê ye, li gor rêxistineke li Calcuttayê ya bi navê Masum a ku bi Amnesty Internationalê re hewl dide li wir kuştinên bêpirs û dadgeh bi dawî bîne. Li gor serokê vê rêxistinê Kirity Roy her roj êşkence li qederê panzdeh kesan tê kirin, û ji sala 2000ê ve bêhtirî hezar kesan ji alîyê nobetdarên sînor ve hatin kuştin.

Gelek mirov şideta dewam dike weke wendahîyên talî yên li ser pîyan girtina nîzamê li herêmeke qulopilo dibînin. Lê belê di çarçoveya firehtir a bazirganîyeke bi mîlyaran dolaran tîne û nobetdarên sînor jî heta bi qirikê tê de ne, maneya vê şidetê ji serî heta binî yekê din e.

Dîwar – û dibe ku ev hêmanê herî girîng be – bi piranî ji alîyê zilamên ku ji bîst û heft eyaletên din ên Yekîtîya Hindî tên, tê kontrol kirin. Roy vê tesbîtê dike: "Nobetdarên BSFyê bi bengalî napeyivin, ev pirsgirêkeke pir mezin e." Dema wan a wezîfedarîyê ji sê mehan heta salekê ye, û ev wext pir kin e ji bo ku sempatîya wan bi civaka bengalî re çêbibe. Fuhûş li ser sînor di serdema xwe ya zêrîn de ye, û ji bo keçên hem hindistanî û hem jî bangladeşî zilamên BSFyê ji miştirîyên wan ên herî buha ne. Di çileyê 2012ê de dîmenekî vîdyoyê nîşan dida hinan ji van nobetdaran gavanek li ber çavên xelkê tazî kir û êşkence lê kir, vê bûyerê di çapemenîya neteweyî de deng veda û ji manşetê hat ragihandin. Tevî fermana hê nû ya ku li wan qedexe dikir kengî bibînin guleyan bireşînin jî, ji cezayan muafbûna wan mutleq e. Ev yek jî bêguman rave dike ka çima pênc bangladeşî ji serê salê ve hatine kuştin. Dema ku şidet dide der mirov pir caran behsa acizbûn, nijadperestî, maçotî û bi şaşîyeke xirab jibîrkirina li gor adetê dana bexşîşê [navê li bertîlê tê kirin; nota wergêr], dikin. Pir kêm in ew kesên behsa rastîya ewqasî darîçav e, dikin: Hindistan van zilaman dişîne herêmekê ku ew zimanê wê fêm nakin û bi vî awayî dîrok û çanda wê jî ji wan re xerîb dimîne.

BSF û di asteke kêmtir de Border Guard Bangladesh (BGB) ya ku ji BSFyê piçûktir û kêmtir xedar e, dikarîn dawîyê li çûnûhatinên neqanûnî yên di sînor re bînin. Lê belê gelekan ji wan bertîl dane da ku bibin xwedîyên îmtiyaza xebitîna li ser sînor, lewra ew pir baş dizanin "kontrolkirin" xwedîyê maneya "dana mafê derbasbûna di sînor re" ye. Gumrukvanekî Benapoleê dibêje "li Delhî yan jî li Daccayê esker û efser muzakereyan dikin da ku li vê devera ku weke 'kar tîne' navdar e werin wezîfedar kirin."

Ya ku li ser sînor diqewime êdî ne bi tenê nîşandana hêzê yan jî jesta hewldaneke bi rastî ya kontrolkirina herikîna mal û mirovan a di sînor re ye. Ehsan dibêje "çi komedî ye! Nobetdar di rastîyê de qet dilê wan nîne ku çi dibe bila bibe bisekinînin. Şideta li dijî wan ên bêhêvî yên ku ji ber xizanî û perîşanîya xwe di navbera du agiran de dimînin, nabe ku mirov lê bibihure." Dîwar bi tenê nîşana fizîkî ya xeyala xurt a ji ser xwe ve çûyî ya dewleteke megaloman e. Pêncî salan hewl dan da ku bibin neteweyeke demokratîk û cazib –û ev hemû kirin da ku di dawîyê de vî dîwarî lêbikin?

* Nivîskar, endama ajansa wênesazîyê ya Makotoyê.

(1). Mûçeyê binî rojê 115 rûpî ne.

(2). Hin kesên em rastî wan hatin tercîh kirin ku anonîm bimînin.

(3). Nanê hindî yê bê hevîrtirş.

(4). Xwarineke bengalî ya ji birinc.

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

Di bin avan de

Deltaya Ganj û Brahmapûtrê yek ji deverên herî berdar ên dinyayê ye. Dema ku Hindistanê piştî parçebûnê ji sê paran diduyê erdên xwe yên bi aluvyon ji dest dan, diviyabû bersivê bide û rêyekê bibîne da ku eyaletên Bihar, Haryana, Pêncab û Uttar Pradeşê av bide. Îro ev bernameya hîdrolîkê çemê Ganjê di ser kapasiteyên wê re bi kar tîne, avê jê dikişîne û li seranserê herêmê li ser rêya herika çemî dibe sedema ji destdaneke di asta felaketê de ya erdên çandinîyê. Bi tenê heşt kîlometroyan li bakurê Bangladeşê bendava Farakkayê ev sîhûpênc sal in ku piranîya ava çemê Ganjê yê xurt diherikîne nav çemê Hooghlyê, da ku bendera paytexta Bengala Rojava ango Calcuttayê ji qûmê paqij bike. Para vê projeya bêhesab û bêpîvan a ku serfa avê ya li alîyê çem jê diherike piçûk dît, heye di qedandina rezervên ava tebeqeyên binê erdê û zêdebûna qirêjîya li tevahîya Bangladeshê de. Li gor daneyên koma xebatê ya hindo-bangladeşî ya ku ji bo birêvebirina çavkanîyên avê sala 1972yê hatî damezrandin a bi navê Joint Rivers Commission leza herikîna Ganjê ji sedî pêncî kêm bûye piştî ku Hindistanê av jê girt û bendava Farakka hat ava kirin.

Ne bi tenê avdanî û berguhertina çêm mîqdara avê ya li ber destê Bangladeşê kêm kir, lê belê li hemberî tevahîya hêvîyan, ew herweha berpirsîyarên lehîyan û erozyona kevîyên çem-berjêr in. Kêmbûna ava zindî destûrê nade êdî ku herika avê têra xwe bilez be da ku cihê xwe di binê çêm de çêbike, bi vî awayî rêya herika wê êdî pêş nayê dîtin û ji ber vî jî ewqasî zêde texrîbkar dibe. Ji bo hinan, piştî bertîlxwurîya hûkûmetê, belaya herî mezin a hatî serê welêt erozyon e, ji ber sefaleta li welêt rê li ber vedike. Nifûsa wê ya pir zêde û çandinîya wê ya kêm dikin ku Bangladeş li hemberî rûdanên hîdrolojîk naziktir be. Lêkolîneke bi navê Irrigation Support Project for Asia and the Near East (Ispan) a ku Ajansa Amerîkî ya ji bo Bipêşketina Navneteweyî (Usaid) wê fînanse dike, texmîn dike ku hersal qederê heftê hezar şênîyên wê yên li hewzaya Ganj-Bhramapûtrê neçar dimînin cihûwarên xwe li cih bihêlin. Gelek ji wan penaberî Hindistanê dibin, bi hêvîya ku jîyanake baştir li wir ava bikin. Faharul ê 15 salî jî vê yekê ji me re dibêje: "ez hewl bidim derbasî Hindistanê bibim; erd li wir biîstîqrar e, û derfet jî bêhtir in." Par lehîyekê gundê wî kire du parçe û nêzî şeşsed xanîyî dan ber xwe, birin nav çêm. Dema ku av vekişîya tebeqeyeke ji qûmê li herdeverî bû, û erdên heta hingî berdar jî stewr kirin. Gundîyên Allatoliyê ji hingê ve divê ji vê çolê bibihurin da ku bigihêjin zevîyên xwe û çandinîya nîskan bikin. Kevne-şênîyekî gund ê ku heta niha du caran lehîyên mîna felaketê bi ser de hatine dibêje "ev sûcê Farakkayê ye".

Ji pêncîhûheft rûbar û çemên di sînor re dibihurin yên Bangladeşê pêncîhûçar pêşî di Hindistanê re diherikin. Projeyeke mezin a hîdroelektrîkê ya Hindistanê pêş dibîne bendan li pêşîya çar çemên herî mezin ava bike, bi tenê deh kîlometroyan dûrî sînor. Hîdrologekî pisporê tijîbûna rezervên avên binê erdê Chowdhury Sarwar Jahan bi kurt û kurmancî dibêje "Bangladeş av e; û av jî Bangladeş e. Bendava Tîpaymukh a ku pêş tê dîtin li ser çemê Barak were ava kirin wê tesîrên xirab bike, weke yên ku Farakkayê rê li ber wan vekir. Ez ditirsim ku dîrok xwe dubare bike." Çawa ku dema bendava Farakkayê ava kir, niha jî Hindistan red dike ku bi cîranê xwe re li ser projeyê bişêwire.

E.R.

www.arsivakurd.org

Sefîrê rûs ê li Qabîlê li ser pirsa vekişîna pêşdîtî ya sala 2014ê ya eskerên rojavayî ji Afganistanê, nikarîbû bi xwe û li ezmûna – û şaşiyên – Yekîtiya Sovyetê yên salên 1980yî fikirî. Lê belê beriya bi sîh salan vî kesî xwe disipart tevgereke komunîst a xwecihî. Ev tevgera serhişk û parçebûyî tevlîbûna Moskovê veguherand şerekî kujer.

25 SAL BERÎYA AMERÎKÎYAN VEKIŞÎNEKE DIN A BÊ SERKETIN

Vegera li ezmûna komunîst a li Afganistanê

CHRISTIAN PARENTI *

Li çayxane û dezgehên kolanên Qabîlê mirov carinan portreyên mêrekî cidî yê rûglover, portarî û bisimbêl dibîne. Ev rûyê Muhemed Necîbullah, ango serokdewletê dawî yê Afganistana komunîst e. Necîbullah ber bi dawîya salên 1960ê ve tevlî nav refên Partîya Demokratîk a Gel a Afganistanê (PDGA) bû, polîsê veşartî yê pir xurt birêxistinkirî yê Afganistanê KHAN bi rê ve bir, û sala 1986ê bû serokdewletê welêt. Piştî ku Yekîtîya Sovyetê ji Afganistanê vekişîya Necîbullah sê salan dev ji desthilatdarîyê berneda. Di dawîyê de şervanên Talîbanê sala 1996ê ew kuşt.

Dema ku min carinan ji efxanên li Qabîlê pirsa poster û kartên postê yên Necîbullah dikir, bersivên wan ji "ew serokdewletekî xurt bû – hingê artêşeke me ya bihêz hebû" heta bi "her tişt baş dixebitî û Qabîl paqij bû" diguherîn. Xwedîyê çayxaneyekê, awayê belav ê navê wî bi kar tîne û bi tênê dibêje "Necîb şerê Pakistanê kir". Mirov bi rengekî din bibêje, mirov wî zêde weke sosyalîstekî bi bîr naînin –ji bo gelekên li Afganistanê peyveke zelûl e– lê belê wî weke modernkerekî û welatparêzekî bi bîr tînin.

Ji bo ku mirov li statuya Necîbullah ya weke semboleke piçûk serwext bibe, bi kêr tê ku mirov haydar be ji ezmûna Sovyetê li Afganistanê – stratejî û taktîk, teror û êş, û îdeal û armancên ku komunîstên efxan û hevgirên wan ên sovyetî motîve dikirin. Yek ji bisporên xwedî gotin ê li ser mijarê Rodric Braithwaite e. Dinyadîtîyekî dîplomasîya serdema şerê sar e, ku di dema hilweşîna Yekîtîya Sovyetê de weke sefîrê brîtanî li Moskovê wezîfedar bû. Wî hê nû vegotineke bêqusûr û sempatîk li ser êrişa eskerî ya rûsan û dagîrkerîya Afganistanê weşand. Pirtûka bi navê *Afgantsy* ku sernavê wê ji nasnavê rûsî yê ji bo xazîyên şerê Afganistanê tê, panjehreke hişyar û bi tevazûn e li dijî propaganda û xapandina ku Braithwaite bi xwe jî bivênevê weke dîplomatekî brîtanî yê li USSRê aşê wê digerand. Ev xalek e ku ew jî bi awayekî neyekser di pirtûka xwe de qebûl dike, lê belê di hevpeyvînan de bi awayekî yeksertir behsa wê dike. Dema ku wî *Afgantsy* dinivîsî, heta mirov bibêje bes derîyên arşîvên hukûmetê li Rûsyayê û aktorên kilît ên şerê sovyet-efxan li Braithwaite vekirî bûn, û ji bo ku hûrûkûrtir lê bikole çû Qabîlê jî.

Jonathan Steele yê ku demeke dirêj nûçegihanê *The Guardian*ê bû di pirtûka bi navê *Ghosts of Afghanistan* (*Reşeyên Afganistanê*) de behsa beşeke mezin a heman serpêhatîyê dike. Steele di nav sîh salên derbasbûyî de gelek caran çû Afganistanê, nûçe gihandin der barê destwerdana Sovyetan, serdema Necîbullah, xirabbirêvebirina mucahidînan, şerê navxweyî, desthilatdarîya Talîbanê û dagîrkerîya amerîkî de. Steele jî weke Braithwaite baş bi rûsî dizanî; ew herweha endamê koma *The Guardian*ê bû ya ku belgeyên nepenî yên WikiLeaksê ji weşanê re amade dikir. Agahîyên wî yên der barê Afganistanê de pir kite bi kite ne û mirovî serwext dikin. Ew awirekî ji bo detayan ê rojnamevanîyê û yekî ji bo çarçoveyê bi awayekî zanistane dirêj têkel hev dike. Vegotina Steele li ser fenomena Talîbanê û dema niha de zexm e, lê belê pirtûka wî herî zêde dema ku dîroka jibîrbûyî ya komunîzma efxan û dagîrkerîya Sovyetê analîz dike bandorker e.

Sovyetan li ser erdên xwe yên sînor ên Asyaya Navîn di dema şerê navxweyî de di destpêka salên 1920ê û paşê dîsa di destpêka salên 1930î de şerê serhildêrên misilman kir, di dawîyê de wan bi alîkarîya Artêşa Qraltîyê ya Efxan karîbû wan serhildêrên ji wan re *basmaci* (cerd) dihat gotin, bişkînin. Lewma îstîqrara li Afganistanê weke kilîta ewlekarîya li Asyaya Navîn hat dîtin. Ji destpêka salên 1950yê û pêve Afganistan yek ji wan çar welatan bû ku herî zêde alîkarîya Sovyetan distand. Moskovê muhendîs şandin Afganistanê û ji bo perwerdeyê xwendekar, teknîsyen û efserên efxan vexwendin Rûsyayê.

«Karûberekî bi bayê bezê lihevhatî anîn»

Ber bi dawîya salên 1950yê ve Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê jî dest bi veberhênana li Afganistanê kir û pêre jî pêşbazîyeke alîkarîyê ya di navbera hêzên super de da dest pê kirin. (1) Rayedarîya Gelîyê Helmandê ku bi xwe weke projeke piçûk a TVAyê [Tennessee Valley Authority] ye, ji bo bendavan deyne ber ava çemê Helmandê hat saz kirin û armanca wê ew bû ji bo herêmên çolî yên başûr hîdroelektrîkê dabîn bike û avdanîyê mumkin bike. Ev proje hewldaneke amerîkî bû. Tunela Derbenda Salangê, yek ji tunelên herî bilind ên dinyayê ye, bakurê Afganistanê bi başûrê wê ve girêdide; ew jî projeyeke rûsan bû. Her du hêzên super her yekê beşek ji sîstema rêyên bejahî ava kirin. Binesazîya balafirgeha Qabîlê ji alîyê rûsan ve hat ava kirin, sîstemên wê yên elektronîk, yên ragihandinê û radarên wê jî amarîkayê hatin îtxal kirin. Dibe ku li dijî aqlê maqûl ê giştî be, belê hin efserên li USSRyê hatin perwerde kirin di dawîyê de bûn lîderên mucahidînan: yek ji wan Îsmaîl Xan bû ku li Heratê sala 1979ê serhildan da dest pê kirin. Hin ji întelektuelên DYAyê ew perwerde kirî, bûn komunîst û rayedarên hukûmetê, yên weke serokwezîr Hefîzullah Emîn.

Darbeya eskerî ya komunîst a sala 1978ê encama neyekser ya darbeyeke berîya wê bû ku xelayê rê li ber vekiribû. Ji sala 1969ê û pêve Afganistan kete ber çerxên hişkesalî û birçîbûneke dijwar a gelek salan kişand. Sala 1973yê dema ku li Afganistana navîn li herêma Xorê xelk ji birçîna mir, General Muhemed Dawud li dijî pismamê xwe qral Muhemed Zahir Şahî darbeyek bi rê ve bir; bi vê darbeyê dawî li monarşîyê anî, hukûmeteke komarger damezirand û bi xwe jî bû serokê wê. Qral berê, Dawudê demekê hêzdar bû, marjînal kiribû, û li dijî xelayê jî tu tiştê nekiribû. Dawud çawa bû desthilatdar rêzek siyasetên aborî bi rê ve birin ku hingê standard bûn; ji bo afirandina pîşesazîyeke taybet û bazarên hundir plansazî û veberhênanên dewletê bi kar anîn. Wî bi dijminên xwe yên siyasî –îslamîst û komunîstên dijberê hev – re bi têkelkirina zextê û wezîfedarkirinê muamele kir. Lê belê zexta zêdebûyî îslamîstên mîna Ehmed Şah Mesûdê tacik û Gulbuddîn Hekmetyar ê paştûn çekdar kirin û mişextî Pakistanê kirin.

Zext her weha bû sedema darbeya eskerî ya xwînrij a sala 1978ê jî. Jonathan Steele ji bo wê wisa dinivîse, "ew karekî bi bayê bezê li hev hatî anîn bû" (2) ya ku kuştina rayedarekî payebilind ê xelkê hez jê dikir ê bi navê Mîr Ekber Xîber ew da destpêkirin. Alîgirên PDGAyê çalakîyeke protestoyê ya girseyî organîze kirin ku rê li ber dorgirtineke polês vekir. Efserên ji komkujîyekê tirsîyan bi ser qesra serokdewletî de girtin, Dawud kuştin û dest danîn ser desthilatdarîyê.

Braithwaite dinivîse ku rayedarên Sovyetê, yên bi navenda KGByê ya li Qabîlê jî di nav de, dîyar bû xafil bûn û "bi awayekî aşkere dilnerehet bûn li ser tişta qewimî". Li gorî rûsan ne Afganistan ji sosyalîzmê re amade bû, ne jî PDGA ji birêvebirinê re amade bû. Bi awayekî krîtîk, PDGA ji du parçeyên bi dijwarî dijberê hev pêk hatibû. Beşa mezin, ya ku bi awayekî bisebr û bisemax radîkal ya bi navê Xelq (bi maneya "netewe") darbe pêk anî. Xelkê paştûnaxêv ê ku berîya demeke kurt ji bo kar peyde bike yan jî bixwîne hatibû bajaran, destek dayê. Beşa piçûktir a nermtir a bi navê Perçem (bi maneya "drewşê") xwe disipart çînên navîn ên bajarî ên darîaxêv a bêthir sazîbûyî.

Destpêka hukimdarîya Xelqê xwînrij bû. Di nav de du kevne-wezîr jî çil general û hevgirên siyasî yên Dawud bi lez û bez hatin îdam kirin. Di nav kuştî, girtî û wendakirîyan de wekî din îslamîst, maoîst û heta endamên baskê Perçem ê PDGAyê jî hebûn. Bi zêdebûna şidetê re fikarên Sovyetan jî zêde bûn. Belê, hukûmeta Xelqê bi herhalî rêzeqanûn û bernameyên pêşverû qebûl kirin, yên ku zewaca zarokan qedexe kirin, cihazê bûkê kêm kirin, li gundan îpotek betal kirin, ji bo jin û mêran kampanyaya xwendebûnê dan dest pê kirin (tevî ku her kom cihê dihat perwerde kirin jî) û reforma erdan pêk anîn. Bi herhalî, çiqasî niyeta wan baş be jî gelek ji van hewldanan pir kêm û lawaz hatin bi rê ve birin, û bi lez derbeke berepaş li pey hat. (3)

Rayedarekî kevin ê komunîst Saleh Muhemed Zearî yê ku Steele heta bi avahîyeke pirqatî a mutewazî ya nêzî balefirgeha Londonê Heathrowê şopa wî bir, berxwedanê weha rave dike: "Gundî di serî de şa bûn, lê belê dema ku fêr bûn em komunîst in, hingê guherîn. Herkes li dijî me bû. Bi ya wan me ji Îslamê bawer nedikir, û ew ne şaş bûn. Wan dikarî bibînin ku em nimêj nakin. Me jin ji dana pereyê cihazê bûkê rizgar kirin, û bi ya wan me ji hezkirina azad bawer dikir." Zeary heta sala 1992yê mucahidîn bûn desthilatdar li Qabîlê ma. Dema ku van eskerên Xwedê jina wî û du zarokên wî qetil kirin, di dawîyê de ew ji welêt revîya. Kevne-rayedarekî din ê PDGAyê yê li Londonê dimîne ji Steele re got "[lîderên partîyê] li desthilatê dixwest nexwendetîyê di nav pênc salan de tine bikin. Kenê mirovan pê dihat. Reforma erdan nedihat hez kirin. Wan biryarên ji wan re yên şoreşgerî dihat gotin, distandin û dixwestin bi darê zorê wan pêk bînin. Civak ne amade bû. Bi xelkê nehatibû şêwirîn." Steele dinivîse ku tevî ku ev rayedarê payebilind ê PDGAyê bi salan dikarîbû bigihêje mîqdarên mezin ên pereyên dewletê jî, tu nîşan li wî dîyar nedîbûn ku wî gelek ji wî pereyî dizîbin, ew jî heke dizîbin.

Reformên PDGAyê yên bi bayê bezê sêwirandî zaiyateke cihêtîyeke kevin a civaka efxan a gundî-bajarî bû. Îdealîstên ciwan ên bajarî yên perwerdebûyî ji cîhana gundan a ku dixwestin ji nû ve çêkin, fêm nedikirin, û cîhana gundên dîwarên xanîyên wan ji kerpîçê jî ji karmendîtîya bajarî fêm nedikir. Alîyê civakî û çandî yê reforman tehlûke bû ji bo îmtiyazên mollayên ji rêûresmê, *malîk*an (mezinên gundan) û xwedîyên erdên mezin, û ev yek ne ecêb e. Ya ku serê mirov tevlîhev dike ew e ku gundîyên pir zêde dîndar alîyên di warê aborî de pêşverû yên bernameyê jî red kirin. Tevî ku xizan û neadil jî bû, newekhevîyeke milk a radîkal a mîna li Meksîka û Çîna berîya şoreşê, mohra xwe li Afganistanê nedabû. Çawa ku Steele rave dike, gundî ji gelek alîyan ve "bi girêdanên dînî, eşîrî û malbatî girêdayî xwedîyên erdan bûn û ne amade bûn li ber hukmê wan rabin." Civaka gundan timî bi rengekî xweser bû ji Qabîlê, û reform ji koka xwe re weke tehlûke hîs dikir, lewma ji her çû bêthir berê xwe da berxwedana çekdarî, bi partîyên îslamîst re yên ku di serdema zexta Dawud de çûbûn Pakistanê, bûn yek.

Ya ku rewş ji bo PDGAyê kir mîna agir hin şaşîyên teknîkî bûn. Di nav leza xwe de komunîstên bajarî yên Qabîlê erd ji nû ve leva kirin, lê mafê avê ji bîr kirin, ev şaşîyek bû ku nezanîya wan a der barê çandinîya xwecihî de li wan aşkere dikir. Wan sîstema zextkar a bideyndayîna pereyan a xwe disipêre bazarê betal kir, lê belê sîstemeke alternatîf a kredîyê bi cih nekir da ku di warê pereyê pêşîn de alîkarîya cotkarên xizan bike. (pirtûka Raja Anwar a bi navê *The Tragedy of Afghanistan / Trajedîya Afganistanê* çavkanîyeke din a hêja ye der barê reformên şoreşê û gavên wê yên şaş de.) Sovyetan bi xwe pircarî şîret li Qabîlê kirin ku dev ji reformên radîkaltir berde, yan jî wan bi paş ve bixe. Komunîst ne modernkerên pêşî bûn ku derbeke berepaş ji gundan xwaribûn. Amanullah Xanê ku jê re Mîrê Sor dihat gotin, û brîtanî sala 1919ê ji Afganistanê kirin der, deh salan piştre ji text hat xistin, ji alîyê raperîneke eşîrî ya li dijî hewldanên modernkirinê yên ji Tirkiyê îlhama xwe girtibûn.

Xweşkirina dil û mejiyan

Wî bi tenê piçek reforma erdê ferz kiribû, mafê dengdayînê dabû jinan û dest bi perwerdekirina jinan kiribû. Elîtên herêmên gundewar hez dikirin rêyên baş qebûl bikin, lê red dikirin ji bo çêkirina wan bacan bidin; girseyên herêmên gundewar başkirinên di çandinîyê de û perwerde qebûl dikirin, lê êrişeke li dijî baviksalarîyê red dikirin. Pêncî salan piştre PDGA bi heman çarenûsa serhildana dînî re rûbirû bû, û kir ku efserên komunîst dest pê bikin xwe weke ku bawermend bin nîşanî raya giştî bidin, nimêj kirin û çûn mizgeftan. Lê belê ev hindik bû û dereng bû. Krîz di adara 1979ê de bi îsyaneke eskerî ya topyekûn fûrîya, efserên îslamîst ên li Heratê, bajarekî mezin ê li ser sînorê Îranê, ev îsyan bi rê ve dibirin. Bêguman daxwaza serhildanê di nav efserên dîndar de ji ber bûyerên li welatê cîran sor bûbû: Şah ji Îranê revîyabû, û Xumeynî jî bi tenê berîya mehekê vegerîyabû Tehranê.

Lêkolîna Braithwaite îşaret pê dike ku serhildan û tepisandina wê bi destê eskerîya efxan a bi alîkarîya pîlotên sovyetê, ne weke ku pirî caran gotegota wê tê kirin xwînrij bû: "Tevî ku çapemenîya rojava û hin dîrokzanên rojavayî hê jî îdîa dikin heta bi sed welatîyên sovyetê hatibin qetil kirin jî, hejmara giştî ya kuştîyên sovyetan xuya ye ji sisêyan ne zêdetir bû." Jixwe bajar jî bi tevahî nehatibû bombe kirin, bi hezaran kes jî di encamê de nemiribûn.

Piştî Heratê garnîzonên din jî serî hildan, û Sovyetan hem bêthir şewirmend şandin Afganistanê, hem jî ji bo tevlîbûna di asta herî jor de a hêzên bejahî dest pê kirin

www.arsivakurd.org

planên muhtemel çêkirin. Wê havînê serhildêrên mucahîdîn ji Pakistanê êriş li dijî hêzên hukûmetê û binesazîyên dewletê pêk anîn.

Di heman demê de nakokîya di nav PDGAyê de xirabtir bû, newekhevîyên îdeolojîk û şexsî rê li ber pevçûnên di navbera baskên Xelq û Perçemê de vekirin û heta bûn sedema şideta di nav baskê Xelq bi xwe de jî. Îlona 1979ê serokdewlet Nûr Muhemed Terekî bi textekî xewê ve hatibû girêdan û bi balgehekî hatibû fetisandin: Fermana kuştinê reqîbê wî û hevrêyê wî yê di nav baskê Xelq de serokwezîr Hefîzullah Emîn dabû. Serokatîya Sovyetan ji her du lîderan Terekî weke nermtir didît û kuştina wî kir ku hêrsa wan gelekî rabe. Li Kremlînê paranoyaya heyî jî zêde dibû. Di salên 1960ê de Emîn ji bo PhDyekê li zanîngeha Columbiayê xwendibû, li wir ew serokê yekîtîya xwendekarên efxan bû û gotegot derbarê wî de hebûn ku bi CIAyê re be. Steele dinivîse ku hatiye weşandin ku Emîn lê mikur hatiye berîya şoreşê pere ji CIAyê stendibin. Braithwaite bi xwe dibêje, sefîrê Dewletên Yekbûyî Adolph Dubs bi xwe piştî gelek civînên bi Emîn re, ji CIAyê pirsîye ka gelo ew têkilîyeke wan bû. Ya bêhtir muhtemel ew e ku Emîn rêya ku rêûresm e ji tevahîya lîderên efxan re daye ber xwe: Birêvebirina dewleteke tampon û rêveçûna di navbera hêzên mezin de.

Di sala krîzê ango 1979ê de hukûmeta komunîst a efxan sêzdeh caran daxwaza desttêwerdana eskerî ya sovyetî kir. Moskovê bi xwe tevahîya sedemên di cih de yên ji bo wezîfedarnekirina hêzên bejahî ji wan re gotin. Rayedarekî sovyetê weha rave kir: "Me bi dîqet tevahîya alîyên vê kirinê kola û gihiştin wê encamê, heke esker werin wezîfedar kirin, rewşa li welatê we ne ku wê bi tenê baştir nebe, lê belê xirabtir bibe". Lê belê dîyar e ku kujerê Terekî fikra Sovyetan guhertiye.

Artêşa 40. veguheztin başûr, û dema ku ew di dawîya sala 1979ê de li Afganistanê çalak bû, wezîfeya wê ne destekkirina Emîn bû, lê belê kuştina wî bû. Hêzên Taybet ên Sovyetê bi ser qesra serokatîyê de girtin, û di şerekî sîlehan ê dirêj ê xwînrij ê ode bi ode de, wan di dawîyê de serokdewlet xist quncikê û ew kuştin. Lîderê şûngir ê ku Sovyetan neqandî Babrek Karmal bû, bi xwe ji baskê nerm ê PDGAyê Perçemê bû. Cirnexweş, bêbiryar û paranoîd bû, û vexwarina zêde ya alkolê jî bi tenê li bêkêrîya wî zêde dibû. (Heke Karmal weke Hamîd Karzaîyê ku li gor gotegotan narkotîkan bi kar tîne, xuya dike, em bibêjin ev bi tenê yek ji wan tiştên dişibin hev e ku xwendekar wê di pirtûka Braithwaite de bibîne.) Di destpêkê de Moskov û Washington jî difikirîn ku desttêwerdan bi tenê şeş mehan dewam bike, û gelê efxan, qet nebe beşa wê ya bajarî ji desttêwerdana rûsan û dawîya harbûna Emîn kêfxweş bû.

Bi eskeran re Sovyetan pêleke sîvîl a şêwirmend û teknîsyenên îdealîst ji şand Afganistanê. Lê belê piştrast bû ku Karmal di bidestxistina dilsozîya misilmanên gundan de bêkêr e, bi vî awayî kapasîteya dewleta efxan sînordar ma. Ji bo ku rewşê xirabtir bike, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê ji tîrmeha sala 1979ê ve heft partîyên mucahîdînan çekdar dikirin. Alîkarîya nepenî ya mezin a Dewletên Yekbûyî dida, CIAyê dabû dest pê kirin; Hukûmeta Erebistana Sûûdîyê ev alîkarî bi merdî fînanse dikir û Îstîxbarata Nav-Sazîyan a Pakistanê a her diçû hêzdar dibû jî bi hesûdî bi rê ve dibir. Gelek dem di navê re derbas nebû, rûs di şerekî de teqinîn û bist bûn ku wê neh sal dem lê biçûya da ku bi dawî bikin.

Gelek eskerên Sovyetê ji dil bawer dikirin ji "erka xwe ya navneteweyî", çawa ku dildarên eskerî yên amerîkî îro pir caran şerê xwe yê li Afganistanê weke alîkarîya welatekî paşvemayî û bi tehlûkeyeke bi rastî ya terorîst re rûbirû, dibînin. Û weke hevpîşeyên xwe yên amerîkî îro, eskerên bêpaye yên Sovyetan li Afganistanê bi koka xwe para bêhtir yan ji çîna karker bûn, yan jî ji gundan û bajarokan bûn. Mêrên (û hin jinên) ji çînên pîşeyî û ji malbatên têkildarî partîyê yên li bajarên mezin ên rojavayê Rûsyayê jî li nav hêzên hewayî, KGB û yekîneyên tibbî hatibûn belav kirin, lê belê pir kêm caran di nav eskerên bê tecrûbe yên ku li bendê bûn bi guleyan werin kuştin dema ku karwanên malzemeyan dibin, yan jî li xetên sirtan ên zuwa werin veşartin. Esas ê şer dikirin kurên ji gundan û ji bajarên piçûk ên fabrîkeyan bûn.

Armanca bi rastî ya Artêşa 40. ew bû ku xwe bide hez kirin û qebûl kirin. Lê belê ev ê neqewimîya. Dema ku hêzên bejahî yên Sovyetan û hukûmeta efxan di cihê xwe de asê man, hêza hewayî û top ketin dewrê, û heke mucahîdînan ji nav gundan gule dibarandin, hingê ev gund hatin bombe kirin û xira kirin. Braithwaite tevahîya nûçeyên derew ên şerê sar ên li ser rûsên ku xefkên booby bi cih dikin yan jî sîlehên kîmyewî bi kar tînin, derew derdixe. Berevajî nûçeyên çapemenîya rojavayî ya salên 1980yê belav dikir, hovîtîya Sovyetan li dijî sîvîlan ne niyeta siyasetê bû, lê belê bandora wê ya nexwestî bû ya ku mirovî dikarî pêş bibîne û nabe mirov lê bibihure. Lê belê nementiqîbûn û nakokîyên dijserhildêrîyê hê wêdetir jî çûn. Sovyetan bi sedan eskerên xwe ji ber gunehên ji destavêtinê û kuştinê heta bi bikaranîna narkotîkan, dizîya piçûk û zordarîyê (pirsgirêkeke xwegirtî ya artêşa rûs e ku ji serdema çaran heta roja me ya îro hatiye) dadgeh kirin. Dîsa jî wan nedikarî yan jî nedixwest karên xirab ên KHADê kontrol bikin: Hukûmeta PDGAyê qederê 8.000 efxanî îdam kirin, gelek hezarên din jî kirin girtîgehan û zilm li wan kirin.

Li gor Braithwaite, efxan bi giştî rûsan weke eskerên ji amerîkîyan baştir dibînin, dibe ku sedem bi tenê kêmtir bîîhtiyatbûna wan, kêmtir zirîpûşbûna wan û ji gelek alîyan ve di warê çandî de nêzîktirbûna wan ên efxan be. Ji *Afgantsy*ên ji wan hat vegerin malê, hin ji wan têra xwe baş xwe li jîyana normal anîn, lê belê hinên din bîranînan dev ji wan berneda, şerê mubtelatîya narkotîkan û alkolê kirin, û yên ku di warê fizîkî de seqet mayî jî di şerên bêdawî yên bi burokrasîya tibî de teqinîn. Xazîyên şer herweha li bereya malê dîtin ku gelek welatî êdî ji nûçeyên şerekî weke bêmane xuya dike, her diçe bêhtir aciz dibin.

"Xwînrij" li dijî muzakerevanan

Dema ku Gorbaçev bû desthilatdar sala 1985ê, serokatîya Sovyetê her diçe bêhtir tercîh dikir ji Afganistanê vekişe. Kampanyayeke bêdeng belê berfireh û biisrar a nivîsandina nameyên dijberî şerî ya malbatên eskeran, xazîyan û heta hin efserên wezîfedar kir ku Moskov berê xwe bide vê encama bivênevê biqewime. Bayê perestroyka û glasnostê (4) wê bihata û li Afganistanê Necîbullahê nû hatî wezîfedar kirin jî ji Marksîzm-Lenînîzmê bi dûr diket û nêzî tiştekî bêhtir dişibîya neteweperestîyeke pragmatîk dibû. Sala 1988ê Necîbullah navê PDGAyê guherand û kir Wetan ango welat. Heta ber bi dawîya hukimdarîya xwe de ew lê fikirî ku wezîfeya wezareta parastinê pêşnîyazî fermandarê mucahidînan Ehmed Şah Mesûd bike.

Ev gavên ku bi çûna Karmal û hukimdarbûna Necîbullah dest pê kirin, hemû parçeyek ji siyaseteke fermî ya bi navê Lihevkirina Neteweyî bûn. Artemy Kalinovsky di pirtûka xwe ya bi navê *A Long Goodbye (Xatirxwestineke Dirêj)* de gelekî baş behsa alîyên dîplomatîk ên van hewldanên dawî yên ji bo îstîqrarê dike. Kalinovsky weha dinivîse: *"Ji sala 1985ê heta sala 1987ê siyaseta Moskovê ya Afganistanê ew hewldan bû ku dixwest şerî bi dawî bîne bêyî ku têkçûnê erê bike... Gorbaçev jî hema hema bi qasî yên berîya xwe serê xwe bi wê zirarê diêşand ku vekişîneke bi lez û bez dikare zirarê bide prestîja Sovyetê, nexasim jî li nav hevkarên wî yên li Dinya Sêyemîn. Dîsa jî Gorbaçev zend û bend vemaliştibûn da ku dawîyê li şerî bîne, û piranîya piştgirîya mekteba xwe ya siyasî jî stendibû jî bo ku vê bike. Maneya vê ew bû ku li nêzîkatîyên nû bigerin da ku li Qabîlê rejîmeke dikare li ser xwe bimîne bi peş bixin, a ku dikarî piştî vekişîna eskerên Sovyetan jî dewam bike."* (5)

Ji bo ku Livehkirina Neteweyî bi kêr were, hevkarîya bi patronê sereke yê mucahidînan re ango Dewletên Yekbûyî re şert bû. Kalînovsky beşeke temam ji hevdîtinên di navbera Dewletên Yekbûyî û Sovyetê li ser Afganistanê re vediqetîne. Ji bo Afganistan û Sovyetan mixabin bû ku birêveberîya Reagan di navbera "şantajker" û "ticar"an de bûbû du beş. Li qonaxekê êdî wezîrê karê derve yê amerîkî George Shultz "ticar"ekî navendî bû û fikra wî ew bû ku diviyabû ew di nivê rê de êdî bigihin Sovyetan, ticaran weha bawer dikir: Heke Artêşa Sor ji Afganistanê vekişe, Dewletên Yekbûyî jî diviyabû alîkarîya dide mucahidînan qut bike. Li alîyê din şantajkerên bi giranî li nav CIAyê û "lobîya efxan" a di kongreyê de cihê xwe digirtin, agir bi wan ketibû ji bo bêhtir xwînê û bi israr bûn ku alîkarîya ji mucahidînan re bi tenê heke tevahîya alîkarîya ji hukûmeta Necîbullah re were rawestandin, raweste. Di dawîyê de şantajker bi ser ketin. Bi awira ji Moskov û Qabîlê, helwêsta birêveberîya Reagan "bi tevahî nekoperatîf" bû.

Sibata 1989ê, tanka dawî ya Sovyetan dawîyê li bakur di ser Pira Dostanîyê re ji çemê Amu Derya bihurî. Lê belê Moskovê alîkarîya ji Necîbullah re dewam kir, û hukûmeta efxan hêvîyên herkesî şikandin. Di adara sala 1989ê de eskerên efxan êdî bi tena serê xwe dorgirtineke mezin a mucahidînan li bajarê Celalabadê şikandin, li rojavayê Nangarharê ne dûrî sînorê bi Pakistanê re. Heke serhildêran ev bajar bixista, Qabîl wê bibûya hedefa wan yan piştre. Piştî hingê heft partîyên mucahidînan parçebûyî û, tevî taktîkên xwe yên super ên qada şer jî di warê stratejîk de jî hevnegirtî man.

Braithwaite dinivîse ku Eduard Shevardnadze – yê ku nedixwest bibe yekemîn wezîrê karê derve yê ku kontrola şkestinekê di destê wî de be– şampîyonê mezin ê Necîbullah bû, wî israr dikir ku bi herikîna birêkûpêk a sotemenî û sîlehan, efxan dikarin heta hetayê şer bikin. Ya rastî Necîbullah sê salên din jî xwe girt. Lê belê dema Yeltsin, Gorbaçev da alî û USSR ji hev ket, lûleya jîyanê ya Afganistanê qut bû.

Xwe noq kirin nav tarîtîyê

Rewş weke ku gelek caran tê îdîa kirin nîne, şikestina Sovyetê li Afganistanê nebû sedema rûxîyana USSRyê. Ya rastî berevajîyê vê bû. Çawa ku *The Economist*ê berîya demeke kurt rave kir, *"sîstema Sovyetê rûxîya dema ku rayedarên herî paye bilind biryar dan ku îmtiyazên xwe 'veguherînin pereyan' û wan bikin milk."* (6) Çawa ku ev qewimî û Yeltsin bû desthilatdar, rejîma Necîbullah hilweşîya. Braithwaite dinivîse ku Yeltsinê hê nû bûyî serokê Rûsyayê, û berîya ku Gorbaçev bikeve û Yekîtîya Sovyetê hilweşe, bi kanalên veşartî xwe gihandiye mucahidînan. Çawa ku herika malzemeyên rûsan qut bû, generalekî kilît ê Necîbullah, Reşîd Dostum revîya alîyê serhildêran. (7)

Di nîsana 1992yê de di dawîyê de zora Necîbullah hat birin û ew ji desthilatdarîyê hat xistin. Çeteyên cihê yên şervanên pîroz û neteweperestên etnîk daketin Qabîlê. Piştî ezmûneke pir kurt a birêvebirina bi hev re, parçeyan dest bi şerê hev kir, di heman demê de bermahîyên dawî yên PDGAyê yan ji welêt revîyan, yan jî xwe veşartin.

Necîbullah hewl da bireve, lê belê zilamên Dostum nehiştin ku bigihêje balefirgehê. Di nav çar salên piştre wê Qabîl daketa nav barbarîzmê, bendên cihê yên mucahidînan şerê hev dikir û hem tarîtîya mecazî û hem jî ya bi rastî anîn bajêr: Lempeyên kolanan û xetên elektrîkê yên otobosan hatin talan kirin; xizmeta dewletê rawestiya; şerê di navbera bendên cihê de nîvê bajêr xira kirin; û li gor texmînan piranîya wan sîvîl 100.000 mirov hatin kuştin. Di vê navberê de Necîbullah xwe spartibû avahîya Neteweyên Yekbûyî. Dema ku Talîbanê di dawîyê de bajêr kir destê xwe sala 1996ê, wan bi qirpika kevne-serokdewlet girt, lê xistin, êşkence lê kirin û ew xesandin, û paşê bi gulebaranê kuştin. Laşê wî li kolanan hat kaş kirin û bi stûnekî lempeyeke kolanê ve hat daleqandin.

Van rojên ku hêzên NATOyê Afganistanê dagîr dikin, hê jî çend wêneyên Necîbullah li Qabîlê daleqandî ne. Çima? Lewma, hingê ne weke îro bû, şer bi tenê di navbera dagîrkeran û efxanan de nebû. Ew di heman demê de şerekî di navbera efxanan de jî bû: Di navbera xelkê bajaran ê piştgirê modernkirinê, heta modernkirina bi darê zorê û yê li gundan ê bi dijwarî dijberê her şêwazê guhertina civakî de. Û her hêzê hevgirtinek bi palpiştên xurt ên ji derve ve çêkiribû. Di dema şerê sar de Sovyetan destek da Qabîlê, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Pakistanê bi xwe destek da serhildêran. Îro ji ber rêzek sedemên faşî Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê destekê didin wan kesên çavên wan li damezirandina dewletê li Qabîlê (gelek ji wan heman kes in ku di dema Necîbullah de wezîfedar bûn), Pakistana ne jixweve hevgira Amerîkayê ye û zeameta wê ya hîmdar e, hê jî destekê dide serhildêrên dîndar û rêûresmparêz.

Çîneke efxanên bajarî heye, yên ku ji bo wan pirsa siyasî ya sereke timî ev bû: Gelo ev îdeolojî bi elektrîkê hat? Ev ew kes in ku xwestin ferman û hêza Qabîlê li gundan jî belav bikin, û ji destpêka salên 1920ê û vir ve timî bi muxalefeteke dijwar û bi şidet re rûbirû bûn. Wextekî navgîna wan monarşîya destûrî bû. Paşê komareke bi serokdewletîyê bû, paşê sosyalîzma bi şêwazê Sovyetan bû, û piştre jî neteweperestîya Necîbullah a çareya dawî bû. Niha jî ezmûna pir zêde bi kêmûkurtî ya demokrasîya lîberal e, ku NATO ferz dike. Mirov şaş nabe dema ku dibîne komunîstên berê hê jî modernker in û dikarin di nav tevahîya beşên bikêrtir ên sazîya navê hukûmeta efxan lê kirî de werin dîtin.

Yek ji van teknokratan Muhemed Henîf Etmar e. Ji sala 2002yê heta 2010ê pir rêza wî tê girtin û di hukûmeta Karzaî de bi dorê gelek wezîfeyên wezîrtîyê girtin, ji bipêşxistina gundan heta bi wezîrtîya perwerdê û herî dawî jî bû wezîrê karê hundir. Di ciwanîya xwe de Etmar endamekî Hêzên Taybet ên KHADê (weke KGBê, baskekî eskerî yê polîsê veşartî yê efxan jî hebû) bû. Wî yek ji lingên xwe ji dest da dema ku li dijî dorlêgirtina bajêr bi destê mucahidînan Celalabad diparast. Dema ku hukûmeta Necîbullah ket, ew çû Brîtanyayê da ku bixwîne. Piştî dagîrkerîya DYAyê ew vegerîya Qabîlê û bi lez û bez bi nav û deng bû weke birêveberekî bikêrhatî û durist, "yekî ku Rojava dikare pê re bixebite." Birêveberîya Neteweyî ya Ewlekarîyê ya ku xelîfê KHADê ye îro ewqas pir kadroyên kevin ên Perçemê tê de cih digirin ku gelek kes weke KHADê navê wê hildidin. Yekî din ji van teknotratên PDGAyê Zahîr Tanîn e. Halê hazir nûnerê daîmî yê Afganistanê ye li Neteweyên Yekbûyî, salên 1980yê wî di Komîteya Navendî ya PDGAyê de cihê xwe digirt.

Kurt û kurmanc ji ber vê yekê ew hê wêneyên Necîb li Qabîlê didaliqînin –lewra tevî şaşîyên wî jî, fikra wî bi elektrîkê hatibû. Lê belê mixabin, elektrîk nikare bi şer were gihandin.

* Rojnamevan. Versiyoneke vê gotarê di *The Nation* (New York) de hat weşandin, gulan 2012.

(1) Vê gotara li jêr bixwîne: René Vermont, "L'afghanistan face à l'URss et aux etats-Unis / Afganistan beramber URSS û Dewletên Yekbûyî", *Le Monde diplomatique,* tebaxa 1967ê, heye li ser DvD-RoM a arşîvên *Le Monde diplomatique,* 1954-2011, www. mondediplomatique. fr/t/dvdrom

(2) Ev gotar xwe disipêre agahiyên di du pirtûkan de; ya pêşî ya Rodric Braithwaite ya bi navê *Afgantsy* ye; Braithwaite sefîrê brîtanî yê li Moskovê bû di navbera 1988-1992ê de: *The Russians in Afghanistan, 1979-89 / Rûs li Afganistanê,* oxford University Press, 2011, û ya diduyan a kevne-rojnamevanê *The Guardian*ê Jonathan Steele a bi navê *Ghosts of Afghanistan: The Haunted Battleground / Reşeyên Afganistanê: Muharebeya xeyala wê dev ji mirovî bernade,* Portobello Books, London, 2012. Referansên behsa xebatên van herdu nivîskaran dikin çêl li van herdu pirtûkan dikin.

(3) Jean-alain Rouinsard û Claude soulard bixwîne, "Les premiers pas du socialisme enafghanistan/Gavên peşî yên sosyalîzmê li Afganistanê", *Le Monde diplomatique,* çileyê 1979, DvD-RoM a arşîvan, *li jor behsa wê hat kirin*.

(4) Perestroïka ("jinuveavakirin"): tevahiya reformên di bin birêveberiya Gorbaçev de hatî kirin; glasnost ("şefafî"): siyaseta azadiya xweîfadekirinê û agahîstendinê ya ku di heman demê de hatî qebûl kirin.

(5) Artemy Kalinovsky, *A Long Goodbye:The Soviet Withdrawal from Afghanistan / Xatirxwestineke dirêj: Vekişîna Sovyetê ji Afganistanê,* Harvard University Press, Cambridge, 2011.

(6) "The long life of Homo sovieticus /Jiyana dirêj a Homo Sovyetîkus ", *The Economist,* London, 10ê kanûna 2011ê.

(7) Vê berhemê bixwîne: Selig s. Harrison, "L'afghanistan s'installe dans la fragmentation /Afganistan xwe di nava parçebûyîne de bi cih dike", *LeMonde diplomatique*, çileya 1992yê, DvD-RoM a arşîvan, *li jor behsa wê hat kirin*.

Wergera ji îngilizî: Luqman Guldivê

Ji ber ku bawer dikin ku serkeftina li Nevadayê dê dawîya hilbijartinên serokatîyê yên 6ê çirîya paşîn a pêşîya me dîyar bike, her du berendaman mesrefên ewqasî mezin danîne ber xwe ku sînorên deyndarîyê derbas dikin. Li Las Vegasa ku metropola vê eyaletê ye û paytextê qumarê ye jî, her tişt ji adetê zêdetir e. Bajarvanîya wê jî yek ji wan e ku mirov dixe nav tenêtîyê û têkîlîyên civakî jî hêdî hêdî dikuje.

BAJARVANÎYA TENÊTÎYÊ

Las Vegas, axirîn qonaxa Amerîkayê

ALLAN POPELARD Û PAUL VANNIER *

Em li ser kolana Strîpê ne. Ji bakur ber bi başûr ve, piranîya gazîno, otêl û cîhên kêf û cejnan yên Las Vegasê li ser vê kolanê bi cîh bûne ku direjahîya wê heft kîlometre ye. Heger mirov bixwaze li ser wê bimeşe, eynî weke ku mirov di heyştê deqîqeyan de li dora dunyayê bigere. Li hember pîramîda otêla Luxorê, Excalibur xuya dibe ku keleheke mezin e. Jê piçekî bi wê de, *çar demsala* Vivaldi li hewşa Venetianê hey li ser hev lê dixe. Di nav hawizekî de ku di navbera kopyeyeke Qesra Dogesan û ya Qesra Campanilê de hatiye bi cîh kirin, çend gondolvan li benda muşterîyan in. Evîndar hev maçî dikin û wêneyên xwe didin girtin. Di heman demê de, li ser pireya Rialtoyê xelk disekinin û didin nav xewnan.

Ji wan bi çend gavan bi dûr, di nav qopyayeke birca Eiffelê û minyatureke *Arc de Triomphe* de, otêla Paris-Las Vegasê heye ku li qiraxa çemê Seinê hatiye çêkirin. Ava çemî ya ku aram bû, ji nişka ve pêlan dide xwe û avê dipijiqîne hewayê. Li hêleke din kratera volkanekê diteqe û lav û êgir dibarîne. Geremol û qerebalixîya bajêr bi dengan, bi kelecan û qêrînan zêdetir dibe.

Eynî mîna kuçeyên navendî yên pêşengehan ku berê xanîkên bi şêwaza kevin lê dihatin çêkirin, kolana Strîpê jî bûye qada pîrozkirina «komareke qralîyetê». Şev û roja wê nîne, tim tije ye, ji erebe û tûristan cîh tê de namîne. Hemû organîzasyona wê weke korîdorekê ye ku pasaj û galerî li her du hêlên wê xelkê vedihewînin. Kesê ku dikeve nav wê, ji salonên qumarê heta bi bernameyên kêfê di nav vê rêka mişt, şewq û ronahîyên ku vêdikevin û vedimirin û tunelên bazirganîyê yên bêdawî de wenda dibe. Li ser rêya mirov tim parfumên cîhêreng li kolanê tên werkirin. Hoparlorên ku di nav dîwaran, an jî daran de hatine veşartin bi awayekî bêrawestan û bênavbir kilamên bêhişan û sirûdên welatperwerîyê lê dixin, weke mînak *God Bless the USA*. Qet wê hêvîyê nekin ku hûn ê bikarin li barekê rawestin û bêhna xwe berdin: Komptuwar bi xwe jî ketine ber bayê mekîneyên qumarê. Tu dever û tu dem nehatiye hiştin ku hişê mirov bikeve ser tiştekî din. Ev temaşaya bêdawî hemû bala mirov werdigire, sebra mirov tîne û mirov ji rêyê derdixe. Avadanîya bajêr bi xwe jî rêyê ber bi tevgerên mirov ve dixe û mirov di nav qerebalixîyeke tevlihev de dihelîne.

Lîstik û kêf hesta mirov ya tenêbûnê kêm nakin. Gazîno ew dever e ku mirov xwe ji her tiştî bi dûr dixe. Li ser maseya lîstikê, lîsktikvanên pokerê di bin kumên xwe de, li pişt berçavkên xwe yên tavê û di nav bêdengîya muzîka guhikên xwe de wenda dibin. Ji wir çend gavan bi şûn ve, sîmulakreke *high-tech* hertişt xistîye bin destê xwe: Niherînên mirov di nav dekolteya jineke belavkera kaxezên xeyalî de wenda dibin. Bi rûlet, gindorê serwetan û lîstikên civakî ve, gazîno dişibe cîhekî weha ku hemû celebên koman û hevgirtinê lê têk çûne, û bi tenê tenêtî li şûna wê maye. Di nav wê tenêtîyê de jî, ji bo lîstikvanekî ku di nav daxwazên tevlihev de maye, ne heval heye û ne jî raqîb, bi tenê şans û îhtimal li ber wî mane.

Yên ku xwe dikujin ne lîstikvan in, nîştecîhên bajêr in

Birêz Carol O'Hare birêvebira Lijneya Nevadayê ya li ser pirsgirêkên lîstikan e, ku ev dezgeha taybetî li ser navê dewletê dixebite. O'Hare dest nîşan dike ku li eyaleta Nevadayê % 6ê nifûsê hogira lîstikan e. Ev hejmar sê qatê navîneya welêt e. Li sivdera şevê ya bêdeng, ji qerebalixîyê bi dûr, bi qasî bîst lîstikvan civanê didin hev û tên dora maseyeke U ya ku buzdolabîyek jî li ber e. Li vir jî weke panzdeh deverên din yên ku civînên bi vî rengî lê tên saz kirin, heman rituel pêk tê. Berê, xwendina pirtûkê ya peyv bi peyv tê ku destûra komeleyê lê hatiye nivîsandin. Bi dû re jî qaîde tên bi bîr xistin: Mafê herkesî heye ku bipeyive. Paşê jî axir dema lêmikurhatinan tê. Çîroka têkçûyinan, belavbûna malbatan, jîyanên hilweşîyayî, revîyayî û xemgîn. Lê, dîsa jî li vir di nav vê civata ku herkes hevdu fahm dike de mirov li rehetîyekê digere. Piştî ku civîn bi dawî tê, endamên *Lîstikvanên Anonîm* dadikevin kolanan. Dişibin civakeke weha ku ji civaka din hatiye. Li pişt wan, şewqa elektrîkî ya Strîpê xuya dibe. Cixareyeke dawîn jî dikişînin û bi dû re heta civîna sibehê ji hevdu vediqetin.

Li vê eyaletê, anormalîya îstatîstîkan ne bi tenê li ser hogirîya lîstikan e. Mirov nizane ka tesaduf e an na, lê belê Las Vegas xwedan taybetmendîyeke din e jî : Li Amerîkayê, Las Vegas ew herêm e ku rêjeya xwekuştinan lê herî bilind e. Ev her du çavdêrî, ne li gor îmaja bajêr ya kêfê ne: Bêtir dişibin nakokîyekê. Avadanîya cîhên lîstikê li vir ne bi tenê alavek e, lê belê dibe ku her tişt li ser wê hatibe saz kirin.

Kesên ku dane pey pereyan di nav şenkahîyên plastîk de û di ber alçîya bi şiklê qesran re dikevin hundir. Tu dewlemendî li ber çavên mirov naherike û dîmena li ber çavan naşibe îmaja gazînoyan ya ku filîm didin; ne Steven Soderbergh û lehengên xwe yên ekstravagant (*Ocean's Eleven*) û ne jî Martin Scorsesse û lehengên xwe yên porjolekirî (*Casino*). Lê belê şoqeyên bezbolê, tee-shirtên di rengê ala amerîkî de, şortên nîv-dirêj yên ku gûzika mirov li derve dihêlin. Bi ser de jî bêhna sar ya tûtinê.

Ji gelek hêlan ve, cîhê ku em lê ne, dişibe febrîqeyekê. Mekîneyên lîstikê li pey hev in û cîh li gor wan hatiye bi kar anîn. Lembeyên ku deng jî wan tên, hesinê ber çakûçan û lîhimkirina wî tîne bîra mirov. Lîstikvan li cîhê xwe ne. Her yek ji wan hemû hêza xwe dide da ku para xwe yê serwetê bi dest bixe. Kaneke mekîneyan û tevgerên mekanîk, teva refleksên eyarkirî. Mil bi klavyeyê ve girêdayî ne; çav li ser ekranê cit bûne. Laşê wan weke parçeyek ji mekîneyê disekine. Hosteyê kar yê ku li vir bûye berpirsê ewlekarîyê; nahêle ku kesek pirsgirêkan derxe. Bi alîkarîya bi sedan kamerayan, bala wî tim li ser lihevkirina derdorê û xebitîna mekîneyên pereyan û çûn û hatina xelkê ye.

Bêguman, sedemên xwekuştinê gelek in. Birêz Lînda Flatt ya ku li navenda rêlibergitina xwekuştinan ya Nevadayê dixebite, dibêje ku "*bidestxistina derfetên tenduristîyê zehmet e, bi taybetî jî ji bo nexweşên psîkîyatrîk; butçeya wan hatiye kêm kirin û li vir sîleh pir bi hêsanî tên peyda kirin ku ev yek jî rewşê girantir dike*". Jixwe, ev taybetmendîya civaka amerîkî ye. Heger mirov bixwaze cografyaya xwekuştinên li Amerîkayê bişayesîne, mirov kevaneke mezin ji Alaskayê dide dest pê kirin û di nav çîyayên zinarî re digihîne heta Meksîkaya Nû. Lê, di nav vê "*kembera xwekuştinê*" de, cîhê Las Vegasê taybetî ye. Birêz Michael Murphy yê ku doktorê hiqûqî yê herêma Clarkê ye ku Las Vegas jî di nav de ye, balê dikişîne ser ku ev bajar ji gelek salan ve ye ku di nav pênc bajarên serî yên Amerîkayê de ye ku xelk hêrî zêde lê xwe dikujin. Li buroya wî ya ku dişibe dekoreke rêzefîlman, dîplomaya wî ya Federal Bureau of Investigation (FBI) li dîwêr e û wêneyên zarokên wî jî li ser ekrana kompîtura wî ne. Birêz Murphy yê ku temenê wî li dor pêncî salî ye û zimanşêrîn û henekbêj e, rola xwe pir baş dilîze. Di bin skalpela wî re cenazeyên mirinên req yên herêmê derbas dibin. Dibêje "*Xelk dibêjin qey bêtir tûrîst û lîstikvan xwe dikujin. Lê belê bêtir nîştecîhên bajêr xwe dikujin*".

Dezgehên îdarî yên Las Vegasê qet nahêlin ku kes bi vê rastîya tahl bihise. Şewq û îmaja bajêr her sal gelek niştecîhên nû ber bi bajêr ve dikişînin. Ji bîst salan ve ye ku, herêma Nevadayê li Amerîkayê herêma yekem e ku herî zêde mihacir diçinê. Herçî Las Vegas e, di vê koçberîyê de bûye navenda sereke. Di nav 2001 û 2010ê de, nifûsa wê ji mîlyon û nîvekê gihiştiye du mîlyonan. (1) Avadanîya bazara karan jî alîkarîya vê zêdebûna demografîk dike. Lewre li vir gelek karên weha hene ku li kesên kalîfîye nagerin; bi taybetî jî di warê înşaetan de û di karê otêlan de ku ev yek jî bajarê qumarê ji bo bêkaran dike eldorado.

Ji bo fînsansekirina alavên hevpar bac têrê nakin

Birêz Murphy dide zanîn ku «*gava ku xelk bar dikin û tên vir, ji deverên din bêtir armanca wan destpêkeke nû ye. Lê belê zêde dem tê re derbas nabe ku lê hay dibin ku rewşa wan mîna berê hê jî xirab e* ». Herweha, gelek kes hene ku, ji ber krîza emlaqan ya ku bûye sedema qelsbûyina aborîya bajêr, xewnên wan şikestine. Stephen Brown yê ku li Zanîngeha Las Vegasê mamosteyê aborîyê ye balê dikişîne ser ku «*li Las Vegasê rêjeya bêkarîyê 13.5 e û li Amerîkayê ji bo bajarekî bi vê çapê ev rekorek e*». Koma zanistên Brooking Institution jî dide zanîn ku di nav sed metropolên welêt yên herî mezin de, di van sê salên dawîn de, rêjeya bêkarîyê herî zêde li vir bilind bûye. (2) Doktorê hiqûqê jî heman rewşê dinirxîne, lê li gor xwe dinirxîne: «*Van du salên dawîn, kuştin-xwekuştin gelekî zêde bûne (gava ku jin û mêr berê hevdu dikujin paşê jî xwe dikujin). Du rewş bêtir ber bi çavan dikevin. Hin kes hene ku her tişt wenda kirine û nema dizanin bê divê bi ku de biçin. Bi piranî temenê wan di ser 50yê re ye. Hinên din jî hene ku, êdî taqeta wan nemaye ku barê jina xwe an jî mêrê xwe hilgirin, bi taybetî jî gava ku jin an jî mêr gelekî nexweş be. Ez nikarim îsbat bikim, lê bawerîya min ew e ku di piranîya rewşên weha de sedama van xwekuştinan krîza aborî ye*».

Ji dawîya 2006ê û bi vir ve, buhayê emlakan li vir % 60.5 ketiye. (3) Ji xanîyên ku mutahîdan ji bo çîna navîn çêdikirin û bîranînên wan hê jî lê xuya ne, heta bi getoyên derdora navenda bajêr ve, li her deverê, krîzê şopa xwe li ser qûç û keviran hiştiye. Heman textê ku li devê xanîyên hecizkirî hatine xistin, heman panoyên "Xanîyê firotinê" li baxçeyan. Birêz Desi Coleman ya 55 salî li xanîyekî xizan yê taxên bakur dimîne ku li vir bajar hema bûye xanîkên piçûk. Li dora şaxekî dezgehên alîkarîyê yên oldar, di nav otobanê û goristana Woodlawnê de, bi qasî sed bêmalên ku hewl didin ku di nav vê peyzaja bêxwedî de li ser lingan bimînin, konên xwe li qiraxa Vegas Drive vegirtine. Ji wan ne gelekî bi dûr, xelkê bajêr bi balteyan ketine pey jêkirina daran da ku ji xwe re bikin êzing. Di ber re bazara xizanan jî heye li ber derîyan: Alavên erzan, kanapeya li ber dîwarekî. Birêz Coleman dibêje ku "*li vir, weke li taxên din, gelek kes hene ku xanîyên xwe wenda kirin. Pismamekî min hebû, mala wan nêzîkî vir bû, ew jî çû… Krîzê li her kesî xist. Ji bilî dewlemendan*!".

Ji ber ku li her derê xanî tên heciz kirin (4), cîrantî êdî nemaye. Jixwe li vî bajarî nifûs tim diguherî, îcar barkirina beşekî xelkê bajêr ya ji mecbûrî jî ev têkçûna civakî jî xurttir kiriye. (5) Li Las Vegasê % 91ê nifûsê ji eyaletên din hatine û % 45ê wan jî dixwazin ji eyaletê bar bikin. (6) Li rojhilatê bajêr, taxên karawanan çêbûne û ev jî delîla wê ye ku beşekî civaka amerîkî gelekî cîh diguhere. Birêz Robert Schoffield yê birêvebirê *Mobile Home Park* dide zanîn ku li bajêr hejmara xanîkên seyar yên bi vî rengî sîh û pênc hezar e. Di nav du sed û sîh û heft niştecîhên parka wî de bi piranî malnişîn hene, an jî karkerên ku meaşên wan di binîya navîneyê re ne. Malnişînan bixwe jîyana vir tercîh kiriye, lê yên din mecbûr mane lewre krîz li ser krîzê li wan dixe û wan mecbûrî koçerîyê dike. Birêz Murphy dibêje ku "*bi kurtî, kes ne ji vir e*" û lê zêde dike: "*Rêjeya xwekuştinan bêguman bi vê ve jî girêdayî ye ku mirov ji civakê qut dibe, gava ku pirsgirêkên mirov çêdibin, nas û meriv nîn in ku piştgirîyê bidinê û peywendîyên cîrantîyê jî qels in. Piranîya niştecîhên bajêr, heger tiştek bi wan bê, kesekî wan tuneye ku hêvîyê jê bikin*".

Vesazkirina deverê tu cara rêyê li ber tenêtîya bajarîbûnê nagire. Tew dikare wê girantir jî bike. Matt Wray mamosteyê civaknasîyê ye li zanîngeha Temple ya Philadelphîyê û li ser xwekuştinên Las Vegasê jî gelek gotar dane çap kirin. Li gor wî, «*mezinbûna zêde ya demografîk avakirina dezgehên herêmî yên nû bi xwe re neanî. Weke mînak, navendên herêmî an jî dibistanên nû nehatin vekirin. Cihên weha dikarin tora peywendîyên civakî ava bikin û bibin sedem ku xelk bi ser hev de biçin û bên. Nebûna wan dikare pişta civaka bajarvanîyê bişkîne*". Gelo sedema vê valahîyê çi ye? "*Li bajêr bac gelekî kêm in. Loma jî şaredarî nikare dezgehên bi vî rengî fînanse bike*". Rast e ku eyaleta Nevadayê û bajarê Las Vegasê li Amerîkayê ew dever in ku kêmtirîn bacê ji xelkê werdigirin: Ne baca qezencê heye, ne baca dewirkirinê, ne baca şirketan. Heger mirov mezhebfirehîyê jî lê zêde bike, weke qumar, fuhûş, alkol, zewac û hevberdan, hingê Las Vegas dibe weke bajarekî laboratuwarî yê weha ku her tişt lê serbest e.

Dabeşkirina wargehê û dabeşkirina demê

Ji ber ku ji alîyê ajansên nirxandinê ve çavdêrîya şaredarîya Las Vegasê tê kirin (7), şaredarîyê stratejîyeke nû bi navê "stratejîya acîl" bi cîh kiriye, da ku aborîya xwe lîberalîze bike. (8) Ji 2008ê û bi vir ve, hemû butçeyên fermî hatine birîn: % -43 ji bo birêvebirîyê, % -27.2 ji bo hiqûqê, % -23.6 ji bo çandê, % -9.8 ji bo ewlekarîyê. Hin dibistan û navendên sportîf jî hatine girtin. Tamîratên ku li bajêr tên kirin, nîvî bi nîvî hatine kêm kirin. Otorîteyên bajêr êdî tercîh dikin ku karên bajêr bidin dezgeh û şirketên nîv fermî, an jî taybetî. Di projeya nûkirina navenda bajêr de jî heman rê danîne ber xwe ku armanca vê projeyê ew e ku navendeke bajêr ya ku hê tuneye were ava kirin. Ji bo gava niha, kolana Strîptê ew dever e ku tûrîstên ji seranserê dunyayê lê dicivin, lê belê ji bo xelkê bajêr bixwe nebûye cîhê hevdîtinan. Ji bo niştecîhên bajêr, devereke navendî hê jî tuneye, ne li bajêr bixwe û ne jî li banlîyoyan.

Çûn û hatinên nav banlîyoyan bêtir dişibe dubarekirineke bêdawî ya şiklan, dişibe tecrubeyeke rîtmîk. Xet û kolonên xanîyên biserêxwe, yên li hember hev, an jî li kêleka hev, tora jîyanê ava dikin û ev tor jî di bin destê tenêtîyê de ye. Xelk zêde tev li qerebalixîyan nabin û dora hewş û baxçeyên xwe jî digirin, da ku sînorên xwe zelal bikin. Li devê rêyên sereke rêya mala xwe digirin da ku mirov nêzîkî wan nebe. Her malek li vir bûye weke kelehekê, weke ku birc li dorê hebin. Amerîka bi vî awayî erkên mîmarîya qirna navîn vedijîne. Her civat dora xwe bi dîwaran diparêze û bircan ava dike. Civatên weha her ku diçe zêde dibe. Heta ku vexwendineke mirov nebe jî mirov nikare bikeve nav van taxên ku sûk lê nîne. Nobedarên taxê hejmara plaqeya erebeya mirov distînin û telefonî mazûbanê mirov dikin, da ku jê piştrast bin ku mirov bi rastî jî mêvan e. Nijadperestî sedema kûrkirina cudahîyan e, lê di heman katê de jî yên wek hev li hev dicivîne. Her mal, her tax, her avahî di nav xwe de civakeke girtî ye. Li vî alîyî yên malnişîn û teqawîtbûyî hene, li hêla din ciwanên çalak hene. Êdî çîna navîn jî bê çîn maye û li ser adresa wan mirov dikare reklamên weha bibîne: "*Mala te hatiye heciz kirin? Tu li ber xwe dikevî? Ka hela were serdana rezîdansa me*."

Li nav ronahîya supermarketa Walmartê karmend ber bi çav dikevin û neh deh muşterî diçin û tên. Saet çarê sibehê ye. Ji ber ku gazîno bi şev û roj vekirî ne, ev tempoya wan xwe li ser bajêr jî û çalakîyên jîyana rojane jî ferz dike. Saetên dikanan li gor saeta karên krûpiyer û xizmetkarên otêlan hatiye eyar kirin. Li mutfaxên restorantan agir ji zû ve vemirîye. Mirov dibêje qey dikan tim girtî ne. Hejmara mişterîyên restorantan pir kêm e û bi tena serê xwe dixwin. Birêz Butchê ku li vî bajarî çêbûye û 61 salî ye, ji me re dibêje "*Las Vegas 24 saetan vekirî ye! Yê min, gelekî bi dilê min e! Saet 2yê şevê be jî, gava ku ez bixwazim tiştekî bikirim, ez dizanim ku dikan vekirî ne. Li vir, tu kengî bixwazî û tu kûderê bixwazî, tu dikarî biçiyê!*" Bajarvanîya Las Vegasê li ser bikaranîna bêrawestan ya demê ye. Û, li vî bajarê ku jîyana xwe pêncî caran bêtir bi meşqaleyan dagirtiye, ji bo xelkê bajêr yê ku her tişt ji destê wan hatiye stendin, ne cîh maye û ne jî wext ku bikarin bi hevdu re par bikin.

Eynî weke ku mîmar Robert Venturi û Denise Scott Brown balê dikişînin ser, li ser kolana Strîpê "*hertişt bi tenê tabela ye. (…) Tabelaya mezin ajovanan ber bi dikanê ve dibe û ji wir jî bi panoyên mezin yên ber bi otobanê ve, markayên mezin pesnê arvanê xwe û deterjanên xwe didin. Sembolên grafîk yên li derdorê êdî bûne nîşana mîmarîya nû* ".(9) Avadanîya Las Vegasê encama serkeftina musrîfan e û ji ber vê jî karkerên Walmartê û yên gazînoyan ancax dikarin di derîyên paşîyê re bikevin cîhên karên xwe, lewre ew xizmeta aborîya bajêr dikin.

Aborîya nû ya li ser xizmeta xelkê ku li Amerîkayê mezintirîn sektora karan e, muşterî derxistine asta kesên ku bikarin civakê biguherin. Amerîkaya ku berê navenda berhemdarîya cîhanî bû, weha xuya ye ku hêdî hêdî dibe cîhekî weha ku mirov lê hey xerc dike. Di nav civakeke weha de ku lihevkirina li ser xerckirinê ketiye şûna nakokîya çînan, karker hê jî weke berê hene. Ji salên 1990ê ve pêşketina endustrîya qumarê bû sedem ku gazînoyên nû bêne ava kirin ku her yek ji yeka din mezintir e. Bi sedan û bi hezaran karmend li heman cîhî ji bo heman karî dicivin. Ji hêlekê ve dînamîkên bajêr yên nû xelkê ji hev belav dike, ji hêla din ve jî cografyaya karkeran ya nû li derdora Strîpê hin awayên komên sendîkayan dide peyda kirin ku berê tunebûn.

Civaknas Kim Fantasia û Rick Voss (10) balê dikişînin ser ku di nav 1950 û 1980yê de "*Las Vegas bajarekî weha bû ku gava ku te behsa sendîkayan bikiraya, xelkê henekê xwe bi mirov dikir, lewre hemû bertîlxwir bûn, an jî girêdayî mafyayê bûn*" û patronan li dijî wan şer dikir. Di wê pêvajoyê de, karmend û karker ji sendîkayan bi dûr ketin, lewre ji ber sîstema sendîkayên wê demê, patron û karkeran li ser çi li hev bikiraya ew bû. Gendelîya sendîkayan û zordarîya patronan bûn sedem ku hevgirtina civakî jî li herêmê nemîne.

Li gazînoyan şiklên çalakîyên nû yên sendîkayan

Ji bo ku li meydanên Sunbeltê "tevgereke karmendan" bihataya ava kirin û saz kirin û hêza wê jî ne kêmî ya tevgera karkerên bajarên Midwestê bûya, gelek dem û ked pêwîst bû. Tevgereke weha ku bikaribe li dijî kêmkirina meaşan rabe. Wan bixwe dît ku deyn ketin şûna meaşan û azadîya muşterîyan jî ket şûna şertên karmendan yên karî. Li buroya beşê 226ê yê *Culinary Workers* (karkerên restorantan), Birêz Geoconda Arguello-Kline bi bîr tîne ku "*destpêka salên 1980yê, rewşa me gelekî xirab bû, karkerên gazînoyan tu cara bi birêvebirîya gazînoyan re li hev nedikir. Hingê lê hay bûn ku pêwîst e ku pişta xwe bidin hevdu û şerê wan bikin*".

Guherîn nîvê salên 1980yê pêk tê. "*Sala 1984ê, me greveke mezin li dar xist ku hijdeh hezar karker tev lê bûn. Salên piştî wê, me hewl da ku em di nav hemû gazînoyan de komîteyan ava bikin. Bi dû re, sala 1991ê, greva Frontier pêk hat. Şeş sal û çar meh û deh rojan dewam kir*". Ev greva ku piştî bazara peymana giştî ya karkerên otêlan pêk hat, bû dirêjtirîn greva Amerîkayê. Ji sala 1945ê ve bû ku Amerîkayê greveke weha nedîtibû: Bîst hezar grevîst li ser Strîpê meşîyan; meşeke pênc sed kîlometreyî bû û di nav çola Mojavê re derbas dibû, lê belê alîkarî da ku doza wan were nasîn. (11) Û axir, sala 1998ê jî serkeftin hat bi dest xistin. Liberxwedaneke weha bû ku "*nîşanî şirketan da ku karker dikarin pişta xwe bidin hev, dizanin bê doza çi dikin û di vî şerî de dilê wan yek e, ji bo malbatên xwe û ji bo jîyaneke baştir a layiqî mirovan*".

Li Las Vegasê, ji sendîkalîzmê pê ve tu hêvîya kesî tuneye ku rê li ber hişmendîya karê zêde were girtin. Birêz Arguello-Kline balê dikişîne ser "nimûneya Stationê" û dewam dike: "*Li wê gazînoyê, karkeran biryar da ku xwe bi rêk bixin, lewre li wir mirov sîh salan bixebite jî nikare teqawîd bibe. Tu ewlekarîya karê mirov tuneye û mirov mehê 100 dolaran jî ji bo sigortaya tenduristîyê dide. Hûn dikarin bixwe bibînin bê di nav statuya karkerên girêdayî sendîkaya me û ya wan karkeran de çi cudahî hene. Ferq gelek e.*" Îroj, % 90ê karmendên gazînoyan girêdayî sendîkayan e. Pêncî hezar endamên Culinary Workersê hene, lê hejmara endaman li gor 2008ê pênc hezar kêm bûye. Arguello-Kline dest nîşan dike ku «*Rast e ku krîza aborî xisar da aborîya Nevadayê, lê dîsa jî endamên me parastî ne. Hê jî teqawîdbûna wan dewam dike û ji bo wan û malbatên wan sigortaya tenduristîyê belaş e. Rewş xirab bûbe jî ev şert û şirûc nehatine guhertin. Ewlekarîya karê wan heye. Sendîka li dora wan weke kelehekê sekinîye û wan diparêze* ».

Weke Detroita dema endustrîya mezin, Las Vegas di vê dema xizmeta bingehîn de bêtir dişibe bajarekî liberxwedêr û sendîkayî. Digel îmaja ku dide derdora xwe û taybetîkirina erda wê û digel hin lihevkirinên ku ne li gor qaîdeyan in jî, ev bajar nîşana modernîteya civaka amerîkî ye: Hişmendîyeke liberxwedanekê û têgihîştineke çalakîyên hevgirtinê ya weha lê heye ku li hember gelek ceribandinên têkbirina hevgirtina karmendan, li hember daxwazên hilweşandina civakê û li hember hewlên rêlibergirtina organîzasyonên erdnîgarîyê bi ser ketiye. Di nav vê çola Xwedê de, di nav çîya û newalên sor û şîn de, gelo karmendên wê yên li hember valahî û bayê dîrokê dibin pêşengên celebekî nû?

* Cografyanas

(1) "2011 Las Vegas perspective", Metropolitan Research and Association, Las Vegas.

(2) Global Metro Monitor, "The path to economic recovery", Brooking Institution, Washington, 2010.

(3) Di dawîya 2006ê û serê 2011ê de, navîneya welêt li gor sed mezintirîn metropolan % 26.5 bû, ev jî bajêr dixe rêza 98ê.

(4) Hejmara wan sala 2006ê, berî krîza aborî, 1494 bû. Sala 2007ê ev hejmar derket 4173yê, sala 2008ê bû 7941, sala 2009ê bû 6784 û sala 2010ê jî 7675. Çavkanî: "2011 Las Vegas perspective". Heman berhem.

(5) Rêjeya cîhguhertinê ya ku dibe pîvana cîhguhertina emlakan jî, li Amerîkayê gelekî bilind e û % 15 e, ev rêje li Fransayê % 8 e.

(6) Robert Futrell (berpirsîyar), "Las Vegas metropolitan area social survey, 2010 highlights", beşê civaknasîyê yê Zanîngeha Nevadayê, Las Vegas, adar 2010.

(7) *Las Vegas Sun*, 26ê çileya paşîn 2011.

(8) Naomi Klein, *La Stratégie du choc. La montée d'un capitalisme du désastre,* Actes Sud, Arles, 2008.

(9) Robert Venturi, Stephan Izenour û Denise Scott Brown, *L'Enseignement de Las Vegas,* Mardaga, Wavre, 2008 (çapa yekem 1972).

(10) Rick Fantasia û Kim Voss, *Des syndicats domestiqués. Répression patronale et résistance syndical aux États-Unis,* Raisons d'agir, Paris, 2003.

(11) Ibid.

Wergera ji fransî:
Îbrahîm Seydo Aydogan



ZOUBER YOUSEF: **Çêçîka Mirîşka Azadîyê**. Metal, 220 x 220 x 80cm

Li Spanyayê xwepêşandêran meydanên mezin ên welêt dagîr kirin, pê gilîyê demokrasiyeke ku êdî nûneriya wan nake kirin û krîzeke ku ne ya wan e jî red kirin. Di herêma euro de, liberrabûn kat dide û hêdî hedî ji xwe re dike hedef. Yekîtiya ku weke qayişa hilgir a derbasbûnê bi kêra ferz û daxwazên bazarê hat. Lê belê gelo Ewropa dikare çepgir be?

Lêkolîna di nava malbateke parçebûyî de

Çepê fransî li Ewropayê dialiqe

Antoine Schwartz *

Ji bo carekê, dezgehên ewropî di radeya herî bilind de hefsarê faîzê sist kir. Û weke gelek caran, vê yekê çepê fransî parçe kir. Di dema referandûma 29ê gulana 2005ê de, dijberên projeya ***Peymana Destûrnameyî ya Ewropî* (TCE)** bi beşdarîyeke bilind (% 69,37), ji sedî 54,67ê dengan kom kirin. Vê encamê, tevî vê yekê jî, rewş bi qasî ku dihat payîn, serûbin nekir. ***Peymana Lîzbonê*** ya di 13ê kanûna 2007ê de îmzekirî, ji nû ve pêkanîna amadekarîyên bingehîn ên projeya berê datanî ber xwe. Û vê carê pirsîna nêrîna gel ne mewzûbehs e: Di pêvajoya têkildarî referandûmê de tesdîqkirinên bi rêya parlementoyê dê werin tercîh kirin.

Hevserokê Partîya Çep **Jean-Luc Mélenchon** vê rewşê wiha tîne ziman: *«Herçendî serkevtîyên 'na' bi serkevtina xwe xeyalşikestî jî bûn, du kamp ji bo salên dirêj li Fransayê ji hev qetiyan».* Lê belê ev xeta berbiçav a jihevqetînê gelo hertim wisa zelal e?

Bi krîza diravê yekane û şidandina tedbîrên aborî yên li ser gelên parzemînê hatin ferz kirin, guftûgoya li ser armancên entegrasyona ewropî ji nû ve şekil dide sînorên ku erdnîgarîya çepê fransî dixin nav ahengekê. Ji alîgirên guherîneke demûdezgehên ewropî yên «hundir» ta yên dijberî ***ewro***yê, çep ji niha û şûn ve hem li ser xwezaya reformeke muhtemel a *Yekîtîya Ewropî* hem jî li ser derfetên pêkanîna wan, ji hev diqete. Hertim, bi asoyeke hevpar: Gelo wê vê «Ewropaya civakî» ya ku pir dixwaze çawa saz bike?

Li deverên din ên dika siyasî, rûpela referandûmê weke ku hatibe girtin. Hilbijartinên ewropî yên 2009ê bi vî awayî, şahidîya tiştekî ecêb kir: **José Bové** û **Daniel Cohn-Bendit** (ji niha û şûn ve her du endamên partîya Ewropa-ekolojî – Partîya Keskan, EELV), ên di kampanyaya 2005ê de dijberên hev ên bêhempa bûn, biryar dan ku vê carê li tenişta hev mil bi mil ve kampanyayê bimeşînin. Hevgirtineke nepayî? Sekreterê neteweyî yê ***EELV*** dibêje: *«Li cem ekolojîstan, li ser armancekê lihevnekirin tunebû, lihevnekirin li ser maqûlîya pejirandin an jî nepejirandina tekstekê bû. Vê jî hişt ku cudahîyên di navbera wan de bên çareser kirin. »*

Baş e, li hêla sosyalîstan, gelo bi rastî jî demê birînên ji ber şerûpevçûnên berê êdî nema? Tevî ferznameyên fermî jî, beşeke rêveberî û mîlîtanan li dijî peymanê bûbûn xwedî helwest. Cîgira serokê Meclîsa Neteweyî **Elîzabeth Guigou** bi tedbîr vê bersivê dide *«Piştî perîyodeke hinek tevlîhev, ev yek pir zêdetir xwe dispêre lihevkirinekê. Îro em hemû hemfikir in ji bo bibêjin, ku Ewropa di krîzeke kûr re derbas dibe û dîsa em hemfikir in ku ji bo vê yekê divê mirov bibe xwedî ronîhişîya analîzkirinê. Ev krîzeke projeyeke ewropî, krîzeke wateyê ye».* Lê belê li hember gefên jihevbelavbûnê yên daketine rewşa babelîskeke spekulatîf ya welatên ku ji wan re «dewrûber» tê gotin yên herêma ***ewro***yê dihejîne, ne hêzên navendî (Fransa, Almanya) ne jî **Guigou** nikarin pişta xwe bidin van rexneyên rûtîn û ji adetê.

Karîgerîya aktuel a Yekîtîyê niha bi tilîyan tê îşaret kirin. **Guigou**, ku berê li ser fezîletên entegrasyonê zêdetir bi coş diaxivî, rewşê bi van gotinan binxêz dike: *«Ji dehan salan ve ye, cureyekî lîberalîyê zêde bû, lewre siyasetên hevpar ên ku dixwestin li bazarê mîzanîyekê pêk bînin, û wê biserûber bikin, ji hêza xwe ya berê pir winda kirin».*

Wisa xuya ye ku ji ber berjewendîyên xwe hukûmet ji hev dûr dikevin. Û yek ji patrona diravî ya parzemînê ***Almanya*** bi van deynên dide wan, hewl dide, wan di pêkanîna tedbîrên dijwar de bigihîne hev. Bûyeran jî weke ku maf dan van kesên ku gazina wan ew bû ku Yekîtî li ber qanûnên dîkta yên bazarê serî datîne. Lê belê xwezîya wan a avakirina «***Ewropeyeke din***» bi zehmetî xwe dide bihîstin…. û kesî îqna nake.

Alîkarê serokê koma sosyal demokratên li Parlemena Ewropî **Stéphane Le Foll**, niha ketiye nav lêkolîna li ser *«kesên ku dibêjin: Ewropa sedema hemû xirabîyan e, divê dawî lê were anîn û hwd. Em bixwe dixwazin gîyanê ewropî biparêzin, tiştê bidestxistî û ne xerakirî ya çil salên dîrokê biparêzin».* **Le Foll** wiha li gotinên xwe zêde dike: *«Ez ê li hember wan kesan hemûyan yên ku pir caran dibêjin ku pêdivî bi Ewropeyeke din heye, nema xwe ragirim. Dema ev yek hat gotin, çi tê kirin? Baş e bi kê re? Ev tiştekî eletewş e. Meşa ku divê were kirin çiqas mezin be, ewçend mirov xwe ji zehmetîyê rizgar dike. Kesên ku difikirin ku ew ê her tiştî biguherînin, baş dizanin ku ew derewan li xwe dikin».*

Rola sosyalîstên fransî ya di avasazîya ewropî de helbet ji alîyê meyla parastina *«tiştê bidestketî»* de pir girîng e. Awirê li ser vê dîrokê bi rastî jî xala nakokîya esasî ye. (1) Endamê rêveberîya ***NPA***yê **Pierre-François Grond**, bi bîr dixe ku *«sosyaldemokrat bûn hevavakarên Ewropaya Maastrichtê»*, Ewropaya ku ew li dij têdikoşîn, ya ku dixwaze îro *«berdêla buhranê ji mûçegiran bistîne».*

Salên 1980yê, serokkomarê hingê **François Mitterrand** û **Jacques Delors**, ê ku komîsyonek bi rê ve dibir, , pêşî li teniştê **Margaret Thatchera** ingilîz, dûre jî li teniştê **Helmut Kohl**ê alman bûn du mîmarên bingehîn ên pêngava entegrasyona ewropî. Rêya neqandî bû ya bicihkirina tiştê civakî di bin «îtîbar»a aborî de.

Serokê rûmetê yê *Tevgera Komarger û Welatî* (MRC) vê beşê û *«hevalbendîya néolibéralism»*ê ku ji alîyê rêveberên sosyalîst ve hat bi rê ve birin, bi heman girîngîyê dinirxîne. Wezîrê berê jî vê yekê wiha îzah dike: *«Heyama esasî sala 1983 ye, sala ku li gel pergala diravî ya ewropî lihevkirin pêk tê û pergal dibe neolîberalîzm. Dûre Belgeya Yekane ya 1986ê tê û ev jî ne tiştekî din e ji bilî pêkanîna jihevxistina rêzikan li tevahîya parzemînê».* Ev peyman, bêyî pêkanîna ahenga bacî ya destpêkî, lîberalîzasyona tevgerên sermayeyan dixe dewrê. Dûre peymana ***Maastricht***, a ku di encamê de Yekîtîya Ewropî di 1993yê de saz dike, dikeve nav hewldana bi goşt û gewdekirina projeya diravê hevpar ê li bin kontrola bankayeke navendî ya ne-girêdayî desthilata siyasî û yekane armanca wê têkoşîna li dijî enflasyonê ye. Hefsarkirina mûçeyan yek ji dogmaya Yekîtîya nû ye.

Mélenchon, ê ku di 2008ê de ji *Partîya Sosyalîst* veqetiya, bi awirekî cihêreng epîzodên vê «heyamê/werçerxê» tesdîq dike. Ew ji encaman bêhtir pêşkarîyan dest nîşan dike. **Mélenchon** wekî din îzah dike ku piştî 1983 û *«heyama şidandina tedbîran»,* sosyalîst bûn xwedî hişmendîya sînorên guherîneke gengaz a di çarçoveya yek welatî de. Stratejîya wan ew bû ku *«hewl bidin qadeke nû ya bibandor ji bo guherîneke civakî saz bikin».* Wan tercîh kir ku destekê bidin entegrasyona aborî û xwedîyê wê bawerîyê bûn ku entegrasyona aborî wê bibûna sedemê pêkhatina entegerasyona siyasî jî û *di dawîyê de* pêşketineke civakî. Wezîrê berê yê ku di 1992yê de ji bo danqebûlkirina ***Peymana Maastrichtê*** kampanya meşandibû, bi kurtî wiha vedibêje: *«me bawer dikir ku bi ardûkişandina nav lokomatîfa kapîtalîst, wê avantajên cîvakî zêdetir bibana».*

Hemû bi şertê ku "li Yekîtiyê çêkirî" be

Jihevketina komunîzmê, serdestîya nû ya amerîkî û guherînên kapîtalîzmê di navbera xebat û sermayê de bi serûbinkirina danûstandinên hêzan, ev wêneyê bextiyar daxist asta hîçîtîyê. Trêna ewropî li gel sosyal demokratên lê siwarbûyî, rêya xwe dewam kir. Parlamenterê ewropî wekî din vê tesbîtê li gotinên xwe zêde dike: *«Wan çepiklêxistin bi rêkûpêkî domand, ji bo her tiştê ku di baxçekoka yekîtîya-ewropî de – êdî çi dibûya ferq nedikir, bi tenê bila mohra YEyê li ser bûya, bes bû– dihat pêşkêş kirin».*

Ji alîyê dengên herî krîtîk ve, avasazîya ewropî li ser hîmên xwe hinek xwar xuya dike; ev xwarbûna bingehîn mirovî vedixwîne ji nû ve dest bi karekî kirinê. Ji bo parêzvanên Ewropaya aktuel, li gel vê yekê, ev kêmûkurtî bi piranî encama entegrasyoneke temamnebûyî ne. *«Gelo Yekîtîya aborî û diravî baş dixebite?* **Guigou**, weke muzakerevana peymana ***Maastrich***ê bi kurtî bersiva '***na'*** dide vê pirsê. *Baş e çima? Ne ji ber ku gerînendeyîya diravî nebikêrhatî bû, lê belê ji ber ku beşa aborî bi temamî hat ji bîr kirin».* Yekîtîya Ewropayê divê li ser sê stûnan saz bibûya: Yekîtîya diravî, yekîtîya aborî û ahengkirina bacê. Tevî vê yekê, her duyên dawîyê, hê jî rûyê rojê nedîtine. Bi awayekî din mirov bibêje, ya ku dibe sedem ne siyaseta *Bankaya Navendî ya Ewropî* (BNE) ye, lê nebûna «rêveberîyeke aborî» ye. Ev parlamenter herwiha bi israr dibêje *«Li gor min, divê ev krîz bibe fersendek ji bo ji nû ve ruhpêveanîna Ewropayê».* Berîya her tiştî, divê butçeya Yekîtîyê were zêde kirin, ji bo ku bihêle seryameyeyên mezin bên dan û koordînasyona siyasetên aborî li herêma ***ewro***yê zexim bibe. Li gel vê yekê jî pêşnumaya vê «rêveberîyê» ya zeximkirî û morlêxistî bi peymana ji bo ewroyê, qet'iyen bi ortodoksîya diravparêzîyê re ne nakok e. (2)

Ji bo demeke dirêjtir, asoyê sosyalîstan dimîne mîna berdewama entegrasyonê heta pêkanîna «Ewropayeke siyasî». (3) Ev bergeh hê ji destpêka avasazîya ewropî ve tevgera çep ji hev diqetîne. Bi vî awirî, hestiyarîya «komargerî», ya girêdayî modeleke dezgehî ya ku di nav de cihê Netew-dewletan wê bihata parastin, tê beramberî vizyoneke «federalîst» a rêveker ji bo yekîtîyeke ku xwe bispêre vegera ji serwerîyên neteweyî. Nêrîna pêşî îdîa dike ku serwerîya gel li nav qadeke xwecihî û neteweyî ango li qada jîyaneke demokratîk bi gewde dibe; ya duyemîn jî sazkirina demokrasîyekê û ya dewleteke super a di asta parzemînê de danîye ber xwe.

Ev xeta jihevqetînê tevî vê yekê ji bo kurtetarîfa cihêrengîya pozîsyonan ne bes e. Rêxistina ***Lutte ouvrière*** [Têkoşîna Karkeran] dil dibijîne sazkirina *«Dewletên Yekbûyî yên Sosyalîstên Ewropayê»* yên xwe dispêrin ser bingehên ku bêguman wê ne bi dilê rêveberê sosyalîst û gerînendeyê giştî yê *Fona Diravî ya Navneteweyî* **Dominique Strauss-Kahn** bin. Dibe ku guftûgo hê nû dest pê dike. Parlamenterê ewropî yê komunîst **Patrick le Hyrack** rewşê wiha dest nîşan dike: *«Baş tê dîtin ku îro delegasyoneke xwedî hêzên zêde li nav çarçoveya raserneteweyî digihîje encama spartina deshilatê bo dezgehên ne-hilbijartî, ku mirov nikare wan weke nûner û vîna gelan binirxîne».* Midûrê *L'Humanité*yê jî nêrîna xwe wiha tîne ziman: *«Ez ramana konfederasyona dewletên-netewe tercîh dikim».*

Sekreterê giştî yê serokatîya Mitterand ê salên navbera 1991-1995ê û wezîrê karûbarên derve yê hukûmeta sosyalîst a Lîonel Jospin, Hubert Védrine jî difikire ku pêkanîna hevkar ya serwerîyê qet'iyên nayê wateya jê vegerê. Tiştekî wisa nayê wateya alîgirîya gotarên li ser «arkaîzm»a neteweyan an jî «ezezîya» dewletan. Ji bo pêkanîna prosedureke zelalkirina sînorên erdnîgarî yên Yekîtîyê, û parvekirina hêzan a ku wê ava dike, û projeyên ku divê wê zindî bikin, Védrine *«derketina ji dogmaya ewropîparêz»* pêşniyar dike.

«Dogmaya ewropîparêz»? Helbet tevgera federalîst weke hindikayî xuya dike li nav nêrîna, ji nêz ve girêdayî hin sîmayên jîyana siyasî (**M. Cohn-Bendit**) an jî rojnamevanên mîlîtan –yên weke **Bernard Guetta**, ji *France Inter*, an jî **Jean Quatremer** ji *Libération*ê ku **Védrine** wî weke *«Ayetûlahekî federalîzmê»* tarîf dike. Di vê navberê de, ev awirê *«ewropîparêz»* tevna xwe davêje ser awayên bîrbirina bijarteyan, şeklûşemal dide awayê vegotina tevahîya beşeke çîna siyasî ya ku entegrasyona ewropî bi şêweyekî berbiçav (*«Ewropa aştî ye, paşeroj e, ciwanî ye !»*) pêşkêş dike û her cure gumanbarîyê mehkûm dike : *«kesên jêpirsîna xwe dikin alîgirên serwerîyê, arkaîk û dij-ewropî ne, tiştekî wisa rewşeke dilxelîner e!»*, wezîrê berê bi kurtî û zimanekî tinazî wê dogmayê wisa tîne ziman.

Lê belê utopîya federalîst li ser sindoqên hilbijartinan coşeke pir kêmtir diafirîne. Li gor **Vedrîne** *«Dilpekîya federalîst a elîtan li berxwedaneke her diçe mezintir diqelibe. Gava tu digihîjî qonaxa ku êdî dest pê dikî dibêjî ku Parleman wê rojekê şûna Meclîsa Neteweyî bigire, an jî dibêjî Komîsyon wê bibe hukûmeteke Ewropayê, mirov dibêjin "na"!».*

Beramberî dîwarekî sazûmanî

Gelo xewna Dewletên Yekbûyî yên Ewropayê pir ne populer e? *«Dema ji mirovan were pirsîn, ka ew xwe ewropî hîs dikin an na, girêdana wan jidil xuya dike»*, **Xatûn Duflot** a ku partîya wê xwedî projeyeke wisa ye, bi vî rengî û bi vê nermîyê vê rewşê derdibire. Her çi ekolojîst in, ji bo wan afirandina *«nasnameyeke hevpar, welatîbûneke ewropî, ya ku ne weke li dijî aîdiyeta neteweyî, lê weke tiştekî jê zêdetir* pir girîng e. *An na Yekîtîya Ewropî wê bi temamî ji hev bikeve û bipelişe».* Wekî din wê pêwist be ku «qadeke ewropî ya gelemperî» ya ku bikaribe rojekê, hêleke din li Yekîtîyê zêde bike, bê afirandin.. Lê belê kampanyaya ji bo hilbijartina serokatîyê ya 2012ê li Fransayê nîşan dide ku siyaset hê jî ji bo welatîyan bi awayekî bingehîn di asta neteweyî de xwedî wate ye..

Ewropaya federal an jî Ewropaya dewletan; ev *«kargeha fikirînê»* girêdayî pirsgirêka armancên Yekîtîyê xuya dike –ji bilî ku entegrasyon weke dawîyeke xwezayî were nirxandin. Di daxuyanîyên xwe de, çep ji bo parastina «Ewropayeke» piştgirtir, demokrattir û ekolojîktir, *di asta kêmtirîn de* hevûdin digire. Ev armanca hevpar pêkanîna bernameyeke reforman datîne ber xwe û ev bername dikare pergala heyî ya ku bi afirandina reqabeta di navbera xak û meaşan de tê rexne kirin, bi kûrahî veguherîne –di 2008ê de, berdêla saeta keda karker di pîşesazîyê de li **Romanya**yê deh caran ji ya **Belçîka**yê kêmtir e. Sê hedefên esasî, serbixwe ji modalîteyên pêkanîna wan, lihevûdin diguncin: Reforma pergala diravî, harmonîzasyona bacê, lihevhatina «ber bi jor» a normên parastina civakî. Xalên din dibin sedemê

www.arsivakurd.org

jihevdûrketinê, nexasim derpêşkirina ji bo guftugoyê ya statuyên *Bankaya Navendî ya Ewropî* yan jî ragirtina pêvajoyeke nû ya çêker a ji xwe re kiriye armanc ku çarçoveya «Ewropeyeke nû» dest nîşan bike – du pêşniyarên ku Partîya Sosyalîst wan naparêze. Li gel vê yekê, li wêdetirî daxwaz û dilbijînan, ev derfetên pêkanîna wan in û îhtîmala xwegihandina tiştekî wisa jî hêjayî baldanê ye.

Divê nîzama ewropî çawa were guherandin? Karûbarekî ku derket holê pir hesas e. Mîmarîya dezgehî ya Yekîtîyê di eslê xwe de di zextên demokratîk de vê yekê pir hesas dike. Ji bilî Parlemana Ewropî, organên civakî demûdezgehên ne-hilbijartî yên li pêşberî welatîyan xwe berpirsiyar nabînin, pêk tînin. Her çi Parleman e, tevî ku hêza wê bi pêş ketibe jî, ew ji rewabûneke pêwist bêpar e ji bo îdîa bike ku ew li ser navê «gelekî ewropî» diaxive. (4) Di pratîkê de, bidestxistina piranîya dengên pêşverû li nav vê dezgehê wê têra beralîkirina îstîqametên Yekîtîyê nekin. Gerînendeyîya krîza diravî bi xurtî bi bîr xist ku hêza biryarê di destê serokên hukûmetan de ye, û ji bo di ber çav re derbaskirina peymanan pêdivî bi tevahîya dengên wan heye –ev jî prosedurek e ku bo nimûne ji bo harmonîzasyona bacê tê pêk anîn.

Li gel vê yekê jî, li hemberî vî dîwarê dezgehî, piranîya dezgehan xwe didin ber stratejîyeke rû ber bi parzemînê. sendîkavan û endamê konseya zanistî ya komeleya *Attac,* **Pierre Khalfa** dest nîşan dike ku *«Projeyeke pêşverû bi tenê eger di asta ewropî de be, encax hingê wê bibe hêz û projeyeke maqûl»*. Çepê «dij-lîberal» bi armanca yekkirina têkoşînên wêdetirî sînoran, û meşandina kampanyayên der barê peyvên nîzamê yên hevpar de, israr dike ku afirandina *«tevgereke civakî ya ewropî»* pêwistîyek e. (5) 29ê îlona dawî, «ewro-xwepêşandaneke» mezin, a bi însîyatîfa *Konfederasyona Ewrpopî ya Sendîkayan* dest pê kiriye, bi vî awayî demûdezgehên welatên cihê yên Yekîtîyê ji bo bibêjin *«Ji tedbîrên kemberşidandinê re na»* li hev kom dikirin. **Le Hyriac** wekî din diyar dike ku *Divê herwiha ev tevger bikare dawî li xitimîna siyasî bîne».* «***Partîya Çep a Ewropî***» ya di 2004ê de ava bû, wê ber bi îstîqameteke wisa ve gav biavêta.

Ev *«tevgera civakî ya ewropî»*, ji bo bikaribe pêşîyê li bilindbûna rastgira populist a li tevahîya parzemînê bigire, dixwaze bersivekê bide *«rewşa lezgîn a civakî»*. Lê belê herwiha daxwaza wê ew e ku îstîqametên Yekîtîya Ewropî jî biwezinîne û wê ber bi jinûveavabûnê ve dehf bide. Berdevkê *Tevgera Siyasî ya Perwerdeya Gelêrî* **Jacques Nikonoff,** (MPEP) ji serkeftina stratejîyeke wisa gumanê dike. Ew dibêje, *«Çepê ji pozîsyoneke ku di nav de ji ber wesweseyên xwe xitimiye û maye, pir êş kişand»*. Banga *«tevgereke civakî ya ewropî»* li gor wî, divê qelsîya hêzên çep li seranserî parzemînê li gelek welatan nede ji bîr kirin. Ne ku têkoşînên seranserî Ewropayê ne pêwist in. **Nikonoff** vê yekê wiha îzah dike *«wextîbûn, ango têkilîya navbera dema pêwist ji bo pêkanîna reformê û qada ku li ser, mirov dikare wê reformê pêk bîne: Qad çiqasî mezin be, dem jî ew çend dirêj e»*.

Halbû ku, xwe-xistina bin barê guherîna pêwist *(jinûve biserûberkirina pergala ewropî an jî jinûve destnîşankirina statuyên* ***Bankaya Navendî ya Ewropî)*** ber bi paşerojeke şîlo ve, wê «karaktereke sist û paşvekêş» derîne holê. Serokê berê yê *Attacê* wiha didomîne: *«Dema siyasetê dema neteweyî ye: li ciyê ku hê jî dezgehên ku destûrê didin hilbijartina rêvebiran li ser zemînên siyasî yên desteke ji dengdaran werdigrin, û derfetên guherîna tiştan hene»*. Wekî din, bicihkirina siyasetên aborî yên hevpar di navbera welatan de û *bêhtir jî* parvekirina yek diravî pêdivî bi lihevkirineke li ser plana îdeolojîk heye. **Nikonoff** ji ber vê yekê rûdana hilweşînekê dipê û ew vê hilweşînê weke berhema hukûmeteke pêşverû ya ku *«tedbîrên yekalî»* werdigire ji bo ji nû ve pêkanîna kontrola siyaseta xwe ya aborî û sazkirina hevkarîyên li gel welatên *«ku heman projeyê parve dikin»* dinirxîne. Ev perspektîf di heman demê de ji alîyê ronakbîrên weke aborîzan **Jacques Sapir** ve tê destek kirin.

Khalfa ji bona, ku qadeke wisa, *«rêyeke qralî»* tine, bi van gotinan nêrîna xwe ya dijber tîne ziman: *«Têkoşîna hem di asta neteweyî hem jî ewropî de, ne nakokîyek e».* Meşandina têkoşînan li seranserî Ewropayê dikare bihêle ku çep nêrînan biguherîne, û rêveberan neçar bike û *«pêşketinên bi rastî bi dest bixin».*

Çarçoveya heyî bi her halî ne di xêra çepê de ye, lê belê rewş ne rewşeke hişk û neguher e. **Chevenement** hêvî dike ku «dogmayên ewropîparêz bi kûrahî ji ber krîzê derb xwaribin». Ne bi tenê peymana îstîqrarîyê ji hev pelişî û parçe parçe bû, lê belê *Bankaya Navendî ya Ewropî* çarçoveya desttêwerdana xwe guherand –bi ser de jî gotineke Komîserê Reqabetê nema ku li himberî alîkarîyên ku dewletan da bankayan, bibêje. Wezîrê berê israr dike ku *«divê êdî em vê berhemê deynin ser dezgeha kar. Dezgeh hene, lê belê em dikarin wan biguherînin; her çi peyman in, mirov dikare wan şirove bike. Ti tişt bi temamî ne ji bo hetahetayê hatiye pêk anîn».*

Védrine jî wisa difirkire ku jinûve guftugokirina teksta der barê hin hukman de mumkun e. *«Tiştê ku di peymanan de em lê dieliqin û pê diêşin, şirove ne, lê belê ti tişt nikare rê li ber ji nû ve şirovekirina wan bigire. Bo nimûne, nehatiye gotin ku di Peymana Romayê de divê reqabet pêşî li bigewdebûna şampîyonên pîşesaz ên ewropî bigire»*. Huqûq dikare biguhere, siyaseta komîseran jî herwisa. Li gel vê yekê, ji bo *«ji cih livandina statuyên pêkhatî»* ev rewş *«xebateke pir mezin»* ferz dike. **Védrine** bi vî awayî berevajîyê dogmaya bazara serbest, mijara *«bazara adil»* a ji alîyê sosyalîstan ve tê parastin, bi bîr dixe. Şerûpevçûn berî hertiştî wê ya ramanan bûya.

Li gel vê çendê jî ji bo ku tevî her cure pêlên dijber ên muhefezekaran reforman hembêz bikin, îhtîmala îqnakirina hevkarên ***Fransa***yê dimîne li ser guherîna piranî ya siyaseta li Ewropayê. Sersekreterê Partîya Sosyalîst û serokê kabîneya wê demê **François Hollande** bi bîr dixe ku *«divê herwiha neyê fikirîn ku tiştekî wisa wê rojekê rû nede. Di dawîya salên 1990ê de ev yek qewimî»*. Di wê heyamê de, hema hema temamîya hukûmetên Yekîtîyê bi rastî jî ji alîyê sosyal-demokratan ve dihatin bi rê ve birin. Baş e, çima hingê ew firset ji dest hat berdan? **Le Foll** wiha bersivê dide wê pirsê: *«Ji ber ku tê de ti tiştê têkildarî ramanê tinebû. Em ne di nav tevnekê de bûn»*. Ne hukûmet, ne jî sosyal-demokrat weke hev difikirîn: *«Em li navbera rêya sêyem a* ***Tony Blair*** *destek didayê û sosyalîzma kevneşoptir a* ***Lionel Jospin*** *destek didayê, di nav xirecir û pevçûneke îdeolojîk de bûn»*. Ev têgihîştina «kevneşoptir» a sosyalîzmê tevî vê yekê nehişt ku hukûmeta Jospin bi biryardarî piştgirîyê bide guherandina rêzikên bazarên enerjîyê, postegerîyê an jî veguheztinên bi rêyên hesinî. Gelo endîşeya wî ew bû ku ew ê hevkarên xwe yên ewropî biêşîne?

Qutbûna ji nîzama Brukselê?

Bibîrxistina vê ezmûnê bivênevê di sere mirov de pirseke bingehîn bigewde dike: Di çarçoveya ewropî ya îro de, hukûmeteke pêşverû wê xwedîya derfeta kîjan rê û şiverêyên manevraya bi rastî be? Ev pirs Xatûn **Guigou**yê bêhtir dixe nava gumanê. Û ew vê yekê wiha îzah dike: *«Em ancax bi hevkarên xwe yên ewropî re dikarin rêyên nû yên manevrayê peyde bikin. Bi tena serê xwe em nikarin ti tiştî bikin, an na em ê vegerin awirê kesên ku li destpêka salên 1980yê weke arnawût dihatin bi nav kirin* (6) *û dixwestin teybên japonî li Poitiersê rawestînin».*

Védrine pirsgirêkê ji nû ve wiha formule dike: *«Baş e wê rêya manevrayê ya hukûmeteke sosyal-demokrat a ne di nav Yekîtîya Ewropî de, kîjan be? Binêrin hukûmeteke sosyal-demokrat li Norwejê ye, gelo qada mavevrayê ya vî welatê ku aborî bi hev ve girêdane, rola bazarên malî ye?»* Ew wiha lê zêde dike: *«Heta ku em cinî dîsa venegerînin nav şûşeyê, eger rojekê ev ji me were, heta ku em geşedana fuzûlî ya derdora malî sererast nekin, hemû hukûmet wê di rewşa xwe ya girêdayî de bimînin, Ewropa an jî ne Ewropa».*

Ji bo «çepê çepê», derfeta birêvebirina siyasî li derveyî şiverêya lîberal îro pir stewr û bêber xuya dike. *«Gelo li welatekî, mirov dikare giranîyê bide siyaseteke bi rastî jî di çarçoveya peymana Lîzbonê de alternatîf?»* Mélenchon di cih de dikeve navberê û dibêje *«Bersiva vê pirsê bêguman* ***'na'*** *ye.»* Li bin zexta bazarên malî, hukûmeta ku kontroleke wê ya pir qels li ser siyaseta wê ya aborîyê heye, li dijî prensîbên neolîberal ên ku li gor kêfa xwe Yekîtîyê bi rê ve dibin, wê gelek caran biketa nav gengeşe û pevçûnê. **Grond** bi heyecan vê şiroveyê dike û dibêje: *«Ev e pevçûna li gel Yekîtîya Ewropî [ya ku] xeteke parvekirinê datîne navbera çepekî ku xwe adapteyî kapîtalîzmê kiriye û çepê alîgirîya berxwedanê dike».*

Gelo divê benên bi nîzama ewropî re bên qut kirin? Ji bo destpêkirinê, gelo divê rêzikên ewropî bên binpêkirin! Li gor **Hyriac** *«Di vê rewşê de, hukûmeteke wisa divê pêşekîyên xwe binavûnîşan bikirana, xwe li wan ragirta, û ji hevkarên xwe re pêşniyar bikira ku pêwist e peyman an jî dîrektîfên ku li pêşîya siyaseta wê dibin asteng, jinûve bên nirxandin û guftugo kirin. Divê di nav dezgehan de heta dawîyê têkoşîn were meşandin, lê belê derîyekî hawarê xuya nake heta ku bi berdewamî bang li gel neyê kirin û jê neyê xwestin ku ew biryarê bide».*

Tevî vê yekê jî, welatek bi tenê jî derketina ji nav Yekîtîya Ewropayê ji xwe re nake armanc. **Mélenchon** dest nîşan dike ku «ya tê peyivîn derketina ji nav ***Peymana Lîzbonê*** ye *–ne ji nav Yekîtîya Ewropayê».* Baş e, vegera ji ewroyê jî mewzûbehs e? Li gor **Nîkonoff**, *«Jinûvesazkirina serwerîya diravî ya dewletê şertek e ji bo ku hukûmetek dîsa hevsarê siyaseta xwe ya aborî bixe destê xwe».* Li ser vê opsîyonê lihevkirinek çênebûye, lê belê hêdî hêdî dibe mijara guftûgo û nirxandinê.

Lê dîsa jî ji piranîya van texmînan rewşeke zelal derdikeve holê: Ji bo rêzgirtina ji bernameyeke dij-lîberal re, divê hukûmeteke çepgir di çarçoveya ewropî de bikeve nav hewldanan û xwe tev bide. Tevî rîska ku tiştekî wisa bibe sedemê buhraneke siyasî jî? **Le Hyriac** bersiva *«Erê»* dide vê pirsê û wiha rave dike: *«Ji bo dawîlêanîna li xetimîna rewşê, pêdivîya me bi krîzeke bi vî rengî heye».* Tiştê ji vir û şûn ve divê were kirin, êdî xwe amadekirin e.

* Li gel François Denord, nivîskarê *Ewropaya civakî wê pêk neyê,* Raisons d'agir, Paris, 2009.

(1) Serge Halimi, «Quand la gauche renonçait au nom de l'Europe [*Gava çep dev ji navê Ewropayê berdida*]», *Le Monde diplomatique*, hezîran 2005.

(2) Frédéric Lordon, «Extension du domaine de la régression [*Berfirehkirina qada paşveçûnê*]», *Le Monde diplomatique*, nîsan 2011.

(3) Parti socialiste, «Pour une nouvelle donne internationale et européenne [*Ji bo kartekî nû yê navneteweyî û ewropî*]», teksta Peymana Neteweyî a di 9ê cotmeha 2010ê de hat qebûl kirin.

(4) *Ji bo hilbijartinên ewropî yên 2009ê, li Fransayê beşdarî gihîşt ji sedî 40.63yê. Binêrin li nivîsa Anne-Cécile Robert,* « Et la crise sociale a rattrapé le Parlement européen [*Û buhrana civakî xwe gihand Parlemana Ewropî*]», *Le Monde diplomatique*, adar 2009.

(5) Pierre Bourdieu, «Pour un mouvement social européen [*Ji bo tevgereke civakî ya ewropî*]», *Le Monde diplomatique*, hezîran 1999.

(6) Ango baskê çepê yê PSê, ku hingê ji alîyê Chevènement ve dihat temsîl kirin, û xwe tenê dispart referansa siyasî ya Enver Xoce li Albanyayê, di navbera 1944 û 1985ê de.

Xewna federalîstekî

19ê mijdara bihurî, bi gotareke xwe ya li ***European Banking Congress*** a li Frankfûrtê, **Dominique Strauss-Kahn** daxwaza xwe ya «nûkirina *peymana bi avakarên»* Yekîtîyê re careke din anî ziman. (1) Ji bo jinûve dan dest pê kirina entegrasyonê, gerînendeyê giştî yê *Fona Diravî ya Navneteweyî* afirandina *«bazareke hevpar a kar»*, pêşniyar kir. Bi handana xebatkarên ewropî ji bo *«tevahîya potansîyela xwe derînin holê û bidin kar»* vê bazarê wê bêkarî ji holê rakira. **Strauss-Kahn** israr dike ku divê înîsîyatîfa van projeyan radestî *«navendê»*, ango radestî rêvebiran bibe, an na *«rewş wê ber bi başîyê ve neçe»*. Û dûre, saeta ku pirsgirêkên butçeyî hukûmetan mijûl dikin, **Strauss-Kahn** tiştê ku ew weke *«çareya herî cazîb»* dinirxîne aşkere kir: *«Afirandina otorîteya butçeyî ya navendîkirî li gel siyaseteke serbixwe ya ku dikare bi ya Bankaya Navendî ya Ewropî were muqeyese kirin. Vê otorîteyê wê ji bo her welatekî siyaseta xwe ya butçeyî dest nîşan bikira û çavkanîyên ji butçeyeke navendî wê li her welatî belav bikirana».* Bi gotinên din, ev tê wateya pêkanîna organeke nû ya bisporên ji hemû rewabûna demokratîk bêpar, ji bo biryardana li ser siyaseta butçeyî ya dewletan. Perspektîfeke ku ew bixwe jî pêkanîna wê di paşerojeke nêz de zêde mumkun nabîne. Gelo ew dixwaze ku çend mehên din mijarê guftûgo bike?

(1) Dominique Strauss-Kahn, «Europe's Growth Challenges [*Qayişkêşana mezin dibe ya Ewropayê*]», Frankfurt, 19 mijdar 2010.

A.S

Wergera ji fransî: Baran Nebar

ZOUBER YOUSEF: **Benâv**. Text û Metal, 40 x 100 x 15 cm

ÇAND Û HUNER



Ji Zinarê Xamo antolojîya çîrokên zarokan

SALIHÊ KEVIRBIRÎ

Nivîskar Zinarê Xamo, ji bo 'pêşerojên me', 'bingehên hebûna me' ango zarokên me berhemeke bêhempa amade kiriye ku sala 2008ê ronahî dîtiye: "Antolojiya Çîrokên Zarokan."

Berhema navbihurî li Swêdê, ji hêla Weşanxaneya Apecê/Apec Förlag AByê ve hatiye weşandin û belav kirin. Wisa xuya ye ku nivîskar kedeke baş daye berhemê û gelek serpêhatî û çîrokên ku kal û pîrên me di zarokatîya me de ji me re digotin berhev kirine.

Di "Antolojiya Çîrokên Zarokan" de, serpêhatîyên mîna; "Qertel û Kûsî", Beq û Paşa", Çûk û Fîl", "Dîk û Kûsî", "Du Bira", "Gur û Berx", Ga û Ker", "Kêz Xatûn", "Ba û Roj", "Mişk Xatûn" û "Qisirkeno" jî di nav de, 125 serpêhatî û çîrokên 'fablane' hene.

Di kitêba navbihurî de nivîskarê kitêbê Zinarê Xamo bi ser navê 'Gotina Dawî' bîr û boçûnên xwe, tevî merhaleyên amadekirina kitêbê ji me re rave dike û dibêje ku piştî derbeya leşkerî ya 12ê Îlonê, gelek kes neçar mane, revîyane, li Ewropayê qesidîne û hinek ji wan bi tesadûfî bûne nivîskar. Paşê jî gotinê tîne ser xwe:

"Bêguman heger ez derneketama Ewropayê, min ê ev berhema di destê we de û gelek xebatên din nekira. Ji ber ku şertên welêt, ew ê hin kar û xebatên din bida ser milên min. Lê li sirgunîyê, qederê ez bi tesadûfî kirim nivîskar. Helbet ev qedereke ne xerab e!"

Zinarê Xamo di heman nivîsê de dîyar dike ku xalê wî yê gorbihûşt Reşo bilûrvan û çîrokbêjekî baş bûye û ew gelek çîrok û serpêhatî jê fêr bûne û berdewam dike:

"Hinek nivîskar hene ku dibêjin, ez ji dapîr an bapîrê xwe fêrî filan tiştî bûme. Yê min eksê wê ye. Ez ne ji dapîra xwe, ne jî ji bapîra xwe fêrî tu çîrok û xemîşokan nebûme. Dapîra min li gund bû û min kêm caran hev didît. Yeka fedîyok bû. Ez ne bawer im ku çîrok û tiştên wiha zanibûn. Di vî warî de tu bîranînên min pê re tunene. Rehmetîya diya bavê min Sita Xamo li Wêranşarê, li cem apê min ê biçûk dima. Lê wê jî tu çîrok nizanibûn. Lê ji dayîka xwe fêrî gelek tiştî bûme."

Antolojiya Çîrokên Zarokan, Zinarê Xamo, Weşanxaneya Apec, 354 rûpel, Stockholm



Pînokyo êdî bi 'kurdî' diaxive!

Yek ji şaheserên edebiyata zarokan a dinyayê Pînokyo cara yekem e ku bo kurdî tê wergerandin û çap kirin.

Pînokyo cara yekem di sala 1881ê de ji hêla Carlo Collodî ve hatiye nivîsandin. Piştî vê nivîsandinê bi 131 salan wekî kitêbeke kurmancî kete destê zarokên kurd. Berhema behsa pêlîstokekî ku dibe zarok dike, ji hêla Evrensel Basim Yayinê ve hate weşandin.

Bêhtirî 100 sal in ku Pînokyo ji bo gelek zimanan hatiye wergerandin. Heman berhem gelek caran bûye fîlm jî.

Wergêra kitêbê Turkan Tosun e. Onur Çanka jî xwedîyê xêzên kitêbê ye. Îsmaîl Dîndar redaksiyona kitêbê kiriye. Herçî Bahar Eroglu ye dîzaynerîya bergê hildaye ser milên xwe.

Wergêr Turkan Tosun di pêşeka kitêbê de daye zanîn ku Pînokyo wergera wê ya yekem e û heke xwendevan jê hez bikin, ew ê hewla wergerên din jî bike û di dawîya heman pêşekê de wiha dibêje: "Di jîyanê de tiştên gelek nebaş hene. Yek ji wan jî derew e ne wisa? Va ye ez Pînokyoyê Derewkar û serpêhatîyên wî yên ecêb pêşkêşî we dikim. Ew çawa derewan dike û paşê çawa poşman dibe? Jîyana wî çawa diguhere? Heke hûn jî meraq dikin va ye pirtûk di destê we de ye. Hêvîdar im ku ev pirtûk bibe hevaleke we ya baş."

Di kitêbê de 36 serpêhatîyên Pînokyo hene ku her yek ji yê din balkêştir in û ne tenê zarokan, mezinan jî didin fikirandin.

Afirîner û nivîskarê serpêhatîyên Pînokyo Carlo Collodî Lorenzînî ye. 24ê çirîya paşîn li Floransayê hatiye dinyayê û 26ê çirîya pêşîn dîsa li Floransayê xatirê xwe ji me xwestiye. Carlo Collodi di ciwanîya xwe de perwerdehîya olî dibîne. Sala 1848ê, rojnameyeke qerfî û siyasî ya bi navê "Il Lampione" ango Lempeya Kûçeyan derdixe. Paşê rojnameyeke bi navê "La Scaramuccia" derdixe û ev rojname demeke dirêj jîyana xwe berdewam dike. Sala 1875ê ji bo weşanxaneyeke Floransayê, çîrokên nivîskarê fransî Charles Perrault wergerand zimanê îtalî û bi vî awayî gav avêt nav jîyana bi sêhr a zarokan. Sala 1876ê kitêba xwe ya yekem "Giannettino", 2 sal paşê jî "Minuzzolo" çap kir. Serpêhatîyên Pînokyo li seranserê dinyayê ew kir nivîskarekî bi nav û deng.

Wergera kitêba Pînokyo ji bo zimanê kurdî gaveke girîng e û hewcedarî bi handan û xebatên bi vî rengî hene. Her çiqas ji alîyê rastnivîsînê ve şaşî hebin jî, zarok dikarin çêjeke baş jê wergirin.

Pînokyo, Carlo Collodî, Evrensel Basim Yayin, 176 Rûpel, Kurdî, Stenbol

NAVEROK
TEBAX 2012

Li Sûrîyê Kurdistan
ISMAIL BESIKÇÎ
▶ R. 1

Kurd û "Raperîna Sûrîyê"
DR. KEMAL SIDO
▶ R. 1

Qanûna sextekaran
SERGE HALIMI
▶ R. 2

Stranên afrîkîyên serbixwe
JACQUES DENIS
▶ R. 2

Li hemberî krîza Sûrîyê, çepgirên ereb ên parçebûyî
NICOLAS DOT-POUILLARD
▶ R. 6

Mîta «çîna global»
MICHAEL HARTMANN
▶ R. 7

"The Economist", rojnameya herî bi bandor a dinyayê
ALEXANDER ZEVIN
▶ R. 8

Dema ku «hevalê me» Sedam Husên kurdên xwe kîmyabaran dikir!
KENDAL NEZAN
▶ R. 10

Kurd, gelê bêparhiştî
ERIC ROULEAU
▶ R. 11

Hindistan - Bangladeş, sînorê bêkêrkirî
ELIZABETH RUSH
▶ R. 12

Vegera li ezmûna komunîst a li Afganistanê
CHRISTIAN PARENTI
▶ R. 14

Las Vegas, axirîn qonaxa Amerîkayê
ALLAN POPELARD Û PAUL VANNIER
▶ R. 16

Çepê fransî li Ewropayê dialiqe
ANTOINE SCHWARTZ
▶ R. 18

ÇAND Û HUNER
▶ R. 20

LE MONDE diplomatique kurdî

Abonetîya dîjîtal a salane: 30 €
(Ji bo serlêdanê forma abonetîyê ya malperê bikarbînin)

Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)
Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB



ZOUBER YOUSEF: **Benâv III** Metal, 15 x 50 x 50 cm

www.arsivakurdi.org